

RASTIYA

VEŞARTİ:

WENDAKIRIN

ÖZGÜR SEVGİ GÖRAL

AYHAN IŞIK

ÖZLEM KAYA

NAVENDA BİRGEH DADMENDİ Ū HEQİQETÉ

HAFIZA  MERKEZİ

RASTIYA VEŞARTÎ:
WENDAKIRIN



NAVENDA BÎRGEH DADMENDÎ Û HEQÎQETÊ

Tûtûn Deposu

Lûleci Hendek Caddesi 12

Tophane 34425 İstanbul/Türkiye

+90 212 243 32 27

info@hakikatadalethafiza.org

www.hakikatadalethafiza.org

NIVÎSKAR

Özgür Sevgi Göral

Ayhan Işık

Özlem Kaya

Pişka VI. mîn "Encamên Lêkolîna Qadê" û qismê wê yê "Tecrûbeyên Xizmên Wendayan" û binnivîsa "Lêgerîn"ê ji aliyê Özlem Kaya ve û beşa "Wendayên Bêgor" ji aliyê Ayhan Işık ve hatiye nivîsandin. Ji bilî wan, nivîsên raportê hemû ji aliyê Özgür Sevgi Göral ve hatiye nivîsandin.

AMADEKARÊN WEŞANÊ

Meltem Aslan

Murat Çelikkan

Gamze Hızlı

WERGER

Zekik Gürür

RASTKIRIN

Berivan Hicret Turhan

DÎZAYN

Pınar Akkurt, BEK

ÇAPXANE

Weşanxaneya Mas

Hamidiye Mahallesi Soğuksu Caddesi 3

Kağıthane 34408 İstanbul

T +90 212 294 10 00

<http://www.masmat.com.tr/>

WEŞANÊN KOMELEYA BÎRGEH,

DADMENDÎ Û HEQÎQETÊ

ISBN: 978-605-85978-1-5

SPASÎ

Ev xebat bi piştgiriya xizmên wendayan, aktîvîstên mafê mirovan û alîkariya dadnasan hate nivîsin. Em spasîyên xwe bo hemû xizmên wendayan ên li Cizîr, Hezex, Silopiya, Stenbol û Amedê; Komeleya Piştevaniya Xizmên Wendayan (YAKAY-DER), Komeleya Piştevaniya Xizmên Wendayan a Mezopotamya (MEYA-DER); û kesên ku li Stenbol, Cizîr û Amedê alîkariya vê xebatê kirin ên wekî Welat Demir, Veysel Vesek, Rıdvan Dalmış, Nuşîrevan Elçi, Rüya Elçi, Yusuf Uygur, Ferhat Kabaiş, Ferhan Kaplan, Veysi Altay, Şahin Kalenderoğlu, Serokê BDP'ya Cizîrê û rêvebirên wê, Serokê BDP'ya navçeya Silopiyayê û rêvebirên wê; Seven Kaptan, Cihan Sarıyıldız, Abdülbasri Ekici, Ahmet Zıröğ, Naci Kültür, Zerrin Oğlağ, Sait Fındık, Tahir Elçi, Reyhan Yalçındağ, Eren Keskin, Meltem Ahıska, Hüsnü Öndül, Altan Tan, Meral Daniş Beştaş, Mesut Beştaş û Emma Sinclair Webb dikin.



Navenda Bîrgeh, Dadmendî û Heqîqetê, ji bo alîkariya wan a aborî û arîşî ya ku ev rapor weşandin, spasîyên xwe li Weqfa Açık Toplum, Anadolu Kültür, BEK, Weqfa Chrest, Global Dialogue, Komeleya Heinrich Böll Stiftung, Huridos, Çapxaneya MAS, Weqfa Mott, Weqfa Oak û li Bülent Ekmen û Yiğit Ekmekçi dike.

RASTIYA VEŐARTÎ: WENDAKIRIN

ÖZGÜR SEVGİ GÖRAL

AYHAN IŐIK

ÖZLEM KAYA

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ



“Baş tê zanîn ku pêkutî û zordestiya totalîter, her hewl dide ku, di qul û valahiyên nîsyanê de hemû pêşk û kirinên qenc û xerab bifetisîne. Lê, çawa ku peyana veşartina nîşaneyên jenosîdê ya Nazîperestan a piştî Hezîrana 1942’ê serkeftî nebû, hewldana wan a ‘bê nav û şan û bê deng û hes’ kirina muarizên/ hevrikên xwe jî beyxûde bû. Çi tiştê mirovan weha bêqisûr nîne û li vê dinyayê mirovên bîrereş jî gellek in. Lê li ser rûyê dinyayê mirov dê her hebin da ku behsa vê serboriyê bikin. Her ji ber wê, di dirêjahiyê dîrokê de çî tişt ‘bêmefa’ nemaye.

(...) Ev serborî tişteki asan hînî mirovan
dikin. Heger em bi nêrîneke siyasî
derberrînin, ev serborî nîşan dikin
ku, çendîn mirovên ku van karesat û
bobelatan ji bîr bikin hebin jî, yê her
yad bikin jî hene. Her weha, nimûneya
Çareserkirina Talî ya li welatên curbicur
nîşan dike ku îhtîmala van rûdawan li her
derê jî hene, lê ew li her derê neqewimîn.
Ev دنیا bi serê xwe bi têra mirovahiyê
dike û ji bilî wê çî pêwîst nîne.”

Hannah Arendt, *Kötülüğün Sıradanlığı*,
Adolf Eichmann Kudüs'te, r. 239

NAVEROK

- 6 PÊŞGOTIN**
- 8 I. WENDAKIRIN: TERÎF Û ÇARÇOVEYA NAVDEWLETÎ**
- 11 II. PAŞXANE/BACKGROUND**
- 19 III. WENDAKIRINÊN LI TIRKIYÊ PÊK HATINE: NÊRÎNEKE GIŞTÎ**
- 22 IV. MIJARA LÊKOLÎNÊ Û METODOLOJÎ**
- 25 V. DI DERBARÊ CIH DE ÇEND AGAHÎ**
- 30 VI. ENCAMÊN LÊKOLÎNA QADÊ**
- A. Repertûara Dewletê ya Wendakirinê**
- 1) Înkarkirin
 - 2) Gefxwarin
 - 3) Krîmînalîzekirin
 - 4) Pêkanîna Hevkariya Sazûmanî
- B. Tecrûbeyên Xizmên Wendayan**
- 1) Dewlet
 - 2) Lêgerîn-Özlem Kaya
 - 3) Dadmendî
 - 4) Têgeha Niştimanî/Hemwelatî
 - 5) Polîtîka
 - 6) Wendayên Bêgor-Ayhan Işık
- 68 VII) EPÎLOG: “EW NE WEKÎ HERKESÎ BÛ, MIROVEKÎ BÊQISÛR BÛ”**
- 71 VIII) ENCAM Û ÇEND PÊŞNIYAZ**
- 75 ÇAVKANÎ**
- 78 JÎNENÎGARÎ**
- 80 LÎSTEYA WENDAYÊN KU JI ALIYÊ NAVENDA BÎRGEH DADMENDÎ Û HEQÎQETÊ VE MÎSOGER BÛNE**
- 94 NEXŞEYA ŞERNEXÊ**

PÊŞGOTIN

Navenda Bîrgeh Dadmendî û Heqîqetê, ji bo aşkirakirina mafên mirovan ên di şer û rejîmên otorîter de piştguhûyî hatiye damezirandin û hewl dide ku bi perspektîfa derbasbûna qonaxa dadmendiyê, palpiştiya hesabpîrsîneke/lihevhatîneke edîl bike. Bi bîr û boçûna me, ji bo hesabpîrsîneke edîl a bo rûdawên rabirdûyê, divêt ew ziyarên mafê mirovan, li gor pîvan û standardên navdewletî bêne belgekirin, nimûneyên serboriya şerpezeyan bêne berhevkirin û cenahên civakî yên curbicur pê bên agahdarkirin û mafê wan bêne teslîmkirin. Hesabpîrsîna rûdawên rabirdûyê, bi zelalkirina mafên bînpêbûyî, bi avakirina mekanîzmayên selihandinê û bi dayîna tezmînatê û dawîya dawî jî bi darizandina sûcdarên wendakirinan ve pêkan e.

Bi vê nêrîn û boçûnê, me xwest ku bi arîşeyeke konkrêt a bînpêkirina mafê mirovî ya wekî wendakirinan dest bi xebatên xwe bikin. Me ji bo belgekirina wendakirinan, bi dadnasan, komên ragihandinê/komûnikasyon, xizmên wendayan, parêzer, nûnerên civaka sîvîl, aktîvîst, rêvebir û xebatkarên baroyan re hevdiitin pêk anî. Me xwest ku em têbigehên ka wendakirin bi çi fakteran pêk hatin û bi çi rê û mekanîzmayên dewletê hatin tetbîq kirin. Ji bo me tiştê ku ji wendakirinan girîngtir jî, tecrûbe û serboriyên xizmên wendayan bû. Em hewl didin ku di vê raporta xwe de cih bidin serboriyên tûşî xizmên wendayan bûne.

Lewre, ji bo duristkirina dadmendiyê û hesabpîrsîna rûdawên rabirdûyê, divêt hefizeya civakî bi van bînpêkirinên mafên mirovan ên sistematîk *jînûve* bête avakirin. Her ji ber wê, belgekirin û çêkirina arşîvan, wekî din, serborî û keserên xizmên wendayan ên bi salan e di dilê wan de her zêde bûne, belavî nav cenahên curbicur dike.

Em di vê raportê de hewl didin ku têbigehên ka ev stratejiya wendakirinê bi çi krîter û mekanîzmayên dewletê yên hiqûqî, siyasî û civakî pêkan bûne. Ji bilî wê, em dixwazin hîn bibin ka heta niha bêdengmayîna civakê ya di derbarê wendakirinan de, bi çi rê û krîteran hatine avakirin. Dîsa em di vê raportê de hewl didin ku fêmkirin ka, berî û piştî wendakirinan, çi hatiye serê xizmên wendayan, ew di derbarê wendakirinan de çi hizr dikin û tecrûbeyên wan ji bo fêmkirina babetê çi qas girîng e. Tecrûbeyên xizmên wendayan a di derbarê wendakirinan de, ji bo feraseta dewlet, edalet û hemwelatîyê ya li Tirkiyeyê pirr girîng in. Em hêvî dikin ku ev raport dê bo zanîna van kerasetên salên 90'an her sêdwar be.

I.

WENDAKIRIN/BERZEKIRIN:

TERÎF Û ÇARÇOVEYA

NEVDEWLETÎ

Ev sûcê ku di lîteratûra navdewletî de bi termên wekî *enforced disappearance* an *enforced or involuntary disappearance* wendakirin/hat wendakirin hatiye terîf kirin, li Tirkiyeyê bi giştî wekî 'wenda/kayıp' an jî 'di binçavan de wenda/gözaltında kayıp' tê bikaranîn.* Helbet gellek sedemên vê terîfê hene: ew kesên ku li Tirkiyeyê hatine wendakirin, yekser ji malên xwe, ji kargehên xwe an jî ji cihên xelk lê dijî hatine wergirtin. Wezîfedarên dewletê yê fermî kê/î ragirî kiribin, wendakirina wan kesan, bi şahidiya xelkê bi awayekî aşkîra îfade kirine.¹ Her wesa, ew kesên ku cilûbergên fermî li xwe nekirine û wekî wezîfedarên dewletê yê fermî naxuyîn, an jî cilûbergên sîvil li xwe kirine, bi awayekî aşkîra bi bahaneya "ji bo wergirtina îfadeyên wan" ew birine qereqolê (Emniyet-Cendirmeyê) û ew kes ragirî kirine. Ev faktoreke girîng e bo belavbûna terma "di binçavan de wenda". Her ji ber van hincetan li Tirkiyeyê, geh ji aliyê xizmên wan mirovên hatine wenda kirin, geh jî ji aliyê rêxistinên mafên mirovan ve, demeke dûvedirêj termên wekî "wenda" û "di binçavan de wenda" hatine bikaranîn.²

Terma wendakirinê/hatin wendakirin jî, ji ber ku hem aksiyoneke bi cebrî/bi zorê terîf dike, hem wendakirinê bi tenê naspêre 'binçavkirineke/ragirtineke' fermî û hem jî aksiyona wendakirinê, ji wendakirinê din cihê dike, term û tercîheke ji yê din duristtir e. Terîfa terma 'wendakirinê' ji aliyê Peymana Navdewletî ya Miletên Yekbûyî ya Li Dijî Parastina Wendakirinan weha hatiye kirin: "(...) Ew kes an grûbên ku wezîfedarê dewletê ne, an ji aliyê dewletê ve hatine rayedar kirin, an

1 Alpkaya, G. "Kayıplar Sorunu ve Türkiye". 1995: 40-41. http://www.politics.ankara.edu.tr/dergi/pdf/50/3/8_gokcen_alpkaya.pdf

2 Êdî di van salên dawîn de, Komeleya Mafê Mirovan û Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê, ku li ser vê meseleyê kar dikin terma 'wendakirin/hatin wenda kirin' bi kar tînin.

* Di zimanê Kurdî û zarawayê Kurmancî de, terma "kayıp" û gözaltında kayıp" û "zorla kaybetmek" ji adaptasyona Tirkî hatine avakirin û nemaze jî wekî "wenda", "di binçavan de wenda" û "wendakirina bi zorê" tên emilandin. Lê di vê raportê de bo "binçavkirinê", "ragirtin-ragirî" jî hatiye bikaranîn. Ji bo *enforced disappearance* an *enforced or involuntary disappearance* an "zorla kaybetmek" a bi Tirkî ji ber ku ew transîtv e bi tenê *wendakirin* hatiye bikaranîn.

jî bi piştevanî û toleransên dewletê tevdigerin, wextê ku kesekî ragirî dikin, direvînin, an jî wî kesî ji azadiya wî mehrûm dihêlin, vê fiilê xwe red û înkâr dikin, cihê ew kesê ku hatiye ragirî kirin û aqûbeta wî/ê kesî vedişêrin û ji parastina hiqûqî derdixin û bi awayekî der-hiqûqî hereket dikin (...)³ Di vê terîfa peymana Miletên Yekbûyî de, wendakirin bi tenê ji aliyê wezîfedarên dewletê ve nayê kirin. Kesên ku bi destgirî û piştevanî û daxwaza dewletê tevdigerin jî, di nav wê terîfê de tên qebûlkirin. Ji ber ku wendakirin pirî caran ji aliyê hêzên wekî para-mîlîter, an ji aliyê hêzên kontr-gerîla ve tên kirin, loma ev terîfa berfireh jî gellek fonksiyonel e. Wekî din, xisûsiyeteke di derbarê vê terîfa wendakirina de jî ew e ku, faîlê vê rûdawê piştê sûcên xwe înkâr dikin û cihê wî/ê kesê ku hatiye wendakirin jî nabêjin/vedişêrin. Ew kes car û bar tiştên xelet/derew jî dibêjin û car caran jî çî tiştî nabêjin.

Stratejiya wendakirinê, bi qasî ku tê zanîn yekem car ji aliyê rejîma Nazî ve di sala 1941'ê de bi Biryarnameya Şev û Mij *Nacht und Nebel Erlass* hatiye pê. Li gor wê polîtîkayê; berhingarên/berxwedêrên ku li dewletên hatine dagirkirin dijîn, nemaze jî li Fransa û Belçîka û Hollandayê, nivê şevê hatin ragirtin û sirgûnî Elmanyayê bûn. Li wê derê dadgehên taybet ew kes darizandin û an hikmê mirina wan hat dayîn, û an jî ew hatin wergirtin. Her çend hejmara wan kesan nehatibe tespîtkirin jî, dîsa teqrîben 5.200 kes, bi vê biryarnameyê ve hatine wendakirin. Praktîkên sîstematîk a ku mirov nivê şevê direvand û piştê çî carî aqûbeta wan nedihat zanîn, li gor xisûsiyetên xwe, hêjayî navên xwe ne. "Li gor muemeleya wê sîstemê; darizandin û înfazkirina wan kesan bi dizîka dihat kirin û malbat û xizmên wan kesên ku hatibûn wendakirin, bi vê yekê nedihatîn agahdarkirin. Bi vê muemeleyê mebest ew bu ku, xizmên wan kesan û raya giştî bitirsînin ku pêşî li ber belavbûna berxwedanê werbigrin".⁴

3 Peymana Navdewletî ya Miletên Yekbûyî ya Li Dijî Parastina Wendakirinan. Dîroka meriyeta wê 23 Berfanbar 2010.

4 Dinçer, H. "Kayıpları Görünür Kılmak: Birleşmiş Milletler Zorla Kaybedilmeye Karşı Herkesin Korunmasına Dair Sözleşme" 2011:2 http://www.hakikatadalethafiza.org/Cust/UserFiles/Documents/Editor/H%C3%BCIyaDin%C3%A7er_Kay%C4%B1plar%C4%B1G%C3%B6r%C3%BCn%C3%BCr%C4%B1mak.pdf

Stratejiya wendakirinê, piştî salên 1960'an li Amerîkaya Başûr, ku dîroka wê bi derbe, şer û pevçûnên navxwe ve tije ye, li hemberî muxalîfên siyasî bi awayekî rêkûpêk wekî stratejiyeke bêkarîgerkirinê pêk hat. Li welatên Amerîkaya Başûr yê curbicur, piştî salên 1960'î karker, gundî, xwendekar û xebatkarên sendîkayê yê xwe wekî akterên siyasî durist kiribûn, ji aliyê rejîmê ve wekî 'dijminên navxwe' hatin tawanbar kirin û her ji ber wê yekê, bûn mexdûrê stratejiye wendakirinê. Li Brezîlya, Uruguay, Şîlî, Perû û li Guatemala û Arjantînê desthilatîyên mîlîtarîst, ên piştî derbeyê û sazîyên dewletê; grûbên muxalîf, li dor behsa 'dijminê navxwe' bi vê stratejiyê têk birin.⁵ Nemaze li Arjantînê, ew kesên ku hatin wendakirin, wekî *desaparecidos* hatin yadkirin û piştî derbeyê tûşî polîtîkayên qirkirinê yê giran bûn. Teqriben 30 hezar mirov bi dermanan hatin tevizandin û ji aliyê rayedarên rejîmê ve, ji balefiran hatin avêtin û di okyanûsê de hatin wendakirin. Li gor rapora Komîsyona Arjantînê ya Netewî ya li Dijî Wendakirinan (CONADEP) bi tenê navê 8.960 kesan hatin tespît kirin. Ji bilî wê, li welatên Amerîkaya Başûr ên wekî Salvador, Kolombiya, Ekvador û Hondûrasê jî ev stratejî hate pêkanîn.⁶

Praktîka wendakirinê, piştî salên 1980'an, cardin zêde bû û belavî gelek der û deverên dinyayê bû. Li gor rapora salane ya Grûba Xebata Miletên Yekbûyî ya Di Derbarê Wendakirinên Bê Îradî, li deverên ku şer û pevçûnên navxwe lê zêde ne; ev stratejiya sistematîk li hemberî hêzên muxalîf û cudaxwaz hate pêkanîn. "Li gor îstatîstîkên ku di navbera salên 1980 û 2010'an hatine kirin, gellek rûdawên wendakirinan, ên girseyî ku li dewletên wekî Srî Lanka, Fîlîpînan, Perû, Nepal, Iraq, Îran, Guetemala, El Salvador, Şîlî, Arjantîn û Cezayîrê pêk hatîne, îro jî hîn nehatine zelalkirin."⁷ Her weha diyar e ku, piştî rûdawên

5 Vermeulen, M.L. *Enforced Disappearance, Determining State Responsibility under the International Convention for the Protection of all Persons from Enforced Disappearance*. 2012:8.

6 Lijneya Giştî ya Miletên Yekbûyî (2011), *Report of the Working Group on Enforced or Involuntary Disappearances*. http://www2.ohchr.org/english/bodies/hrcouncil/docs/16session/A.HRC.16.48_en.pdf

7 Dinçer, H. 2011:4.

11'ê Îlonê li dinyayê, bi encama polîtîkaya 'şerê li dijî terorîzmê' gellek kes hatin wendakirin. "Li gor rapora Amnesty International û Human Rights Watch, aqûbeta 39 kesên ku ji aliyê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê ve hatine girtin, nayê zanîn. Di sala 2007'ê de, 6 rêxistinên mafên mirovan, bi raporeke hevkar navê girtiyên Misirî, Kenyayî, Lîbyayî, Fasî, Pakîstanî û Spanî, ku ji aliyê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê ve hatine girtin, aşkira kir.⁸

Terîfa terma wendakirinê û têgehiştina praktîkên ku li dinyayê rûda ne, ji bo zelalkirina nimûneyên wendakirinên li Tirkiyeyê qewimîne jî girîng in. Dema ku mirov li terîfa vê termê dinihêre, diyar e ku, wextê kesek bi rîza û daxwaza dewlet(ek)ê bête wendakirin, faîl û berpîrsê vê yekê dewlet bi xwe tê qebûlkirin. Piştî ku kesek hate wendakirin, veşartin û înkarkirina vê yekê jî, aşkira dike ku, mekanîzmayên dewletê jî di nav vî karî de ne. Stratejiya wendakirinê, wekî nimûneyên gellek binpêkirina mafê mirovan ên din, rêbazeke hevpar a dewleta ne. Gellek dewlet ev stratejî ji dewletên dîtir hîn bûn û di bin tesira praktîkên hevdu de man. Her wesa, çawa ku dewletên curbicur ev polîtîka li hemberî muxalîf û berhingarên pêk anîne, divêt têkoşîn û rizgariya li dijî vê stratejiyê jî, bi awayekî înternasyonal bête kirin û xwe bispêre tecrûbeyên berxwedana navnetewî. Tevkarî û hevkarîya xizmên mirovên ku hatine wendakirin, ên Arjantînî, yê bi navê *Las Madres de Plaza de Mayo* û xizmên mirovên hatine wendakirin ên li Tirkiyeyê *Dayikên Şemiyê/Cumartesi Anneleri*, ji bo vê behsê nimûneyeke sereke û girîng e. Lêbelê ji bo fêmkirina praktîkên wendakirinê yê li Tirkiyeyê rûda ne, bi tenê terîfa vê termê û nimûneyên dinyayê ne bes. Bi taybetî jî, salên 1990'an ku ev stratejiya wendakirinê bi awayekî sistematîk pêk hatiye û piştî derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê belav bûye, divêt zêdetir bête fêmkirin.

8 Dinçer, H. 2011:5.

II.

PAŞXANE/BACKGROUND

Ji bo ku em paşxaneyê stratejiya sistematîk a wendakirinê, ya ku li Tirkiyeyê qewimîne fêm bikin û di derbarê azîne û taktîkên dewletê agahdar bibin, divêt em li dîroka Tirkiyeyê ya nêzîk binihêrin. Lewre; me armanca xebatên xwe yên bi ser navê Navenda Bîrgehê, bi lêkolînên li ser derbeya 12'ê Îlonê, da destpêkirin. Li Tirkiyeyê wendakirin jî, bi tenê polîtîkayên ji derbeya 12'ê Îlonê destpê nekiriye. Heger mirov li jenosîda Ermeniyê binihêre, ev stratejî heta 24 Nîsana 1915'ê diçe ku wê demê 139 ronakbîrên Ermenî hatibûn wendakirin.⁹ Dîsa di dema cimhuriyetê ya pêşîn de, dewletê ev stratejiya xwe, nemaze jî li ser Sebahattin Alî tetbîq kir. Lêbelê ji ber ku, babeteke weha berfireh, di nav salekê de nayê pêkole kirin, me di beşa metodolojiyê de jî behs anî ser û xebatên xwe yên di derbarê wendakirinan de, bi kawdan û rûdawên piştî 12'ê Îlonê sînor kir. Bi taybetî jî, em hewl didin ku geşepêdanên li dor behsa wendakirinên di salên 90'an de li devera OHAL'ê (rewşa awarte) rûda ne fêm bikin û bidin zelalkirin.

Piştî derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê û salên 1990'an li devera OHAL'ê ku wendakirin, bi awayekî sistematîk hatibû tetbîq kirin, me mecburî têgehiştina momentên siyasî û dîrokî ya salên 1990'an ên li Tirkiyeyê dike. Dema ku em berateya derbeya 12'ê Îlonê bi hejmar û rûdawên di bîra me de mane yad bikin: Meclîs hate dadan û asê kirin, makezagon hate betalkirin. Partiyên siyasî hatin girtin û mal û milkên wan desteser bûn. 650 hezar mirov ragirî bûn û milyonek 683 hezar kes hatin tawanbar kirin û 230 hezar mirov hatin darizandin. Ji bo 7 hezar kesan, cezayê mirinê (dardakirin-îdam) hat xwestin, 517 kes cezayê mirinê xwar û jê 50 kes hate dardakirin, 14 hezar mirov ji hemwelatîyê hatin derxistin û mirina 171 kesî ya bi îşkenceyê jî hate belgekirin.

⁹ Jenosîda Ermeniyê û encama wê ya siyasî, civakî, aborî û rewîştî evro jî hîn ji bo xebatên hefizayê û hesabpîrsînê/ lihevhatina bi rûdawên rabirdûyê re astengiyên derdixe. Di derbarê vê babetê de, evro lîteratureke navdewletî ya girîng û qewî jî heye. Ji bo geşeyê berfireh ya ku bi Tirkî hatiye nivîsîn, bnr. Fuat Dündar, *Modern Türkiye'nin Şifresi*, Weşanên İletişim, İstanbul, 2010; Taner Akçam, *Kanunların Ruhunu*, Weşanên İletişim, İstanbul 2010 û Raymond H. Kevorkian, Paul B. Papoudjian, 1915 *Öncesinde Osmanlı İmparatorluğu'nda Ermeniler*, Weşanên Aras, İstanbul 2012.

Di girtîgehan de 299 kesan wefat kir, bizavên 23 hezar 677 komeleyan hate rawestandî û astengkirin.¹⁰ Derbeyê, arîşeyên ji hejmaran zêdetir û wêdetir pêkanî. Piştî derbeyê mîlîtarîzm û wesayeta leşkerî, xwe bi makezagonê qewî û mazbût kir, mixalefeta demokratîk jî asteng kir. Pergaleke siyasî ya ku civakê dixê bin kontrol û ferweriya dewletê hate duristkirin û polîtîkayên ku xwe dispêrin Nîjadperestîya Tirk û feraseteke li ser esasên monîzm û navendperestiyê/ centralization hate avakirin. Distûreke li dor werara "Ji bilî Tirkan, çi dostê Tirkan nîne" hikm kir û atmosfereke siyasî ya her ku diçe fikr û ramanan bêhtir lokalîze dike, li ser mirovan hate ferz kirin.¹¹

Arîşeya Kurd, wekî kêşeyê etno-polîtîk piştî salên 1980'ê destpê kir û di 30 salên Tirkiyeyê yên dawîn de zêdetir bû. Di 15'ê Tebaxa 1984'ê de, PKK'yê (Partiya Karkerên Kurdistan) êrişî ser Dih (Eruh) û Şemzînanê kir û têkoşîna xwe ya leşkerî da destpêkirin. Di vê serdema pêşîn de, dewlet û saziyên dewletê pûte û girîngî nedan bizavên PKK'yê û Arîşeya Kurd a civakî û siyasî zêde diyar nebû. Li Tirkiyeyê gotina dewletî ya fermî, li ser bêqîmet û biçûkkirina şerê bi PKK'yê re hatiye duristkirin weha bû: PKK bi feraseta wê demê, wekî tevgerê ji sê û çar talanker/çapulcu û 'sê û niv' eşqiyayan pêkhatî tê qebûl kirin û jî aliyê rayedarên dewletê ve, bi qelandina koka gerîlayan ve dihat tehdît kirin. Li gor Hasan Cemal, fermanîyê wê demê gilî û gazinek xwe yên di derbarê 'sê û niv' eşqiyayan de bi xwe jê re derbirriye.¹²

Di dawîya salên 1980'yî û serê salên 1990'an de, meseleya PKK'yê êdî wekî meseleyê 'sê û çar talankeran' nehatiye dîtin û feraset guheriye. Fikr û angaştên PKK'yê ji aliyê gellek ronakbîrên Kurd ve di sehayê legal/yasayî de hatiye geşeyêkirin û parastin. Di sala 1990'î de Partiya Kedê ya Gel (HEP-Halkın Emek Partisi) bi serokatiya Fehmî

¹⁰ 'Bi hejmaran Derbeya 12'ê Îlonê' *Ntvmsnbc*, 04 Avrêl 2012 <http://www.ntvmsnbc.com/id/24999286/>

¹¹ Belge, M. *Türkiye Dünyanın Neresinde?*, 1997:113.

¹² Cemal, H. *Kürtler*, 2003: 77

Işıklar ve bi 10 parlamenteran ji Partiya Sosyal Demokrat a Gel (SHP-Sosyal Demokrat Halkçı Parti) veqetî û perwerdeya bi Kurdî, weşangeriya bi Kurdî û gengeşekirina arîşeya Kurd a di sehayê siyasî de daxwaz kir. Palpiştîya ku gel daye PKK'yê, geşepêdan û kawdanên di derbarê têgehiştina hereketê guhert. Her weha şerê çekdarî gehiştê merheleyeke gur û geş û ji derî hesabana belav bû. Ev yek geh ji aliyê hikûmetan, geh ji aliyê artêşa Tirk û geh jî ji aliyê unsûrên saloxgêriyê/îstixbarat ve bû egera peydakirina stratejiyên dîtir ên şer, û feraseta 'sê-çar talanker' guherî.

Di vir de du xalên girîng ên guherîna babetê hene: Ya yekem sepandinên rewşa awarte ye, ya dîtir jî li dor feraseta 'dijmin', werçerxîna leşkerî, siyasî û îdarî ye. Rewşa awarte (OHAL) xwe disparte xalên makezagona 1982 ên 119-121 û di dema 01.03.1984'ê de bi biryara Lijneya Wezaretê ya hejmara 84/7781 û ji bo 8 bajarana hate îlankirin. Di salên 90'î de, ew deverên ku dê wekî deverên rewşa awarte bihêne zanîn, wê demê di bin hikmê îdareya awarte (sıkıyönetim) de bûn. Di 19'ê Tîrmeha 1987'ê de, li bajarên wekî Amed, Hekarî, Sêrt û Wanê, îdareya awarte ji hikmê ket û dewsa wê Parêzgeha Devera Rewşa Awarte (Olağanüstü Hal Bölge Valiliği) hate duristkirin. Ew qanûn di serî de li van 8 bajarana hate pêkanîn: Çewlîg, Amed, Xerpêt, Hekarî, Mêrdîn, Sêrt, Dêrsim û Wan. Piştê jî Semsûr, Bedlîs û Mûş lê zêde bûn. Di sala 1990'î de, piştî ku Şernex û Batman wekî bajar/wilayet hat qebûlkirin, hejmara bajarana bû 13. Bedlîs, di sala 1994'ê de li dewsa bajarê cîran (mücavir il) li deverên rewşa awarte hat zêdekirin û hejmara bajarana bû 14. Rewşa awarte û îdareya awarte, 23 salan bû usûla îdarekirina hinde bajarana û ji 4 mehan carekê û bi tevahî 46 caran hate dirêjkirin.¹³ Di çarçoveya qanûnî de, Parêzgehên Devera Rewşa Awarte, xwedî îmtiyazên zêde bûn. Di nav rayedariya wan de, valakirina gundan, qedexekirina çûyîn û hatina gund û bajarana, taloq û astengkirina perwerdeyê, sînorkirina stendina giha û xwarina ajalana, desteserkirin û sîdwergirtina ji amûrên ragihandinê yê li deverê. Her weha, bi rêka

¹³ "23 yıl sonra resmen 'olağan hal", *Hürriyet*, 30 Kasım 2002. <http://hurarsiv.hurriyet.com.tr/goster/ShowNew.aspx?id=112742>

biryarnameya di hikmê yasayî ya Parêzgeha Devera Rewşa Awarte de, statu û praktîkên vê saziyê bi temamî der-hiqûqî bûn. Parêzgarê Devera Rewşa Awarte, bi dorê ev bûn: Hayri Kozakçıoğlu (1987-1991), Mehmet Necatî Çetinkaya (1991-1992), Ünal Erkan (1992-1996), Necatî Bilican (1996-1998), Aydın Arslan (1998-1999) û Gökhan Aydın (1999-2002) Sepandina Parêzgeha Devera Rewşa Awarte, herî dawî li Amed û Şernexê, heta demên 30.11.2002'ê hate dirêjkirin û piştê bi dawî bûn.¹⁴

Sepandina duyemîn a din ew e ku feraseteke 'dijmin' a nû hate avakirin, û li gor wê, guherîna leşkerî, siyasî û îdarî pêk hat. Di demên 90'an de, artêşa Tirk têgehişt ku bi rê û azîneyên şer, ên konvansiyonel nikare gerîlayên PKK têk bibe û di şer de biserkeve. Her ji ber vê, di nav rayedarên dewletê de meyla fikrên wekî li gor rêbazên 'şerê xeyrî nîzamî' û stratejiyên şerkirinê yê din hatin peydakirin. Her weha, di sala 1993'ê de, li dewsa Femandariya Artêşa Yekemîn a ku navenda wê li Stenbolê ye, li Meletiyê Femandariya Artêşa Duyemîn hate hêzdarkirin. Artêşa Tirk (TSK) wekî ku digot, li gor konseptê 'şerê sivik/şerê ne gur û geş' (düşük yoğunluklu savaş), jinûve hate sazîkirin û navê Daîreya Şerê Taybet di sala 1993'ê de bû Femandariya Hêzên Taybet. Dîsa li gor vê stratejiya şer, ji bo lezkirin û qewîkirina şerê bi gerîlayan re û ji bo serkeftina bizavên leşkerî, saziyên wekî tûmen hatin guhertin û dewsa wan parleşker-lîva-gurdan hatin avakirin.¹⁵

Taybetmendiyê ve guherîna stratejiya dewletê ya din jî, di sala 1985'ê de avakirina saziya cerdevanan/notirvan/qoriciyan e. Bi vê stratejiyê ve, erk û wezîfeyên cerdevanan hatin berfirehkirin û di salên 90'an de hejmara cerdevanan her ku çû zêdetir bû. Pergala cerdevantiyê, di 26'ê Adara 1985'ê de bi yasaya

¹⁴ Tanrikulu, S, Yavuz, "İnsan Hakları Açısından Olağanüstü Hal'in Bilançosu", 2005: 493-521. Ji bo gengeşeyê berfirehtir a di derbarê vê babetê de bnr. Kemal Gözler, *Kanun Hükmünde Kararnamelerin Hukuki Rejimi Weşanxaneyê Ekin*, Bursa 2000; Mehmet Semih Gemalmaz, *Olağanüstü Rejim Standartları* Weşanên Beta, İstanbul, 1994.

¹⁵ Balta Paker, E. "Dış Tehditten İç Tehdide: Türkiye'de Doksanlarda Ulusal Güvenliğin Yeniden İnşası", 2010: 413-414.

Gund a hejmara 442 û xala 74. û bi hejmara 3175 ve guherîn pêk hat. Ji bilî cerdevanên berdem ku ji dewletê meaş werdigirtin, li deverên Kurdan, li gor zagona Gund, cerdevanên dildar* jî çek wergirtin û karîger bûn. Cerdevanên dildar jî wekî cerdevanên berdem**, ji aliyê dewletê ve hatin çekdarkirin û li hemberî PKK'yê wezîfedar bûn. Lêbelê, ji bilî cerdevanên berdem, ku bi biryara Lijneya Wezîran ve hatibûn wezîfedarkirin; cerdevanên dildar, bi biryara amirên milkî ve dihatin wergirtin û ji kontrola dewletê ya navendî mîaf bûn. Şertên cerdevaniyê ev bûn: endîşedariya asayîşê, paqijbûna sicîlê û serlêdana qeymeqamtiyê. Her weha qeymeqam, bi destûra cendirmeyan, kesek wekî cerdevanê dildar wezîfedar dikirin.¹⁶ Di salên 90'an de hejmara cerdevanan, bi awayekî sistematîk zêdetir bû û wezîfeyên wan berfirehtir bûn. Cerdevan bi şertên beşdarbûna operasyonên leşkerî yê dersînor û şopgeriyê hatin wergirtin û li deverên xwe, di operasyonan de bi cih girtin.¹⁷ Cerdevanên berdem li gor 20'ê Pûşbera 2003'ê bi vî awayî dabeşî bajaran bûn:

DABEŞBÛNA CERDEVANÊN DILDAR ÊN LI BAJARAN¹⁸

Amed	5.274
Şernex	6.835
Batman	2.943
Çewlîg	2.533
Bedlîs	3.796
Mêrdîn	3.360
Mûş	1.918
Sêrt	4.680
Wan	7.365
Hekarî	7.643
Dêrsim	386
Semsûr	1.510
Qerekose	1.881
Erdêxan	96
Xerpêt	2.115
Dîlok	565
Îdir	374
Mereş	2.267
Qers	578
Kîlîs	34
Meletî	1.392
Riha	966
Tevahî	58.511

Cerdevanên dildar li gor Berfenbara 2003'ê weha dabeşî bajaran bûye:

¹⁶ Balta Paker, E., Akça, İ. "Askertler, Köylüler ve Paramiliter Güçler: Türkiye'de Köy Koruculuğu Sistemi", 2013:13-14

¹⁷ Balta Paker, E., Akça, İ. 2013:16

¹⁸ Ev tablo ji gotara Dilek Kurban hatiye wergirtin, bnr, Kurban, D. "Bir 'Güvenlik' Politikası Olarak Koruculuk Sistemi", 2009:255.

* Di zimanê Tirkî de "gönüllü köy korucusu" tûşî çî termeke bi Kurmancî nedihat, lewre adaptasyona wê hate çekîrin.

** Geçici Köy Korucusu

DABEŞBÛNA CERDEVANÊN BERDEM ÊN LI BAJARAN¹⁹

Amed	1.141
Şernex	2.330
Batman	1.019
Çewlîg	69
Bedlîs	2.984
Mêrdîn	1.226
Mûş	2.375
Sêrt	460
Wan	189
Hekarî	5
Dêrsim	89
Xerpêt	392
Toplam	12.279

Dema ku mirov bi awayekî giştî li ser vê guherîna esasî difikire, diyar e ku, di piştî Şerê Sar (Cold War) de artêşa Tirk, ji parametreyê dijminê derve derket û bi dijminê navxwe re eleqeder bû. Dewlet û saziyên wê, êdî têgehiştin ku, ew hêzên ku pê re ditêkoşe, 'sê-çar talanker' nînin, tevgerê gerîlayan e û divê li dor vê behsê, li dijî wê stratejiyan peyda bike. Di vir de tiştê girîng ew e ku, ev dijminê nû yê navxwe, ku bi rê û azîneyên gerîlayî şer dike, her ku diçe, palpiştiyeke girseyî werdigre û tespîtkirina wan kesan, ji aliyê dem û dezgehên dewletê pirr zehmet bûye. Her weha, ji bo dewlet û saziyên wê, tespîtkirina Kurdên ku destek didan gerîlayan û yê piştevaniya dewletê dikirin, pirr girîng bû. Duristkirina pergala cerdevantiyê jî, teknîkên şer ên xeyrî nîzami jî, di rastiyê de di vî şerî de xwe disparte niyeta dewletê ya cudakirina 'welatiyên dilsoz' û yê din.²⁰

¹⁹ Ev tablo ji gotara Dilek Kurban hatiye wergirtin, bnr, Kurban, D. 2009:256.

²⁰ Balta Paker, E. 2010:422.

Di dema şerê bi gerîlayan re, bi tenê Artêşa Tirk na, gellek dem û dezgehên dewletê yê curbicur jî, li ser esasên şer hatin avakirin û xwe jinûve saz kirin û xwedî praktîkên cuda bûn. Di sala 1993'ê de, ji aliyê serokwezîra wê demê Tansu Çiller û serfermandarê Artêşa Tirk Doğan Güreş ve, konseptê stratejiya asayîşê ya taybet a bi navê 'Hakimiyeta Qadê û Derxistina PKK'yê ji Deverê' hate duristkirin. Di vê stratejiya asayîşê de, niyeta dewletê ew bû ku, alîkariya ku gel dida gerîlayan bibirre û di qadên şer de li hemberî gerîlayan jinûve biserkeve. Her wesa valakirina gundan û waran a ku bi zorê hatibû kirin, kuştinên kiryar nediyar û înfazên sîvil û zêdebûna wendakirinê, piştî stratejiya hakimiyeta qadê rûda.²¹ Bo nimûne, li gor agahiyên ku teqez em nizanin,²² Di sala 1993'ê de, hejmara kesên ku hatibûn wendakirin 103 bû, lêbelê; ev hejmar di sala 1994'ê de bûye 518 kes. Zêdebûna vê hejmarê, bi agahiyên koçreviyê (zorunlu göç) û înfazên²³ kêyfi û îlegal ve eleqeder e. Bi teybetî jî ev stratejî di dema serokkomariya Süleyman Demirel û serokwezîriya Tansu Çiller û serfermandariya Doğan Güreş û İsmail Hakkı Karadayı ya di navbera salên 93 û 95'ê de li dor konseptê 'Hakimiyeta Qadê û Derxistina PKK'yê ji Deverê' hatiye tetbîq kirin.

Wendakirin û binpêkirina mafê mirovî ya ku ji kuştina înfazên kêyfi û îlegal û îşkenceya sîstematîk pêk dihat, bi awayekî fermî ji aliyê dewletê ve nedihate kirin, lêbelê ev demeke dûvedirêj e, ji aliyê gelek kesan ve jî tê gotin, bi palpiştiya dewletê bi destê unsûrên paramîliter û kontr-gerîla ve hate kirin. Wekî herkes jî dizane, ev bizavên der hiqûqî, li gor stratejiya

²¹ Üstel, F. *Zorunlu İç Göç Sonrası Köye Dönüş*, 2004:4.

²² Me wekî Navenda Bîrgehê, ji weşanên mafê mirovan û lêkolêrên serbixwe sûd wergirt û di derbarê wendakirina bi zorê de, listeyek çêkir. Lêbelê, ji ber ku me navên ku di vê listeyê de ne hîn nepesandiye, dema em vê yekê wekî referans bikartînin, em dibêjin ku "hejmarên ku ne teqez in". Di derbarê vê babetê de ji bo zanîneke berfirehtir, bnr. *Li Tirkiyeyê Wendakirina Bi Zorê: Nêrîneke Giştî û Babeta Lêkolînê û Metodoloji*

²³ Terma înfazên kêyfi û îlegal, wekî wergera termên wekî *extrajudicial, summary and arbitrary executions* hatiye bikaranîn. Di raya giştî de jî ev peyv wekî înfazên der-hiqûqî tê bikaranîn û ji aliyê mafê mirovan ve jî ev term tê emel kirin.

'şerê ne gur û geş/şerê sivik' ji aliyê ew kesên ku bi rayedariyên berfireh hatine wezîfedar kirin, rûda ne. Ew kesên ku failê van rûdawan in, ji aliyê çî saziyên dewletê ve nedihatî darizandin û hesabê çî tiştî ji wan nedihate pirsîn. Nemaze jî, ew saziya ku bi navê JÎTEM'ê (Saloxgêriya Cendirmeyê û Yekîneya Têkoşîna bi Terorê re) têtê zanîn; çî caran ji aliyê dewletê ve nehatiye qebûl kirin. Ev nimûne ji bo vê behsê girîng in. Îtîrafkarên JÎTEM'ê û derbîrrînen hinde leşkeran, li dor behsa vê stratejiyê, naverokê û konseptê aşkîra dike. Li gor axaftina Cem Erseverê ku di dema van rûdawan de leşker bû û di 4'ê Sermaweza 1993'ê de ji artêşê îstîfa kir. Wê demê kesek piştî 5 mehan bi awayekî ku destê wî hatibû girêdan û bi du qurşûnan hatibû kuştin, li navçeya Elmadaxa Enqereyê cesedê wî hate dîtin. "Navê JÎTEM'ê xelet e, rêxistineke wesa tune, navê wê yê rast, Femandariya Koma Saloxgêriya Cendirmeyê ye. JÎTEM, tê maneya Saloxgêriya Cendirmeyê û Têkoşîna bi Terorê. Rêxistineke wesa nîne û çî caran jî nebû.²⁴ Mîralay Arif Doğan, ku wî jî wekî Cem Ersever li herêmê di demê dirêj kar kiribû; berovajî gotinên Ersever, hebûna JÎTEM'ê rast dike û xwe wekî avakerê JÎTEM'ê qebûl dike û dibêje min di sala 1990'î de ew fesxkiriye.²⁵ Li ser van gotinên Arif Doğan; Hakan Yükselê ku dozgerê Cumhuriyetê û berpirsê karên Teror û Sucên Organîze bû, lêpirsînek/tehqîqat da destpê kirin û di derbarê "Hebûn an tunebûne JÎTEM'ê" de, ji Wezareta Karên Navxwe, Serokatiya Serfermandariyê, Femandariya Giştî ya Cendirmeyê, Mîstêşariya MÎT (Rêxistina Saloxgêriya Netewî) û ji Serkariya Giştî ya Asayîşê re nivîs şandin. Di bersivên ku jê re hatibûn nivîsîn de, hebûna JÎTEM'ê hate qebûl kirin û weha hate gotin: "Vê saziyê, li dor behsa têkoşîna bi terorê re, çalakîyên xwe kirine." Wekî din di bersiva Femandariya Giştî ya Cendirmeyê de jî tê gotin ku, JÎTEM di sala 1990'î de hatiye fesxkirin. Di vê lêpirsînê de, agahiyeke balkêş a di derbarê avakirina JÎTEM'ê de heye. Li gor bersivê; "JÎTEM bi pesendkirina Wezareta Karên Navxwe nehatiye avakirin û bi fikrê Serokatiya Serfermandariyê saz nebûye û

24 Yalçın, S. *Binbaşî Cem Ersever'in İtirafları*, 2003:90.

25 Doğan, A. *JÎTEM'i Ben Kurdum*, 2011:56

bi înfîyatîfa Femandariya Giştî ya Cendirmeyê hatiye avakirin.²⁶

Cem Ersever terma JÎTEM'ê bi kar nedianî û her û her digot JÎT (Rêxistina Saloxgêriya Cendirmeyê). Îtîrafên wî yên di derbarê JÎTEM'ê û çalakîyên JÎTEM'ê yên li devera OHAL'ê, nîşaneyê belavbûna rayedariya Femandariya Koma Saloxgêriya Cendirmeyê aşkîra dikir. Her weha, îtîrafkar, cerdevan û unsûrên sivil ên saloxgêriya cendirmeyê û tîmên tîkel ên rayedarên artêşê, ew kesên ku pêwendîya wan bi PKK'yê re hebûn û wekî milîs dihatin tawanbarkirin, werdigirtin û ew an wenda dikirin, an îşkence lêdikirin û an jî bi sûtîqestê dikuştin. Devera ku Kurd lê dijyan li dor vê stratejiyê dabeşî sê koman bibû; koma yekem ji xeta Amed, Bedlîs, Çewlîk, Xerpêt û Dêrsim; ya duyem Şernex, Cizîr, Qilaban, Sêgirka û ya sêyem jî ji xeta Nisêbîn, Midyat, Mêrdîn û Qoserê pêk dihat. Li gor Ersever, di koma duyem de eşîra Babat ên cerdevan û serokê eşîrê Hazim Babat di navbera dawîya salên 80'yî û serê salên 90'î de di vê stratejiyê de karîger bûn. "Koma duyem ji cerdevanên Babat pêk dihatin, serokê eşîra Babatan, Hazim Babat, berpirsê, kuştinên kiryarê nediyar bû. Serokê eşîra Babatan Hazim Babat, wekî din, sercerdevan bû. Ji bo ku xwe li ber dewletê xweş bike, pêwendiyên xwe her xurt bike û ji bo berjewendiyên xwe, mirov dikuştin."²⁷ Îtîrafên Ersever ên balkêş ên din jî derbîrrînen wî yên di derbarê rol û mîsyona îtîrafkarên PKK'yê de ne. Li gor Ersever, kêşeya Artêşa Tirk a herî mezin, nezaniya û naşîtiya Artêşê ya di derbarê devera OHAL'ê û taybetmediyên civaka Kurd de bû. Lewma; ji ber ku îtîrafkar hem ji wê deverê bûn û hem jî di derbarê tevgerê de agahdar bûn û xwedî fonksiyon bûn. Îtîrafkar dabeşî du qîsman dibûn: îtîrafkarên polîs û îtîrafkarên cendirme. Ew bi leşker û unsûrên din ve, beşdarî operasyonan dibûn, cihê gerîlayan nîşanî wan dikirin û agahdariyên di derbarê PKK'yê de bi wan re parve dikirin. Îtîrafkar, pîrrî caran ceza xwaribûn, lêbelê di girtîgehê de ninbûn û bi leşkeran re

26 "Ve devlet JÎTEM'i resmen kabul etti", *Radikal*, 09 Tîrmeh 2011. <http://www.radikal.com.tr/radikal.aspx?aType=RadikalDetayV3&ArticleID=1055684&CategoryID=77>

27 Yalçın, S. 2003:136.

beşdarî operasyonan dibûn.²⁸

Ji aliyê gelek kesan ve jî tê zanîn ku, hinde grûbên ku ji cerdevanên di nav saziya asayîşê û cendirmeyê pêkhatî, îtîrafkar û wezîfedarên ewlehiyê, li devera OHAL'ê, bi awayekî sistematîk li dijî mirovên Kurd û 'kesên gumanbarê PKK'yê bûn', bi awayekî der qanûnî mafên wan ên mirovane, bînpê kirin. Bi taybetî gelek leşkerên ku pêwendiya wan bi Femandariya Saloxgêriya Cendirmeyê hebûn, îtîrafkar û cerdevan, hem di nav van karan de hebûn û hem jî di organîzasyona wan de bi cih girtin û ew hîn niha jî nehatine darizandin. Hindek ji wan kesan, niha di doza Balyozê û hinde kes jî di doza Ergenekonê de tên darizandin. Hinde ji wan niha najîn û hindek jî qet nehatine darizandin. Di nav wan kesan de yê navdar ev in: Cem Ersever, Velî Küçük, Mahmut Yıldırım (Yeşil) Arif Doğan, Cemal Temizöz, Cahit Aydın, Eşref Bîtlîs, Mete Sayar, Necati Özgen, Hulusi Sayın û Hasan Kundakçı ye.²⁹ Di nav wan kesan de yê ku eleqeya wan bi saziya leşkeriyê re hebûn, demekê li Qibrîsê perwerde bibûn û paşê vegehbûn.

Li dor behsa şerê taybet; Hîzbûllah, ji aliyê dewletê ve hat perwerde kirin û karê qirêj pê hat kirin. Hîzbûllah, bi taybetî jî li devera OHAL'ê, di nav kuştin û îşkenceya gellek kesan de her tim xwedî rolekê bû. Di rapora ku ji aliyê Komîsyona Lêkolîna Meclîsê (TBMM) ve hatibû amadekirin de, bi taybetî jî ya ku ji aliyê raya giştî ve, di 3 Avrêla 1997'ê de b navê Susurluk têtê zanîn de hatiye destnîşan kirin ku, Hîzbûllahê, li Batmanê ji artêşa Tirk perwerdeya leşkerî û siyasî wergirtiye.³⁰ Avakerê JÎTEM'ê Mîralay Arif

²⁸ Yalçın, S. 2003:94-97.

²⁹ Kılıç, E. *JÎTEM Türkiye'nin Faili Meçhul Tarihi*, 2011:43.

³⁰ Eşref Erdemê ku parlamenterê Enqereyê bû û 23 hevalên wî, mebûsê Batmanê Atullah Hamidî û 22 hevalên wî, mebûsa Mersinê Oya Araslı û 20 hevalên wê, mebûsê Stenbolê Halit Dumankaya û 23 hevalên wî û mebûsê Stenbolê yê wêkî Mehmet Cevdet Selvi û 21 hevalên wî, ji bo ku pêwendiya dewletê û ya rêxistinên îlegal aşkîra bibe, li dor werara xala Makezagonê ya 98'ê û rêznameya navxwe ya 104 û 105'ê, Pêşniyarnameya Lêkolîna Meclîsê kirin. Rapora Komîsyona Lêkolîna Meclîsê bi nimreya (10/89, 110,124, 125 û 126) 3 Avrêla 1997, r. 358 <http://www.tbmm.gov.tr/sirasayi/donem20/yil01/ss301.pdf>

Doğan jî di doza Ergenekonê de, di 17 Rêbendana 2011'ê de li dadgehê îtîraf dike û dibêje ku min bi xwe Hîzbûllah bi navê Hizbul-Kontr (Partiya Kontrayan) avakiriye ku li dijî PKK'yê şer bike.³¹

Bi van polîtîkayên sistematîk ên ku li devera OHAL'ê tetbîq dibûn, kuştinên 'kiryarê nediyar' her ku çû zêdetir bûn, û li Kurd tûşî bizavnên şidet û tundiyê bûn. Di destpêka salên 90'î de, siyasetmedarên Kurd, nivîskar û rojnamevan û gellek aktîvîstên ku ji aliyê Kurdan ve wêkî lîder û serok dihatin qebûlîkirin, hatin kuştin. Di nav vê atmosfera aloz û bêaram de, bi teknîkên kont-gerîlayî kar û kiryar bêhtir pêkan bûn di nav vê atmosferê de karên xwe çêtir kirin. Vedat Aydinê ku, serokê Partiya Kedê ya Gel (Halkın Emek Partisi) ya Amedê bû, 5'ê Tîrmeha 1991'ê de, ji aliyê tîmên Asayîşê bûn hatin wergirtin û di 7'ê Tîrmehê de li ser rîya Amed-Xerpêtê û nêzî Madenê cesedê wî hate dîtin. Bi deh hezaran kes beşdarî defnkirina wî bûn. Di merasimê de leşkeran gule li ser girseya mirovan barandin û ji mirovan 7 kes kuştin û bi sedan kes jî birîndar kirin. Rêvebir û parlamenterên HEPê yê wêkî Ahmet Türk û Fehmi Işıklar, bi dar û çovan lêdan xwarin.³² Di 20'ê Îlona 1992'ê de li taxa Seyrantepeya Amedê Musa Anter jî bi sûiqestê hate kuştin. Abdülkadir Aygün'ê ku di nav JÎTEMê de bû, bi xwe îtîraf kir ku di nav tîma ku Anter kuşt de, ew bi xwe jî hebû.³³ Mehmet Sincarê

³¹ Benjamin Harvey, "Turkey Officer Says He Created Local Hezbollah Group, Star Says", *Bloomberg*, 18 Rêbendan 2011, <http://www.bloomberg.com/news/2011-01-18/turkey-officer-says-he-created-local-hezbollah-group-star-says.html>

³² Kılıç, E. 2011: 89-95. Abdülkadir Aygün û Mehmet Demir'ê ku îtîrafkar bûn, gotin kuştina Vedat Aydinê karê Cem Ersever bû. Mehmet Demir di derbarê kuştina Vedat Aydinê de ev tişt gotin: "İsmail Yedilyıldızê ku wê demê Femandarê Alaya Amedê bû, bi Cem Ersever re ji me re got, 'hevalno, em dê Vedat Aydinê darizînin.' Min wê demê fêhm kir ku dê wî bikujin. Ji bo ku wî bikujin, ji nav koma Tîmên Taybet, hin kes hatibûn wezîfdar kirin. (...) Darizandina wî wergirtin kamerayê jî. Heta serê sibehê îşkencê lê hate kirin, lê wî çî tişt negot. Sibehê di saet 6'ê de, Cem Ersever hat. Jê re xwarin anîbûn û dan Vedat Aydinê jî. Lê wî got, 'Nemerdno, ez nanê we naxwim.' Ew roj dîsa îşkence lê kirin û dema ku fêhm kirin ew çî tişt nabêje, di nivê şevê saet 12'ê de, ji aliyê wê grûbê ve hat wergirtin û ber bi Madenê ve hat birin. Em bi du wesayitan çûn, Vedat Aydinê di wesayîta pêşiyê de bû. Em li cihekî rawestîn. Vedat Aydinê birin û di bin pîreyekê de înfaz kirin. Yê ku ew kuşt Hasan Adak bû.

³³ "Babamın katiliyle buluşmaya nasıl karar verdim?", *Hürriyet*, 21 Ocak 2006. <http://www.hurriyet.com.tr/pazar/3825189.asp>

ku yek ji damezrînerê Partiya Kedê ya Gel û parlamenterê Partiya Demokrasiyê (DEP) bû, ji bo ku lêkolînan li ser kuştinên kiryarê nediyar bike çû Batmanê û li wir bi sûîqestê hat kuştin. Mehmet Sincar di rê de dimeşiya û yekî ji paş ve, qûrşûn lê barandin û li patika stûyê wî xistin û ew kuştin. Li gel Mehmet Sincar, di wê êrîşê de, endamê Rêveberiya Bajêr a DEP'a Batmanê, Metin Özdemir jî hate kuştin. Serokê Komeleya Mafê Mirovan, Şaxa Xerpêtê, parêzer Metin Can û doktor Hasan Kaya şeva 21'ê Sibata 1993'ê de hatin revandin û malbata wan li wan geriyan. Bi dehan mirov, di bîna SHP'yê de dest bi greva birçîbûnê kirin û hat xwestin ku ew bêne dîtin. Ew kesên ku Metin û Hesen revandibûn, telefon bo malbata wan dikirin û dengê wanê îşkenceyê bi malbata wan didan guhdar kirin. Di 27'ê Sibata 1993'ê de, pêlavên Metin û Hesen li ber bîna SHP'yê hatin dîtin. Rojek piştî wê, laşê wan ê ku îşkence lê hatibû kirin, di bin Pira Dînara ku nêzî Dêrsimê de ye hate dîtin. Di serê wan herduyan de jî 2 qûrşûn hebûn û wesa hatibûn dîtin.³⁴ Di 3'ê Mijdara 1993'ê de serokwezîr Tansu Çiller, piştî kombûna MGK'yê (Lijneya Asayîşa Netewî) got ku " Di destê me de, listeya 60 bazirganên Kurd ên ku palpiştiya PKK'yê dikin heye." Piştî van gotinên Çiller, di 14'ê Rêbendana 1994'ê de, bazirgan Behçet Cantürk û şofêrê wî hatin revandin. Rojek piştî wê, cesedê herduyan ê ku îşkence lê hatibû kirin, li nêzî Sapancayê hate dîtin. Di 2'ê Pûşbera 1994'ê de bazirganê Kurd Savaş Buldan û Hacı Karay û Adnan Yıldırımê ku li nik wî bûn, hatin revandin. Di 4'ê Pûşberê de laşê wan ê îşkence lê hatibû kirin, li nêzî Boluyê hate dîtin. Di serê her sêyan de jî qûrşûn hebû û wesa hatibûn kuştin. Wê demê Veli Küçük, wekî Fermanarê Koma Saloxgêriya Cendirmeyê yê di 19'ê Gelawêja 1993'ê de li Kocaeliyê dest bi kar kiribû.³⁵ Devera ku Kurd lê dijiyan, di nav atmosfereke dijwar û şereke giran de bû. Her ji ber wê, stratetija wendakirinê, di nav atosfereke weha de hate tetbîq kirin.

34 Kılıç, E. 2011:150.

35 Kılıç, E.2011:163-169, "O MGK'da 1200 kişilik liste vardı", *Radikal*, 13'ê Berfanbara 2011'ê <http://www.radikal.com.tr/radikal.aspx?aType=RadikalDetayV3&ArticleID=1072339&CategoryID=78>

Bi awayekî kurt, wendakirin, di piştî derbeya 12'ê Îlona 1980'ê de ji aliyê dewletê ve, cardin hate bikaranîn û di destpêka salên 1990'an de bi momenteke dîrokî û siyasî ya bi vî rengî zêdetir bû. Di nav dewletê de, hinde grûp û cimaetên ku tevlihev bûn û reqîbê hevdu bûn, dixwestin ku arîşeya Kurd bi metodên tund û çavsoyîyê çareser bikin. Ew kes di bin kontrola qanûnen de nebûn û ji bo ku gel palpiştiya PKK'yê neke, destûra her tiştî werdigirtin. Atmosfera mîlîtarîst, a piştî derbeyê rûda bû, her sanahî û hêsani bo grûbên weha durist dikirin û dorûbera meşrûiyeta şerê sivik her berfireh dikirin. Di dema Şerê Sar de, ew saziyên kontr-gerîla, yên ku li dijî komunîstan şer dikirin û ji aliyê dewletên ku nêzî NATO'yê ve hatibûn saz kirin, bi xelasbûna Şerê Sar ve li gellek dewletên Ewropî feramûş bûn, lêbelê berovajî wê li Tirkîyeyê, ew cardin, jinûve hatin organîze kirin. Her çend ew şer ne gur û geş be jî, ji bo bizavên wan saziyên kontr-gerîla, seheyêke pîrr baş bû.

III.

WENDAKİRİNÊN Lİ

TİRKİYEYÊ PÊK HATİNE:

NÊRÎNEKE GİŞTÎ

Li Tirkiyeyê, ji derbeya leşkerî ya 12'ê Îlona 1980'ê heta niha, bi awayekî zanistî, çend kes hatine wendakirin, nayê zanîn. Di derbarê hejmara wan kesên ku hatine wendakirin de, ji aliyê Komeleya Mafê Mirovan, Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê, Komeleya Piştewaniya Xizmên Windayan (YAKAY-DER) û gelek lêkoleran ve, hinde lîste hatin amade kirin. Lêbelê di van lîsteyan de, hejmarên ku hatine destnîşan kirin, ên komeleyên curbicur, hevdu piştras nakin û wekî hevdu nînin. Ji ber ku di derbarê wan kesên ku hatine wendakirin de, krîtereke hevgerî nîne û ji wê egerê di derbarê van hejmaran de hinde arîşe rû didin: gelo ew kesên ku cesedê wan hatine dîtin, di nav behsa wendakirinê de tîr qebûl kirin an na? An ew kesên ku ragirî bûne û di nav çend saetan de hatine kuştin û înfaz bûne, dê wekî 'wendakirî' bêne qebûl kirin an divêt ew wekî înfazên der qanûnî bêne qebûl kirin? Bi awayekî gelemperî, li gor raya komeleyên mafê mirovan, heger kesek hatibûye wendakirin û piştî laşê wî hatibûye dîtin, divêt ew ji nav tesnîfa wendakirinê bête derxistin.³⁶ Ev nêrîn, di behsa wendakirinê de, xwe dispêre aksiyoneke nediyar (muphem) û heta dereceyekê rast e. Lêbelê em wekî Navenda Bîrgehê, di wê qeneatê de nînin.

Wextê ku kesek hate wendakirin û piştî laşê wî hate dîtin, ev yek vê rûdawê ji konteksta wendakirinê derdixe an dernaxe? Bi raya me divêt ev tişt bête gengeşe kirin: Li gor xizmên wendayan; wendakirin, bi awayekî aşkira hatine pê; ew kesên ku hatine wendakirin, ji ber ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatine wendakirin û heger cesedê wan hatibe dîtin jî, di rastiyê de, ew kes bi riya wendakirinê hatine kuştin. Her weha, me dema ku di derbarê wendakirinan de ev xebat û lîste amade kirin, me çî ferq nexist nav wan kesên ku laşê wan hatiye dîtin û nehatiye dîtin. Ji ber ku di derbarê hejmara wendayan de, reqemên mîsoger/zanistî nînin, me li hemû xebatên li ser wê meseleyê pêkole kirin. Me ji raporên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD), Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê, (TÎHV) pirtûka Komeleya Piştewaniya Xizmên Windayan (YAKAY-DER)

³⁶ Alpkaya, G. 1995:41.

a bi navê *Sımsıcaktı Elleri*, agahiyên Mazlum-Der'ê, lîsteya Helmut Oberdiek a ku înternetê de hatibû weşandin û lîsteya *Rojnameya Radîkal*'ê ya wendayên ÎHD'yê kû di sala 2008'ê de hatibû weşandin û serlêdanên Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê sûd wergirt û lîsteyeke wesa amade kir. Em dîsa diyar dikin ku, ev lîsteya ku me amade kiriye, divêt bi daneyên zanistî ve bêne piştras kirin. Li gor lîsteyê ji 12'ê Îlona 1980'ê vir ve, 1.353 kes hatine wendakirin.

LI GOR SALAN HEJMARA KESÊN KU HATINE WENDAKIRIN

1980-1990	33
1991	18
1992	22
1993	103
1994	518
1995	232
1996	170
1997	94
1998	50
1999	76
Piştî 2000'ê	33
Dîrok nediyar e	4
TEVAHÎ	1353

Ji tabloyê jî diyar e ku, wendakirin, stratejiyeke salên 90'an e û bi awayekî sistematîk û xisûsî jî di navbera salên 93-99'an de hatiye tetbîq kirin. Destnîşankirina belavbûna wendayan, a bajarane jî, di derbarê van wendakirinan de meyla dewleta Tirk aşkira dike.

DABEŞKIRINA WENDAYAN A LI GOR BAJAR Û SALAN³⁷

	1980-1990	1991	1992	1993	1994	1995	1996	1997	1998	1999	2000 Û PIŞTÎ WÊ	DÎROK NE DÎ-YARE.	TEVA-HIYA BAJARAN
Amed	2	3	3	27	141	53	63	41	16	17	16	0	382
Şernex	14	6	5	42	84	29	11	5	3	2	7	3	211
Mêrdîn	1	4	4	6	68	43	15	11	3	27	2	0	184
Batman	0	1	0	7	30	11	7	5	5	10	1	0	77
Stenbol	4	2	4	5	15	14	22	4	5	6	1	0	82
Hekarî	2	0	1	0	34	22	9	1	0	0	0	0	69
Dêrsim	0	0	1	0	31	6	6	2	1	0	0	0	47
Riha	1	0	0	7	10	8	2	3	0	1	1	0	33
Edene	0	1	0	0	21	1	4	1	0	0	0	0	28
Bedlîs	0	0	0	5	8	5	5	1	0	2	0	0	26

Ev agahiyên di derbarê wendakirinan, ên ku bi daneyên zanistî ve nehatine piştras kirin, 2 meyl û tandansê destnîşan dike: Ya yekem, wendakirin, di navbera salên 1993 û 1996'ê bêhtir pêk hatine û nemaze jî di navbera salên 1991 û 1999'ê de rûda ne. Ya duyem, di salên 90'î de, xisûsî jî li devera OHAL'ê hatiye tetbîq kirin. Stenbol û Edene, du bajarên ku derveyî devera OHAL'ê ne. Her çend bi daneyên mîsoger nehatibin piştrast kirin jî, wendakirinên li van her du bajarên, bi taybetî siyasatmedarên Kurd, pêşeng û serekên Kurd in. Lêbelê, bi taybetî li cihên ku derveyî devera OHAL'e ne, gelek kesên mixelîf, xwendekarên zanîngehan ên çepgir/çeprew, milîtanên pêwendiya wan bi siyaseta çep ve heye û kesên demokrat ên raya giştî jî, di salên 90'î de hatine wendakirin.

³⁷ Ev liiste, di nav 10 bajarên ku wendakirinên ku herî zêde rûda ne hatiye amade kirin.

IV.

MĪJARA LĒKOLĪNĒ Ū

METODOLOJĪ

Ev rapor, di lêkolîneke salekê de hatiye amade kirin û bi sernavê 'Rastiya Veşartî: Wendakirin' e. Ev lêkolîn hewl dide ku li dor behsa praktîktên wendakirinên ku piştî derbeya leşkerî ya 1980'ê rûda ne, bingeha wê ya sosyolojîk û hiqûqî ya ku ew pêşk û stratejî pêkan kirine pêkole bike, û tiştên ku hatine serê xizmên wendayan aşkîra bike. Tiştên ku em dixwazin bersivên wan bizanibin, bi kurtahî ev in: stratejiya wendakirinê, bi kîjan amûrên hiqûqî, siyasî û civakî hatiye tetbîq kirin? Li gor çî fakteran, di derbarê vê stratejiyê de civak hate bê deng kirin û bê qeyd û merciyeke dûvedirêj hate ava kirin? Xizmên wendayan, piştî wendakirinan, rastî çî hatin û ew tecrubeyên xwe çawa terfî dikin? Stratejiya wendakirinê, li dor behsa dewlet, dadwerî û niştimaniyê çî ji me re dibêje?

Mimkun nîne ku, di nav salekê de, em bersiva van pirsên ku li her derê Tirkiyeyê qewimîne bidin û di derbarê wendakirinan de bi rêk û pêk agahdar bibin. Her ji ber wê, me di dirêjahiyê salekê de, cîgehek kifşe kir û aşkirakirina wendakirinên ku li wê derê rûda ne zelal bikin. Di derbarê temami 1.353 kesên ku hatine wendakirin de, ji ber ku di nav salekê de bi dest xistina dane û agahiyên zanistî pêkan nînin; me xwest ku cihekî kifşe bikin û li wê derê bi nûnerên wir re hevdiîtinan pêk bînin û lêkolîna xwe wesa bigehînin merheleyekê.

Cihê ku me diyar kir, Şernex bû. Şernex ji çend aliyan ve cihekî girîng e: Ya yekem Şernex, li gor lîsteya me ya mîsoger nîne, piştî Amedê û Mêrdînê, li Tirkiyeyê bajarê ku wendakirin herî zêde lê qewimî ye. Li Şernexê bi giştî 211 kes hatine wendakirin. Ya duyem Şernex, bi taybetî jî li dor behsa dosyeya Temizöz û hwd, cihê ku wendakirin bi destê leşker-cerdevan-îtirafkar pêk hatine û cihekî girîng e. Ya sêyem, gellek leşkerên xwedî paye li Şernexê kar kirine û geh di dosyaya Temizöz de, geh jî di dosyeyên wekî doza Ergenekon û Balyozê de gellek kes hatine darizandin û gellek kesan ceza xwarine û di derbarê gellek kesan de jî îfadeyên curbicur hene ku agahiyên girîng jê derketine. Ya çarem, Şernex, hem di warê cografîk de, hem jî ji ber ku nêzî deriyê sînorê Xêbûrê ye û cîgeha bazirganiyê ye û hem jî mobilîzasyoneke siyasî jê peyda bûye.

Her ji ber van, di dema şer û pevçûnê de, xwedî praktîkên berxwedanê yên girîng e û di her warî de tûşî polîtîkayên guşar/zilmê bûye.

Her weha me lêkolîna xwe ya sehayî li Şernexê çêkir. Ji ber ku ofîsa Navenda Bîrgehê li Stenbolê bû, me wekî din jî, li Stenbolê bi xizmên wendayan re hevdiîtinan pêk anî. Me di vê xebata xwe de bi tevahî 3 caran Şernex ziyaret kir. Me lêkolîna xwe ya sehayê ya yekem, di 1-7'ê Îlona 2012'ê, ya duyem 12-18'ê Cotmeha 2012'ê û ya sêyem jî 30 Mijdar û 6'ê Berfanbara 2012'ê pêk anî. Komeleya YAKAY-DER'ê hem di lêkolîna sehayî de, hem jî di roportajên li Stenbolê de gellek alîkariya me kirin. Ji destpêka vê projeyê heta niha, YAKAY-DER'ê, gellek pêwendiyên girîng ên wekî hevnasîna me ya bi aktîvistên Komeleya Piştevaniya Xizmên Windayan a Mezopotamya (MEYA-DER) re pêk anî. Wekî din, li Şernexê, me bi palpiştiya MEYA-DER'ê, xizmên wendayan nas kir û bi saya wan ew beşdarî vê xebatê kirin. Dîsa, hem li Şernexê, hem li Stenbolê, aktîvistên mafê mirovan, dadnasên ku li ser vê meseleyê dixebitin, xebatkarên şaredariyê û nûnerên saziyên sîvil ên curbicur, di geşepêdana vê xebata me de hem di çêkirina pirsên û lêkolînê de hem jî pêwendîdanîna me ya bi xizmên wendayan re, her piştevan bûn.

Di xebata sehayê de, di derbarê 69 wendayan de, me 86 axaftin pêk anî. Ji bilî xizmên wan mirovên ku hatine wendakirin, me bi dadnas û nûnerên rêxistinên mafê re jî hevdiîtinan pêk anî. Me di derbarê devera ku Kurd lê dijîn de, bi komeke ji 6 kesan pêk hatî ya ku wan deran baş dizane û piştî jî bi du kesan re axaftinek pêk anî. Em bi gellek kesan re an yek bi yek û rû bi rû, an jî bi kombûyî, peyivîn. Hevdiîtin, li Cizîr, Silopiya, Hezex, Amed û Stenbolê pêk hat. Di derbarê 21 wendayan de hevdiîtin bi Tirkî, di derbarê 3 wendayan de jî hevdiîtin hem bi Tirkî û hem bi Kurdî, di derbarê 45 wendayan de jî hevdiîtin bi tenê bi Kurdî hatin kirin. Ji bilî xizmên wendayan, me hevdiîtinên xwe bi zimanê Tirkî kirin. Ekîba lêkolerên sehayê ji Özgür Sevgi Göral, Gamze Hızlı, Özlem Kaya, Ayhan Işık, Berivan Hicret Turhan û Zeynep Ekmekçi pêk tê.

V.

DÎ DERBARÊ CÎH DE

ÇEND AGAHÎ

Wekî di beşa metodolojiyê de hate destnîşan kirin, ji ber gellek sedeman, me ji bo cihê lêkolînê Şernex bijartibû. Lêbelê di nav wan sedeman de, faktera herî girîng, taybetmendiya Şernexê ya bîrgeha/hefizeya civakî ya salên 90'î bû. Şernex; bi êrîşa Basanê, bi gundê Cinîbirê, bi Newroza Cizîrê, bi înfazên Silopiyayê û çawa ku Levent Ersöz dibêje wekî 'Komara Şernexê' di bîra me de ye. Şernex ji du bajaran yek e ku Rewşa Awarte herî dawî ji hikmê ket û her weha cîgeha kamilkirina rejîm û polîtîkayên Tirkîyeyê ye.

Şernex di sala 1913'ê heta 1990'î, bajarekî girêdayî Sêrtê bû. Di sala 1990'î de bû wilayet.³⁸ Şernexî, sedema bajarkirina bajêr, dispêrin egerên leşkerî û avakirina tabura/gurdana cendirmeyê ya li bajêr. Şernex ji navendê, Bêşebabê, Cizîrê, Basanê, Hezexê, Silopiya û Qilabanê pêk tê û 7 navçeyên wê hene. Gelheya bajêr li gor jimartinên nifûsê yê 2011'ê 290.307 kes e. Navçeya wê ya Cizîr nêzî 100 hezar e û navçeya herî mezîn e. Piştî Silopiya tê û gelheya wê nêzî 80 hezar e.³⁹

Her navçeyeye Şernexê, di salên 90'î de, di bin tesira polîtîkayên dewletê yê curbicur de bûn. Di sala 1989'ê de, li gundê Cinîbirê, pîsî bi gundiyan hat xwarin; di sala 1992'ê de, di Newroza Cizîrê de, gule li ser girseyê hat barandin û li gor jêderkên fermî 57, li gor Cizîriyan bi sedan kes hatin kuştin; di 19'ê Gelawêja 1992'ê de, bi angaştê ku 'PKK'yê êrîşî bajêr kiriye' û bajar bi hefteyan hatiye dorpêç kirin; 15'ê Rêbendana 1996'ê, di Qetlîama Basanê/Güçlûkonak de 11 cerdevan hate kuştin û laşê wan hate şewitandin; di 25'ê Rêbendana 2001'ê de serokê Partiya Demokrasiya Gel a Silopiyayê û du rêvebirên wê Serdar Tanış û Ebubekir Deniz, hatin wendakirin; di dawiya salên 1980'ê heta destpêka salên 2000'î, ev rûdaw di bîr û hefizeya bajêr de cihêkî pir girîng wergirtiye.⁴⁰ Di salên 90'î de li

38 (Dîroka Şernexê) "Şirnak tarihi", *Zaman*, 1'ê Tîrmeha 2007. http://www.zaman.com.tr/sehir_sirnak-tarihi_565263.html

39 Ji bo dabeşkirina navçeyên Şernexê, li gor jimartina nifûsê ya 2011'ê bnr. <http://www.webcitation.org/6BuHLiC8t>

40 Başlangıç, C. *Korku İmparatorluğu*, 2001:9-201; "21 Mart 1992: Cizre'de Newroz kutlamalarında kontrgerilla katliamı yapıldı", *Marksist.org*, <http://www.marksist.org/tarihte-bugun/3270-21-mart-1992-cizrede-newroz-kutlamalarinda-kontrgerilla-katliam-yapti>

Şernexê gellek mirov hatin wendakirin, li kuçeyan hatin qetilkirin, ji helikopteran hatin avêtin. Wan salan, ji piştî saet 4'ê berêvarê derketina sûkê qedexe bû û di seyareyên sipî yê Renault Torosê de aqûbeta gellek kesan nedihate zanîn. Di derbarê wan salên reş û tarî de, gotinên Mete Sayarê mîrlîwa yê ku ji komek rojnamevanan re gotibû, bo fêmkirina rihê wan salan girîng in: "Ez dixwazim ku li vir tabloyeke xweş çêbikim. Heger kesek lekeyekê birijîne ser wê tabloyê, ez ê wê tabloyê di serê Şernexiyên de bişikînim. Ji xwe min şikand jî..."⁴¹

Leşkerên ku li Şernexê kar kirine jî bi serê xwe balkêş in: Cem Ersever, Veli Küçük, Arif Doğan, Mete Sayar û Cemal Temizöz. Hema hema ev hemû kes ji sûcekî ceza xwarine. Cerdevanên navdar ên Şernexê jî Kamil Atak, Bahattin Aktuğ û Hazım Babat e. Navên îtirafkarên ku bi cerdevan û leşkeran re kar kiribûn ên têt zanîn: Adem Yakînê ku wekî Bedran, Fırat Altınê (Abdülhakim Güven) ku wekî Ferîd û Xidir Altuğê ku wekî Tayfun dihate zanîn û Cemal Temizöz, Kamil Atak, Kukel Atak, Temer Atak, Adem Yakîn⁴², wekî din bersûcên dosyaya Temizöz û yê din.⁴³ Navê van hemû kesan, ji aliyê xizmên wendayan ve, di hevdîtinên me de jî yek û yek derbas bû; xizmên wendayan, karê leşker, cerdevan û îtirafkaran ên tevahî kiribûn, bi awayekî teferûat ji me re gotin.

Dema ku em hejmarên mirovên ku hatine wendakirin ên li Şernex û navçeyên wê, ji 12'ê Îlona 1980'ê heta niha dinihêrin, 211 kes hatine wenda kirin. Li Cizîrê 79 kes hatine wenda kirin û ev hejmar di nav navçeyan de, reqema herî zêde ye. Piştî jî Silopiya tê û 69 kes li wir hatine

41 Başlangıç, C. "Burası Şirnak cumhuriyeti", *Radikal*, 05.05.2011, <http://www.radikal.com.tr/haber.php?haberno=1603>

42 Adem Yakîn wekî din, di dawiya salên 80'yî de li deverê kar kiriye û îtirafkarê ku di nav ekîba Cem Ersever de cih girtiye. bnr. Yalçın, S. 2003: 42, 160-162, 170.

43 Biryarnameya bi nimreya 2009/972 ya Serdozgera Komarê ya Amedê. Bi vê biryarnamê, di Dadgeha Cezaya Giran a Amedê de, doza ku ji bo Temizöz û bersûcên din hatibû vekirin, bi nimreya 2009/470 berdewam dike. Di raya giştî de ev doz wekî doza Temizöz û yê din (Temizöz ve diğeri) têt zanîn.

wenda kirin. Li Basanê 22 kes, li navend û gundên Şernexê 21 kes, li Hezexê 11 kes, li Bêşebabê 3 kes û li Qilabanê jî 6 kes hatine wendakirin. Mirov herî zêde di navbera salên 1993 û 1997'an de hatine wenda kirin; lêbelê di sala 2001'ê de jî dîsa mirov hatine wenda kirin. Her wesa, li Şernexê, di beriya sala 1993'ê de jî mirov hatine wenda kirin. Lêbelê divê mirov aşkira bike ku, li Şernexê mirov bi tenê nehatine wenda kirin. Wekî me di beşa Paşxaneyê de jî destnîşan kir, li dor konseptê 'hakimiyeta qadê' du cureyên bînpêkirina maf ên din jî hene: Koçberkirin/koçrevkirin û înfazên kêyfî û îllegal. Li gor derbîrrînên xizmên wendayan, hemû gundên Şernexê di salên 90'î de mecbûrî cerdevantiyê bûne û kîjan gund nexwestiye bibe cerdevan, ew hatine şewitandin. Bi tenê jî gundiyan Şernexê nehatine koçberkirin. Di hevdîtinekê de, li gor hinde gotinan, li taxa Cûdî ya Cizîrê, 7 hezar malbat, li gor hinde gotinan jî hezar malbatên ji egera ku koçrev bûne, dijîn. Ev malbat wekî, 'malbatên welatparêz' tên zanîn. Li dor vê behsê, Taxa Cûdiyê 'taxa herî welatparêz' tê zanîn û ev jî destnîşan dike ku malbatên ku hatine wenda kirin, bêhtir nêzî siyaseta Kurd in. Piştî koçreviyan cerdevanan mal û xaniyên gundiyan desteserkirin û di malên wan de bi cih bûn. Her wesa diyar e ku, xaniyên ku bi topa hawanê hatine xerab kirin, sivîlên ku li kuçeyan ji aliyê leşkeran ve hatine kuştin û serboriya mirovên ku ji aliyê kesên nediyar ve hatine înfaz kirin, her yek ji perçeyên dîroka Şernexê ne. Lewre Şernexî; hem bi muemeleyên Wendakirinan, hem jî bi Koçberkirin û Înfazên Kêyfî û Îllegal ve hatine şerpeze kirin.

Bi taybetî, îdianameya bi nimreya 2009/972 ya dosyaya Temizöz û yê din, ku dîroka wê 14.07.2009 bû, di derbarê wendakirînan Cizîrê de gellek tiştên girîng terîf dikin. Ew îdianame, bi îfadeyên birayê Kamîl Atak ê Mehmet Nuri Binzet û cerdevanê gund ve, bi bernavê Sokak Lambası û Tükenmez Kalem hate nivîsandin. Gotinên van her du şahidan, hem wekî hevdu bûn û hem jî, şopa kuştin û înfazan, bi îfadeyên wan ve piştras dibûn. Her weha, nasnameya wan wendayan, çî caran bi cesedê wan re nînbû. Ji ber ku, li gor îfadeyên şahidên navveşartî û Binzet, kî/ê ku ji aliyê wan ve bihata ragirî kirin, çend rojan îşkence

lê hat kirin. Li devera Kurdan, ji Kurdan dihat xwestin ku, kî/ê alîkarî û palpiştiya gerîlayên PKK'yê dike, navên wan bête gotin, cihên wan bête diyar kirin. Kî/ê ku ev nekira lêpirsîn û îşkence car caran, li kawilka binê mala Kamîl Atak û Kukel Atak de li wan dihate kirin; kî/ê ku bihata înfaz kirin, piştî nasnameya wan teslîmî Cemal Temizöz dibû; ew kes ji aliyê komeke ji leşker û îtîrafkaran pêkhatî ve dihatin darizandin û bi çekên aîdî cendirmeyê na, bi keleşnikofan⁴⁴ ve dihatin kuştin. Kî/ê ku bihata înfaz kirin, an demildest dihatin veşartin, an jî cesedê wan li wê derê û li erdê dima. Înfaz li gundê, Basîskê ku ji aliyê ferasetê ve nêzî Hîzbûlahiyan bûn, pêk dihatin û bi hevkarîya wan ve ew înfaz dihatin kirin. Li gor îdianameyê, ew kom ji çawîşê pispor ê bi navê Yavuz, îtîrafkarên bi bernavê Bedran ê Adem Yakın û bernavê Tayfun ê Hidir Altuğ, Selim Xoce û du leşkerên ku bernavê wan Tuna bû, pêk dihat. Cerdevanên bi navê Kukel Atak û Temer Atak jî di lêpirsîn û înfazan de li gel wan kar dikirin. Cemal Temizöz û Kamîl Atak jî, serekê wê komê bûn, bi taybetî Cemal Temizöz biryar û destûra wan înfazan dida û piştî înfazan nasnameya wan kesan li cem wî kom dibûn. Li gor îdianameyê:

"(...) Di rûdawên li jor hatî diyar kirin de, ew kesên ku hatine ragirî kirin, ji aliyê heman kesan ve, bi texsiya Renault û spî hatine wergirtin, bi çekên keleşnikof û tebenceyê hatine kuştin, li heman cihê hatine înfaz kirin, piştî ku hatine kuştin, bi heman awayî, di bin kevîran de 8-10 cm xwelî avêtine ser û hatine veşartin, nasnameya wan li cem wan nînbûye û bi gellek aliyan ve dişibin hevdu.

Her çend piştî kuştina van mirovan, gellek ewraqên vê rûdawê yê hiqûqî/dadî, bi biryara bêerkîyê/görevsizlik ji Serdozgeriya Cîmhûriyetê ya Amedê (DGM-Dadgeha Asayîşê ya Dewletê) re hatibe şandin jî, beyanên şahidê nediyar jî ve yekê piştras dike. Cihê vê rûdawê, wextê wê û

⁴⁴ Dîsa ev koma taybet a kontr-gerîla, bi taybetî ev înfazên xwe bi çekên aîdî fermandariya cendirmeyê na, nemaze bi çekên keleşnikofên gerîlayên PKK ên ku di şer de hatibûn kuştin dikirin. Di gotinên Cem Ersever û hinde îtîrafkaran de jî hatiye diyar kirin ku, ew çekên gerîlayan wekî 'çekên pis' dihatin binavkirin û piştî înfazên kontr-gerîla, ew çek li wir dihatin hiştin ku PKK tawanbar bibe, bnr.Yalçın, S.2003:144, Kılıç, E..2011:126.

mirovên ku navê wan derbas dibe, şêweyê kuştina mirovan, çekên ku mirov pê kuştine û encama gellek delîlên dîtir jî aşkîra dikin ku, heger kesek bi xwe di nav van şixulan de nebe, çi îmkân nîne ku di derbarê vê babetê de agahdar bibe. Her ji ber vê jî, beyan û eyanên şahidê nediyar ê bi navê SOKAK LAMBASI û TÜKENMEZ KALEM û şahidê bi navê Mehmet Nuri BİNZET, wekî beyanên rast hatiye hilsengandin,

Bi ser daxwaz û telîmata me, di derbarê kuştinên kiryarê nediyar ên li Cizîrê û di navbera salên 1990 û 2000'ê de, ji aliyê Sedozgeriya Cîmhûriyetê ya Cizîrê ve tabloyek hate amade kirin. Li gor wê tabloyê; di navbera salên 1993-1994 û 1995'an de behsa 48 dosyeyên kuştinên kiryarê nediyar hatine kirin, lêbelê di navbera salên 1996 û 1997'ê de bi tenê 7 dosyeyên kuştinên kiryarê nediyar hatine tespît kirin û ev balkêş e,

Her weha, piştî van hilsengandinan, bi pêşengiya gumanbar Cemal TEMİZÖZ, ji sala 1993'ê vir ve, li navçeya Cizîrê, rêxistineke sûc hatiye avakirin, mensûbên vê rêxistinê bi daxwaza gumanbar Cemil TEMİZÖZ gellek kes bi qestî kuştine û gellek şixulên der qanûnî kirine, di dema emelê vê rêxistinê de dewletê jî, bi armanca têkoşîna bi terorê re alîkariya wan kiriye û di delîlan de ev diyar bûye, (...)⁴⁵

Roleke cerdevan û îtîrafkaran a taybet heye di nav vê ekîbê de: ew, kuştina mirovên deverê lokalîze dikin, pêwendiyên li deverê, awayê civakê û agahdariyên di derbarê civakê de bi awayekî rêkûpêk, ji bo çalakîyên kontr-gerîla neqlî wan dikin. Îtîrafkar, bi taybetî di derbarê tevgera PKK'yê de xwedî rol û mîsyonekê ne: Tevgera PKK'yê li ser çi esasan pêwendiyên xwe durist dike, di nav tevgerê de kî/ê xwediye çi rolê ye, milîsên PKK'yê di nav bajaran de çawa tînanaskirin, pêwendiya di navbera gund û bajaran de bi çi awayî û ji aliyê kî/ê ve tînanaskirin? Ev agahî ji aliyê îtîrafkarên ku xwedî tecrûbeyên PKK'yê ne hatine wergirtin. Rola cerdevanan jî bêhtir avakirina pêwendiyên nav-eşîrî ya ku ji bo bizavên

⁴⁵ Îdînameya Temîzöz û yê din, r, 79. Ev jêgir, ji metna îdînameyê hatiye wergirtin.

kont-gerîla wekî sûdwar dihat qebûl kirin, bû. Bi saya wan, dewletê bi malbatên Kurd re pêwendî datinî, nakokî û xisûmetên di nav eşîrên Kurd de peyda dibûn, ji bo stratejiya şer, bi kar dianî. Her weha ji bilî van, bi saya serê wan, hîn dibû ku gelo kîjan eşîr û malbatên Kurd, bi PKK'yê re eleqeder in, kîjan ji wan palpiştiya PKK'yê dikin û ew malbatên Kurd tesnîf dikirin.⁴⁶ Lêbelê ev lokalîze kirina mekanîzmaya kuştina mirovan, ji van tiştan zêdetir û wêdatir bû: bi saya serê vê mekanîzmayê, pêwendiyên di navbera Kurdan de dihat kontrol kirin, struktura demografyaya cihê Kurdan û encamên wê yê siyasî dihatin zanîn û xisûmeta di navbera eşîr û binemalên Kurd de, ji aliyê wê ekîbê ve dihat bi kar anîn. Wekî din kar û kiryarên wê ekîbê wekî fiilên hêzên lokal dihatin destnîşankirin. Bi van parametreyan, siyaseta herêmê, bi kuştina mirovên Kurd ve aîdî kesên wê deverê dibûn.

Axaftinên xizmên wendayan, dê li jêr bêhtir bihêne gengeşe kirin, lêbelê em dikarin niha ev qasî bibêjin: hem derbirrînên îtîrafkaran ên ku di çapemeniyê de jî diyar bûne, hem jî derbirrînên şahidên dosyaya Temîzöz û yê din, axaftinên xizmên mirovên ku hatine wendakirin, piştras û teyîd dikin. Di salên 90'î de, bi taybetî jî li devera OHAL'ê û bi stratejiya şerê sivik, tîmên kontr-gerîlayê li Şirnexê gellek kes kuştin û ew der wêran kir. Li mînakên cihanê yê ku şerê navxwe û şerê etnîk jê peyda bûne jî aşkîra ye ku, ev veguherîna civakî û cihûwarê, bi awayekî rêkûpêk, bi kuştinê, bi îşkence û tundiyê pêkan dibe. Wêrankirina cihûwarekî, bi tenê bi şideta fizîkî pêk nayê, her weha şideta fizîkî emelê destpêkê ye û girîng e. Lêbelê dema ku em li polîtîkayên dewleta Endonezyayê ya ku li dijî demografyaya Tîmora Rojhilat dinihêrin, aşkîra ye ku wêrankirina cihûwar, di nav xwe de xwedî maneyeke ji van zêdetir dihevine. Her weha taktîk û rêwaza sereke, kuştina mirovan û avakirina repertûareke kuştinê û şideta fizîkî ye. Taktîk û rêwaza duyem jî şideta sembolîk e ku, bi vê rêwazê, dewlet, hemû praktîk, sembol, ziman û rêxistinê dixwaze ku bi gelemperî tarûmar bike. Bi taybetî ev yek, ji uslûba dewletê

⁴⁶ Balta Paker, E.; Akça, İ., 2013:13.

ya ku di darizandina mirovan û kampanyayên leşkerî de jî xwe diyar dike. Ya sêyem jî taktîka 'şeytanîkirina dijmin' e. Bi vê taktîkê dewlet bi kîjan rêxistinê re şer û pevçûnê bike, wê rêxistinê her û her bi referansên xerab tawanbar dike û hemû kar û kiryarên xwe yê der qanûnî bi van referansên şeytanî meşrû dike. Taktîka dawî jî, koçberkirin û koçreviyê ku, bi vê stratejiyê dewlet bi kîjan rêxistinê re şer bike, nifûsa wê deverê bi vî awayî kontrol dike û li gor polîtîkayên xwe vediguherîne.⁴⁷ Şernex jî bi vî awayî ji aliyê akterên dewletê ve, bi van rê û taktîkan hatiye wêrankirin.

47 Aditjondro, G.J. "Ninjas, Nanggalas, Monuments, and Mossad Manuals: An Antropology of Indonesian State Terror in East Timor", 2000:176

VI.

ENCAMÊM LÊKOLÎNA

QADÊ

Me li Şernex û Stenbolê di derbarê 69 wendakirinan de, bi 86 xizmên wendayan re, bi giregirên Kurdan re, bi aktîvîstên mafê mirovan û parêzeran re hevpeyvîn pêk anî û em dê encamên wan hevpeyvînan, li jêr bi du beşan parve bikin. Em dê di beşa yekem de, repertûara dewletê ya wendakirinan û rê û taktîkên dewletê yên vê stratejiyê, bi alîkariya wan hevpeyvînan terîf bikin. Di vê beşê de, em dê pêşiyê di derbarê gengeşeyên vê polîtîkaya dewletê bikin, piştê jî yek û yek li ser teknîkên wendakirinan rawestin.⁴⁸ Di beşa duyem de jî, em dê tecrûbeyên xizmên wendayan, ên berî wendakirin û piştî wendakirinan û encamên wan gengeşe bikin. Her du beş jî, bi taybetî li ser gotin û derbirînên xizmên wendayan hatine terîf kirin. Bêguman ku şîrovekirina hevpeyvînan di derbarê wendakirinan de, bûye egera gellek arîşeyên epîstemolojîk. Ji ber ku ev tecrûbe ji bo xizmên wendayan babeteke hestî bû çî caran telafiyên xetayan pêkan nînbû, me her hewl da ku ji xeletiyên dûr bikevin û van tecrûbeyan bi rêkûpêk gengeşe bikin. Her weha ji ber ku hevpeyvîn bi zimanî Kurdî/Kurmançî pêk hat û dema ku me ew wergerandin Tirkî, hinde arîşeyên îfadeyê jî peyda bûn. Werger, bi serê xwe jî arîşeyên etîkî û epîstemolojîk dihewîne û babetê dixê formeke serdestiyê.⁴⁹ Lêbelê bi salan e ku, ev babetên 'lihevhatina/hesabpîrsîna ji rûdawên rabirdûyê' û xebatên li ser hefizyê/bîrgehê gellek têne gengeşe kirin. Ev gengeşe hîn jî berdewam dikin û ev xebat van arîşeyên curbicur bi tenê çareser nake. Her ji ber wê, ev rapora me, dizane ku ev babet ji atmosfereke tevlihev peyda dibin û pêşniyaz dike ku hemû kategorî, tehlîl û labîrentên stratejiya praktîkên wendakirinê, li ser esasên mekan an cih bête hilsengandin.

48 Ji ber ku me di raporta xwe ya ji aliyê Navenda Bîrgehê hatibû hilsengandin a ku bi navê (*Zorla Kaybetmeler ve Yargının Tutumu*) de behsa van teknîkan û sûcdarên ku di van fiilan de ceza nexwaribûn û biryara demboriyê/zamanaşımı kiribû, em dê di vê xebatê li ser wan babetan nerawestin.

49 Povinelli, E. "Radical Worlds: the Anthropology of Incommensurability and Inconceivability." 2001:327.

A) Repertûara Dewletê

Ya Wendakirinê

Berî her tiştî divêt em terîfa xwe ya di derbarê têgeha dewletê aşkira bikin. Di lîteratûra zanist û ilmên civakî de, ev bîst sal in ku, di derbarê antropolojî û wesfa dewletê de xebatên ku bi çarçoveya dîrokî û sosyolojîk hatine kirin, destnîşan dikin ku, dewlet; wekî tegehekê di kar û kiryarên xwe de, xwedî însîcam û kompozîsyonekê nîne û her yekîneyên ku dewletê pêk tînin jî, vê yekê piştras dikin. Ji bilî wê, ew saziyên ku dewletê pêk tînin, bi xwe wekî stûkturekê ji hev cuda ne û bizavên wan saziyan jî nemaze paradoksên esasî dihewinîn. Di nav sîstema dewletê de, akterên xwedî paye, prosesên curbicur ava dikin û ew jî ne yekpare ne û di kar û kiryarên wan de jî dubendiyên mezin peyda dibin. Ev pratîk, geh ji fiîlên madî û geh jî ji îmaj û nirxên sembolîk pêk tên. Her weha, di navbera yekîneyên dewletê yên navendî û yên lokal de rageşî/nakokî hene.⁵⁰

Ev nakokî di xebatên ku di derbarê 'binpêkirina mafên mirovan' hatine kirin de dîjî hene. Bo nimûne, Gökçen Alpkaya yek ji egerên stratejiya wendakirinê dispêre faktera 'bêseriyê'. Di nav pratîkan de daneyên plan û koordînasoyoneke aşkira zêde nînin, lêbelê berovajî vê, gellek daneyên kêyîfî û bêserûberiyê hebûn.⁵¹ Di derbarê wendakirinan de na, lêbelê di derbarê pratîkên asayîşê yên salên 90'an de, diyar e ku nakokiyên navend û lokalê her aşkira ne.⁵² Di vir de tiştê balkêş ew e ku, binpêkirina mafê mirovan ê sîstematîk û stratejiya şerê taybet, li gor

⁵⁰ Di derbarê vê babetê de, bo gengeşeyeke berfirehtir bnr. Thomas Blom Hansen û Finn Stepputat (berhevkar). *Sovereign Bodies: Citizens, Migrants and States in the Postcolonial World*, Princeton University Press, Princeton ve Oxford, 2005; Aradhana Sharma û Akhil Gupta (berhevkar). *The Anthropology of the State - A Reader*, Blackwell Publishing, Padstow, Cornwall, Great Britain, 2006; Thomas Blom Hansen û Finn Stepputat (berhevkar). *States of Imagination, Ethnographic Explorations of the Postcolonial State*, Duke University Press, USA, 2001.

⁵¹ Alpkaya, G. "Kayıplarımız", 2009:102.

⁵² Balta Paker, E.; Akça, İ., 2013:12

fermanên navendê na, li gor daxwaza yekîneyên lokal hatiye pê.

Lêbelê, çalakiyên bi vî rengî, di rastiyê de, ji bilî prosesên kêyîfî, 'bêserîti' û bi fermannameyan na, wekî bizaveke emprovîzasyonê pêk tê. Her weha çalakiyên kontr-gerîlayê, bi taybetî, ji îşkenceya sîstematîk, înfazên sîvîl, wendakirin û zordariyeke ku xwe dispêre kêyîfîtiyê pêk tê û nemaze jî bi înisyatîfa herêmî tê kirin. Çalakiyên bi vî rengî, her çend ji aliyê navenda dewletê ve bête teswîr kirin jî, her û her di navbera îcrakar û teswîrkaran de nakokiyên esasî rû didin. Tanıl Bora jî destnîşan dike ku, di nimûneya faşîzma Almanan a ku ev nakokî lê pirr kêmbûn de jî, heman tişt rûdabû. Û dîsa balê dikêşe ser "di navbera hêzên ku rewşa awarte pêk tînin û bingeha hikumraniya dewletê durist dikin û ew dînamîkên ku vê teswîrê pratîze dikin de nakokî û pevketinek heye."⁵³ Her ji ber wê, di navbera wê rêxistina ku mirov li kuçeyan dikuştin a SA û saziyên navenda dewleta Almanan de nakokî hebûn. Ji ber wê jî, li gor saziyên dewleta Almanan, divêt SA ji bêdîsîplînî û kar û kiryarên ku dê siyaseta dewletê û aboriyê bêistîqrar bike, ji dûr bikeve.⁵⁴ Dîsa Arendtê ku li ser faşîzma Almanan nivîsîbû, destnîşan dike ku, di navbera mekanîzmaya dewletê ya ji gelek yekîneyan pêk tê, anku di navbera saziyên navendî û lokal de nakokiyên burokratîk hene. Her weha Arendt balê dikêşe ser berberiya di navbera wan akteran.⁵⁵

Her weha, ev bêserîti, kar û kiryarê çalakiyên kontr gerîlayê bi xwe ye. Wekî ku bêjedarekî gotî, divêt mirov van înisyatîfên herêmî û saziyên dewletê yên merkezî wekî hevdu hilsengîne: Li vir, ew 'konseptê' ku ji navendê hatiye tewsîr kirin û 'xweseriya' li herêmê hatiye îcrakirin, di nav hevdu de ne. Li aliyekî, 'hakimiyeta qadê' û encamên wê, bo têkbirina palpiştiya ku xelkê dida PKK'yê hatiye tetbîqkirin. Ji bo vê yekê her kar û emelê der qanûnî, wekî meşrû dihat qebûl kirin.

⁵³ Bora, T. *Türkiye'nin Linç Rejimi*, 2008:33.

⁵⁴ Bora, T. 2008:34

⁵⁵ Arendt, H. *Kötülüğün Sıradanlığı-Adolf Eichmann Kudüs'te*, 2012:81.

Li aliyekî din jî, her şêwe û terzeke ekîbên ku li devera Kurdistan kar dikirin û pêwendiyên wan ên herêmî hebûn. Bo nimûne ekîba Şernexê, ji ber ku bajar nêzî sînora Xêbûrê ye, dil dikir ku serdestiya bazirganiya Xêbûrê jî bike. An jî, Kamil Atak û ekîba cerdevanan ên din, arîşeyên xwe yê bi xismên xwe re jî, li dor stratejiya şerê taybet safî dikirin.

Wendakirina Abdullah Efelti, nimûneyeke bi vî rengî ye. Hem di hevpeyvînekê de, hem jî di îdînameya Temizöz de li gor îfadeyên şahidan, ji ber ku Cemal Temizöz û Kamil Atak nexwestine Abdullah Efelti zeviyekê biajo, lewre hatiye wendakirin. Ew zevî ya Salih Şik bu ku, wî jî dixwest bibe namzetê şaredariyê, lêbelê ji ber ku Kamil Atak bibû namzet, wî destê xwe ji namzetiyê kişandibû.⁵⁶ Li gor derberrînên kurrê Şik, Cemal Temizöz pêşiyê gef lê kiriye û gotiye "heger tu dest ji namzetiyê nekêşî, ez dê kurr an biraziyê te bikujim" û piştê jî ew dest jê dikêşe. Kurrê Şik, ev tişt gotin: "Piştî vê rûdawê, dijminahiya Serdar Cemil zêdetir bû, wî gef li me kirin ku em zeviya xwe neajon, ji me re got ku 'heger hûn zeviyê biajon, ez dê bi hincetekê bi panzeran zeviya we û debr û berê we bişewitînim', ji bilî wê, me wê demê du heb avahiyên xwe yê li Enqereyê firot û pê motora avê kirî, lêbelê ew hate dizîn, ihtîmalen Serdar Cemal ew dizîbûn. Me ew sal zeviya xwe neajot û zevî vala ma. Sala piştê, me wekî demane ew da Abdullah Efelti, wî jî piştî ku ew demane kir, hate cem me û ji me re got ku 'Serdar Cemal gefan li min dike ku ez erd û zeviyê neajom, ez nizanim ez

⁵⁶ Kamil Atak beriya hilbijartinên herêmî ya 27'ê Adara 1994'ê namzetê Partiya Riya Rast (DYP-Doğru Yol Partisi) bû. Wî mehek beriya hilbijartinê serî li Gerîndeya Perwerdeya Netewî dabû. Wî du kes girtibûn ku, bibin şahidê wî ku dibistana seretayî xwendiyê, lê wî dibistan nexwendibû û belgeyên wî tinebûn. Di hilbijartinê de ew bû şaredar, lê ew piştê ji Partiya Riya Rast veqetî û di Partiya Refahê, Partiya Anavatanê, û Partiya Tevgera Neteweperest de kar kir. Di hilbijartina 18'ê Avrêla 1999'ê de careke din wekî şaredar hate hilbijartin. Piştî hilbijartinan, di çapemeniyê de nûçeyeke di derbarê wî ye ku li Wanê û ji kuştina 2 şivanan tawanbar dibû, hate weşandin. Piştî vê yekê wî Cizîr terikand û Di Dadgeha Cezayê Giran a Wanê de hate darizandin. Di dema darizandinê de, hate ispat kirin ku Atak dibistan nexwendiyê û şaredariya wî hate betal kirin û li Cizîrê hilbijartin jinûve hatin kirin. bnr. "Devletin derebeyi: Korucu Kamil Atak" Birgün, 19'ê Adara 2009

dê çi bikim."⁵⁷ Ew kesên ku em pê re axifin, weha digotin:

*"Her sal li vir, di 3 hezar donimê û nav avê de pembû diajotin. Nehîşt em wir jî biajon. Abdullah Efelti hebu, wî dixwest ku wê derê bike zevî, lê wî nehîşt û mêrik jî li wir kuşt. Yanî got ez nahêlim tu vir biajoyî. 3 hezar donim ne erdekî biçûk e, 3 hezar. Heger tu 3 hezar donimê biajoyî gellek pere jê tê. Ê mêrik çû ew da îcareyê. Yaw mêrikî got min ev der daye îcareyê. Li vir gellek zirara min çêbû. Gerê min biajota, bo ewkê zar û zêçê min. Lê ji min re got na, tu nikarî vê derê biajoyî. Cemal Temizöz baheneyek dît û got, ev der sînorê Suriyeyê ye ezbenî, li vir gellek çûyîn û hatin çê dibe. Ew bahane ne! Beriya wê jî zevî dihat ajotin, piştî wî jî. Ma bi tenê wî çaxî nayê ajotin! Bi ser de jî ew mêrik kuşt."*⁵⁸

Ew konseptê ku ji navendê dihate plankirin û ji aliyê yekîneyên 'serbixwe', dihat pêkanîn. Li Şernexê jî, ji aliyê hemû nûnerên dewletê ve dihat tetbîq kirin. Ew çarçoveya ku li jor hate diyar kirin, tecrûbeyên Şernexê yek û yek destnîşan dikin. Ev tecrûbe, geh îrtîcalen geş bûye, geh bûye sedema dijminahiya şexsî, geh jî bi têra xwe, înnisîyatîfêke lokal dihewîne di nav xwe de, lêbelê; ji xwe ew konseptê re li ber hemû kar û kiryarên bi vî rengî vedikir. Ji xwe ya rast "Dewlet hevalê Kamîl Atak bû"⁵⁹

1) Înkâr kirin

Nûner û sazîyên dewletê yê ku stratejiya wendakirinê pêk anîbûn, di derbarê veşartina van kar û emelên xwe de, xwedî yek helwestê bûn: înkâr kirin. Ev helwesta dewletê bi gotinên serokwezîrê Tirk Süleyman Demirel aşkire bûye. Wê demê xizmekî/e wendayan jê xwestibû ku ew kesê ku hatiye wendakirin bibîne, jê re gotibû "Ma zarokê te di berîka min de ye ku ez wî derxim bidim te?"⁶⁰

Ev helwesta dewletê ya navendî, ji aliyê nûnerên

⁵⁷ Temizöz ve Diğertleri İddianamesi, 2009: 30.

⁵⁸ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

⁵⁹ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 03.09.2012

⁶⁰ Neql ji Alpkaya, G., 1995:56

wê yên heremî ve jî hatiye pejirandin. Gellek kes bi awayekî aşkîra ji aliyê hêzên asayîş û cendirmeyê ve hatine ragirî kirin, lêbelê dîsa jî ji aliyê rayedarên wan ve hatiye înkâr kirin. Ev yek teybetmendîya tecrûbeyên Şernexê ya esasî ye. Li Silopiyayê gundê Xezayiyê di şevêkê de sê kes hatin wendakirin, lêbelê wendakirina wan hate înkâr kirin. Du bira û mixtarê gund Mehmet Fındık û Ömer Fındık û pismamê wan Ömer Kartal di şeva sersala 31'ê Berfanbara 1995'ê de ji leşkerên ku elok jê xwestibûn re, bi erebeya xwe elok birin Qereqola Navendê ya Silopiyayê. Lêbelê paşê venegerîn malên xwe. Xizm û nasên wan piştî wê, mereq dikin û diçin qereqola cendirmeyê, lêbelê ji qereqolê jê re dibêjin, ew çûne asayîşê/emniyetê. Malbata wan diçin asayîşê jî, lêbelê ji wan re dibêjin her sê kes 10 deqîqe berî niha ji avahiya asayîşê derketine. Mehmet Kartal di derbarê vê rûdawê de weha dibêje:

*"Em pêşiyê çûn ber qereqola cendirmeyê, piştê jî çûn asayîşê. Me xwest ku em nasên xwe bibînin, lê ji me re gotin, ew ne li vir in û nehatine vir. Paşê gotin 'deh deqîqe berî niha ji vir çûn' me ji wan re got, 'ev deh deqîqe tine ku em hatine û me ew di rê de nedîtin,' (...) çimkî em di deh deqîqeyan de çûn gund û vegeerîn, lêbelê me çî kes nedît, nehatibûn gund. Ew mirov wenda bibûn."*⁶¹

Nimûneyeke din jî di 26'ê Pûşbera 1994'ê de li Silopiyayê hatibû serê Musa Zeyrek. Ew bi daxwaza fermanîdar serpel Kenan Topçu, li gel kekê xwe Îslam Zeyrek çû Liqa Cendirmeyê Sînorê Xêbûr. Serpel Kenan, piştî îfadeya her du birayan wergirt, ji wan re got, fermanîdar û mêvanên wî yên bîn, heger ew wan her du birayan bi rûniştî bibînin dê hêrs bin û divêt her du bira di odeyên cuda bîn darizandin. Piştî vê rûdawê Îslam Zeyrek weha got:

"Divêt hûn her du herin odeyekê, li cem hevdu nebin. Ode jî li nik hevdu bûne. Deriyê wan odeyan jî li rex hevdu bûn. Min birin odeyêke din. Serdeste/ Onbaşı derî qefil nekir û bi ser min de girt. Min li saeta xwe nihêrî û ez tam 6 deqîqeyan di wê odeyê de mam. Piştî ku nebû heft deqîqe, min derî hêdîka

⁶¹ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

*vekir û got 'hela ez li birayê xwe binihêrim, yaw wî ez li vir hiştim û çû, gelo çûye kêderê, em li vir çî dikin'. Min nihêrî deriyê odeya ku birayê min lê dima, vekirî bû, lê ew tê de nînbû. Birayê min li vir nînbû. Di nav şeş deqîqeyan de. Ne dengê erebeyekê hat, ne dengê mirovekî. Ne kesî hûn pirs dikirin, ne kesî got 'em ji bo van sûcan we digrin' ji wê rojê heta niha aqûbeta birayê min nayê zanîn."*⁶²

Hinde xizm û nasên wendayan dibêjin ku em gellek caran çûn qereqolê û xisûsî jî çûn def Cemal Temizöz. Lêbelê, her car heman tiştî ji wan re dibêjin, çî tiştî di derbarê xizmên wan de, ji wan re nabêjin. Dîsa di îdînameya Temizöz de, Cemal Temizöz û ekîba darizandinê, bi taybetî jî di derbarê ew wendayên ku cesedê wan hatine dîtin de weha îfadeyê dide, "Di şerê PKK'yê de hatine kuştin. Her weha di van nimûneyan de jî diyar e ku, înkarkirin, wekî stratejiyekê ji aliyê navenda dewletê û nûnerên wê yên heremî ve wekî armancekê hatiye dîtin. Bi taybetî jî, mexsûs li pey aqûbeta wendayan ketin lê tim û tim her tiştê di derbarê wan de jî înkarkirin. Ev jî nîşaneyê vê stratejiyê, ya sistematîk e. Wan bi awayekî aşkîra ji bo kesên ku ragirî kirine, her tim gotine 'ew hatine berdan' û ji xizm û nasên wan re jî gotine, ew ji vir derketine û çûne. Gellek ji wan mirovên ku hatine wendakirin, an bi ser malên wan de hatine girtin û ji cem malbata wan hatine wergirtin, an ji kuçeyan, dikan û nava gund de hatine girtin û an jî li ber çavên herkesî hatine ragirî kirin. Ev yek tiştêkî pîrr girîng ê wendakirinê destnîşan dike: Tîma darizandinê xwedî wê hêzê ye ku, hem dikare herkesî li ber çavên herkesî ragirî bike û hem jî dikare wî înkâr bike.

2) Gefxwarin

Teqrîben hemû xizmên wendayan ên li Şernexê ji rayedarên dewletê gefxwarine û hatine tirsandin. Ew kesên ku me li Şernexê pê re hevpeyvîn kir, hemûyan jî ji bo wê ekîba darizandinê ya ku di îdînameya Temizöz de jî derbas dibe digot: "Tîm", "Tîmê Taybet" an jî "JÎTEM". Bêjedarî digot ku hema hema hemû xizmên wendayan ji aliyê Cemal Temizöz û Kamil Atak ve hatine

⁶² Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

tehdîtkirin û tirsandin. Hemû bêjedar jî hatibûn tehdîtkirin. Bi gotina Şevkiye Arslan 'tîmên taybet' mêrê wî yê Îhsan Arslan, serê sibehê ji mala wî werdigirin. Ew li pey mêrê xwe dikeve û mêrê wê Îhsan Arslan û yekî din ê bi navê Ali Karagöz bi hev ve tînan girêdan û tîmên taybet her duyan jî dibin û dixin holika binê mala Kamil Atak. Ew du caran diçe pirsra mêrê xwe dike û piştî ku cara duyem diçe jê re van tiştan dibêjin:

*"Ez dîsa çûm, hat li wir rûnişt. Min jê re got 'Xalê Kamil, ez ketime tor û bextê te tu bi xêra Xwedê Îhsan berdî. Ji min re got 'here, Welleh û Billeh heger tu saetekê jî li vir bisekinî ez dê te bikujim.' Beriya wê jî xwarin anibûn û jê re jî gotibûn 'were em bi hev re bixwin.' Min wesa got, wî jî got gava ku tu saetekê jî li vir bimînî ez dê te bikujim."*⁶³

Şêweyê gefxwarina xizmên wendayan ê tîpîk 'kuştin' e. Car caran xizmên wendayan bi kuştinê hatine tirsandin û ew kesên ku hatine kuştin jî bi awayekî aşkira hatine îfade kirin. Her weha înkâr dibe înkâr û xizmên wendayan jî bi kuştinê tînan tehdîtkirin. Atike Tanrıverdi, bi mêrê xwe Abdulhekîm Tanrıverdi re, li gundê Basîskê, ku hatibû valakirin û paşê bibû gundê Hîzbûllahê dima. Sibeha 9'a Avrêla 1993'ê mêrê wê, ji aliyê tîmên taybet ve tê ragirî kirin. Ji ber ku ew ji tîman ditirsîn û deriyê xwe venakin. Leşker ji bo ku derî bidin vekirin, bi tehdîta ku bombeyan biavêjin mala wan derî didin vekirin. Piştî wê Abdulhekîm Tanrıverdi tê ragirî kirin û deh roj şûnda jî li ser rîya Hezexê destê wî bi girêdayî laşê wî jî îşkence lêkirî tê dîtin. Piştî ku cesedê wî tê dîtin, mixtarê gund bo lêpîrsîna vê rûdawê diçe qereqola cendirmeyê û jê re dibêjin 'me ew kuştîye, hûnê çî bikin, êdî li wî negerin, me ew kuştîye. Wê demê Cemal Temizöz wezîfedar bû, lêbelê kiryar ew bi xwe nînbû û kesekî bi ritbe yê din bû.⁶⁴ Li Hezexê, di 8'ê Avrêla 1992'ê de Nezîr Acar hate wendakirin. Bavê Nezîr, Xelîl Acar, ji bo ku aqûbeta kurrê xwe bipirse çû gurdana/tabûra cendirmeyê, lêbelê li wê derê êdî leşkerekî serpel/yüzbaşı bû, serdar/binbaşı bû nediyar bû, jê re gotibûn "Welleh me çawa ku kurrê te kuşt,

⁶³ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 03.09.2012

⁶⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 13.10.2012

em dê te jî wesa bikujin."⁶⁵ Dîsa li Cizîrê, di Avrêla 1994'ê de, li pasajekê û dikaneke elektîkvanekî, Ahmet Bulmuş hate ragirî kirin. Piştî ku ew hate ragirî kirin Cemal Temizöz hate mala wan û ji wan re got "Mêrê te li cem me ye, mêvanê me ye, em dê çend roj şûnda wî berdin."⁶⁶

Çawa ku ev tişt dihatin înkarkirin, xizm û nasên wendayan jî ji aliyê rayedaran ve, bi hinceta ku heger biçin dadgehên jî hatin tehdîtkirin. Ev taktîkeke înkâr kirinê ye. Îfadeyên xizmên wendayan jî destnîşan dikin ku, xizmên wendayan geh ji aliyê Kamil Atak ve, geh ji aliyê îtîrafkar Bedran û Tayfûn û geh jî leşkerên bi ritbe yê li qereqola cendirmeyê û xîsûsî jî Cemal Temizöz, xizmên wendayan jî bi wendakirinê tehdît kirine.

Her weha rayedarên dewletê yê li Şernexê, bi tenê wendakirinê înkâr nakin, wekî din, car caran kar û kiryarên xwe qebûl kirine. Înkarkirin û tehdîtkirin, ji bo pêkanîna stratejiya wendakirinê, du teknîk û rêbazên girîng in. Her du jî wendakirineke serdestiyê destnîşan dikin. Di her du halê de jî, norm û krîterên qanûnî hatine pêpes kirin, înisyatîfa kuştin û nekuştinê di destê tîman de bûne. Piştî jî dîsa parvekirin an veşartina vê yekê jî di destê wan de bûye. Her weha, hem di derbarê van rûdawan de, çî tişt nehatiye gotin, hem jî destnîşankirineke balkêş a di derbarê kuştinan de heye. Li ber çavên herkesî gef li mirovan hatin kirin, xizmên wendayan jî bi wendakirin û kuştinê hatin tirsandin, li meydana gundan, îşkence li gundiyan hatin kirin, ew xizmên wendayan ên ku bo pîrsîna aqûbeta nasên xwe çûne qereqolan, hatine qewirandin, elektrîka wan bi ser wan de hate birîn û gule bi ser wan de hate barandin. Şanedanî û sirên dewletê di nav hevdu de bûn; her du jî bi awayên cuda, lêbelê heman tiştî îzeh dikin: ekîba tîman, zordestî û desthilatîya jiyana mirovan, dikir.

3)Krimînalîzekirin

Krimînalîzasyon, bi tenê ne li Tirkiyeyê, li hemû welatên ku wendakirin lê pêk hatiye, ji bo

⁶⁵ Hevpeyvîn: Şernex-Hezex / 01.12.2012

⁶⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 12.10.2012

meşrûkirina wendakirinê wekî teknîkekê hatiye tecrûbe kirin. Bo nimûne, li Arjantînê meşrû kirina wendakirinan, bi dîskûrên tehdîta derveyî û navxwe hatiye formule kirin.⁶⁷ Li Şernexê, ji bo meşrûkirina wendakirinan, ekîba darizandinê her tim mirovên wendabûyî, bi milîsiya PKK'yê ve eleqeder kirine. Di hevpeyvînen me de, ekîba Şerê Taybet, her û her mirovên ku wendakirine bi milîsiya PKK'yê sûcdar kirine. Roja 13'ê Gelawêja 1994'ê, li gundê Basanê yê bi navê Finda Botanê, Ahmet Özer, Ahmet Özdemir, Bahri Esenboğa, İlhan İbak, Fikri Şen û Mehmet Duyan⁶⁸ bi helikopterekê hatin siwar kirin û piştê hatin wendakirin. Ew hemû bi bahaneya milîsiya PKK'yê hatin ragirî kirin. Ahmet Özdemir jî ji nav wan e û çavên wî nabînin, ew jî bi bahaneya milîsiya PKK'yê ji mala xwe tê wergirtin. Bavê İlhan İbak, İsmet İbak di derbarê babetê de weha dibêje:

"Ji bo wan digotin 'ew milîs in milîs, milîsên PKK'yê ne'(...) Belê ew hatin, saet 6'ê êvarê bû. Leşker hatin ber nîzamiyeyê, ber mala fermanîdar. Ew girtin, me ji wan re got 'hûn çî dikin û çîma digirin.' Wan ji me re gotin 'ew PKK'yî ne.' Ew bi xwe re birin û sê şevan jî bernedan. Cihê wan çal bû, xistibûn wir, lê servekiribûn. Betaniye xistibûn binê wî. Bi roj dikaribû were cem me. Roja çaremîn ew siwarî helikopterî kirin û birin gundê Finda Botan. Ew birin û me êdî çî agahî jê negirt. (...) Me hîn jî ew nedîtiye. Ji me re gotin 'emê bibin û îfadeya wî werbigirin.' Me got 'dê wesa bibe.' Ew birin û hey Xwedêyo, em hîn wî dibînin, hîn dibînin û hîn dibînin..."⁶⁹

Ji bilî tawanbariya milîsiyê, hinceta ragirîkirinê ya duyem jî qaşo ew mirov, çalakiyên siyasî bo PKK'yê dikin, û palpiştiya lojîstîkê ji tevgerê re dikin. Car caran jî ew kes qaşo destgiriya xortan dikin ku ew biçin tevlî hereketa PKK'yê bibin. Ew kesên ku hatibûn wendakirin, bi wan mebest û hincetan hatin wergirtin. Her weha bi vê yekê tiştê ku dixwazin bidin zanîn, qaşo ew

67 İpekyüz, N. "Arjantin'de Politik Şiddet ve Travma", 2009: 107.

68 Ji vê komê, bi tenê Mehmet Dayan piştî ku 35 rojan girtî dimîne, tê berdan.

69 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 12.10.2012

kesên hatine wendakirin, ne 'mîrovên bêguneh in', eleqeya wan bi PKK'yê re heye û tiştên ku hatine serê wan, bo wan mustehaq e. Wekî din tawanbarkirina wan mirovan a bi PKK'yê re, paşê jî bo aqûbeta mirovên wendakirî, ji bo failan jî pîrr sûdwar bûye. Li gor îfadeya birayê Kamil Atak, Mehmet Nuri Binzet ê di îdîanameya Temizöz de qise kiribû, dema ku di sala 1987'ê de Kamil Atak ji aliyê Cem Ersever⁷⁰ ve hatibû qanî kirin, wî di derbarê tevgera PKK'yê de weha gotibû: "Em hereketa PKK'yê weha qebûl bikin: Yek, gerîlayê PKK'yî yê ku çek û sîleh wergirtiye û çûye çiyayan, mirov nizane gelo ew kî/ê ye an kî/ê nîne. Ji sedî 90'î ew tên zanîn. Navê wan di arşîvên dewletê de veşartîne. Ya din, gerîlayên bajaran in. Ya sêyem, milîsên PKK'yê ne. Milîs hem li çiyayan, hem jî li bajaran in. Paşê jî sempatîzan hene. Milet li vir dizane ku kî/ê çî ye. Kî/ê gerîla ye, kî/ê milîs e."⁷¹

Li gor tesnîfa Ersever, gellek mirov bi bahaneya 'milîs' an 'sempatîzan' hatin wendakirin. Di îdîanameya Temizöz de jî diyar e ku, ji nav wan kesên ku hatine wendakirin, ên ku cesedê wan nehatine dîtin, hatiye îdîa kirin ku "ew tevlî PKK'yê bûne" yên ku cesedê wan hatine dîtin jî, bi îdfaya ku "Di şerê bi PKK'yê re ji aliyê PKK'yîyan ve hatine kuştin." Li gor vê yekê îfade hatin wergirtin û zabitname bi vî rengî hatin nivîsandin û dosyayên înfaza sîvil bi vî rengî hatin manuple kirin.⁷² Eleqederiya bi PKK'yê re, li aliyekî, wendakirinê wekî fiîlekê meşrû destnîşan dike, can û cesedê wendayan û jiyana wan bêqedr û qîmet dike, li aliyekî din jî, dema ku aqûbeta wendayan tête pirsîn, merciyekê peyda dike. Her weha bi awayekî aşkîra an veşartî, kî/ê ku hatibû wendakirin, an bi milîsiyê hatibû tawanbar kirin, an jî pêwendiya wan bi PKK'yê hatibû danîn.

70 "Di sala 1987'ê de kekê min Kamil ATAK li devera Silopiyayê bi cendîrme Cem ERSEVER re hevdu dîtin. Cem ERSEVER jî kekê min û mezinên malê re got, hûn bibin cerdevan, çalakiyên PKK'yê li wan deran pîrr in, bi wan bitêkoşin. Ji ber wê yekê birayê minê Kamil û gellekê jî malbata me, bûn cerdevan û têkoşîne bi terorê de ji bo dewletê kar kirin." Îdîanameya Temizöz û yên din, r.7

71 Yalçın, S. 2003:57

72 Îdîanameya Temizöz û yên din, 2009: 8, 17, 35.

Teknîka krîmînalîze kirinê bi tenê ji bo wendayan nehatiye bikaranîn, her weha ji bo xizmên wendayan ên ku li pey aqûbeta wendayan ketî jî hatiye bikaranîn. Gellek kesên ku li pey aqûbeta xizmên xwe ketine, ji aliyê Cemal Temizöz, Kamil Atak û tîman ve hatine tehdîtîkirin. Ji bilî gef xwarinê, ew kesên ku li pey aqûbeta wendayan ketine, bi namzetê PKK'yê, sêmpatîzan û milîsiyê hatine tawanbarkirin. Vedat Bulmuşê kurrê Ahmet Bulmuş ê hatibû wendakirin, dibêje ku Cemal Temizöz û ekîba wî, çend roj piştî ku bavê wî hatibû wendakirin, ji bo li xaniyên wan bigerin hatin malê. Wextê ku hatin malê, pêşiyê bombeya destan avêtin mala wan piştî jî ji çepilê wan girtin û gotin "ev jî PKK'yî ne, ev jî terorîst in, van jî bibin û bikujin"⁷³ Gellek xizmên wendayan tînan ragirî kirin û tûşî muemeleyên nexweş tînan. Ji ber ku kurrê Ahmet Özdemir li pey aqûbeta bavê xwe ketibû, bi taybetî jî xwestibû laşê bavê xwe bibîne, tê ragirî kirin.⁷⁴ Yê tînan ragirî kirin jî her û her bi "alîkarî û palpiştiya PKK'yê" tînan tawanbarkirin.

Bêguman krîmînalîzekirin, bi tenê teknîkeke xerab nîne ku hatiye serê xizmên wendayan. Nimûneya trajedîk a ku hatibû serê xizmên wendayan, Ramazan Bilir e. Birayê Ramazan Bilir, İlhan Bilir, di sala 1992'ê de li Şernexê tê wendakirin. Her ji ber wê, Ramazan Bilir li pey aqûbeta birayê xwe dikeve. Xanima Ramazan Bilir, Güllü Bilir, ji bo wê demê weha dibêje:

"Weha, mesela mirovan pirs dikir û digot, 'ka birayê min.' Herkes dimeşiya û li nasên xwe digeriyan. Ji Cizîrê heta Silopiyayê. Diçûn li her derê digeriyan da ku birayên xwe bibînin. Ji herkesî re digot, 'we birayê min dîtiye an na, hûn cihê wî dizanin.' Û ew li cihê xwe nedisekinî, li pey rê û şopa birayê xwe ketibû."⁷⁵

Ew sê salan li pey şopa aqûbeta birayê xwe ket û rojekê yek tê malê ji Ramazan Bilir re dibêje, "were em bi hev re heta Silopiyayê biçin, şixulê

⁷³ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 12.10.2012

⁷⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 02.09.2012

⁷⁵ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.09.2012

me heye, ez dizanim birayê te li kuderê ye, ez wî nîşanî te bikim." Ramazan Bilir, bi wî mîrikî re diçe diçe Silopiyayê û piştî ti caran çî xeber û agahî jê nehatiye standin. Ramazan Bilir li pey şopa aqûbeta birayê xwe ketibû, 3 sal piştî vê şopgerinê vê carê bi xwe di sala 1995'ê de hate wendakirin.⁷⁶

Heger em li gor agahiyên ku me ji dosyaya Temizöz û Yê Din hîn bûne û me bi hevpeyvînan ve jî piştras kiriye, bibêjin; îşkence li wan kesan kiribûn, lêdan xwaribûn û elektrîk dabûn laşê wan, cesedê wan hatibû şewitandin û jilêtkirin, hestiyên wan hatibûn şikandin. Di bedena wan de rêça zordariya dewletê hebû. Nîşaneyên desthilatiya dewletê, xwe di bedena mirovên di sîstema OHAL'ê (Rewşa Awarte) de kifşe dike.⁷⁷ Ji ber ku ew kes wekî PKK'yî tînan sêcdarkirin, îmhakirin û wendakirina wan, hem ji aliyê dewletê ve û hem jî rayedarên wê yê li devera Kurdan heman tiştî îfade dikin.

4) Pêkanîna Hevkariya Sazûmanî

Ji bo domandina stratejiya wendakirinê, hevkarîya di navbera sazîyên dewletê yê curbicur de pîr girîng e. Her weha, ji bo ku ev stratejî bête domandin, divê failên van sêcdan bihêne parastin û ji mûeyîdeyên qanûnî rizgar bin. Ji ber ku me bi ser navê Navenda Bîrgehê, di rapora xwe ya bi nabê *Wendakirin û Helwesta Dadgehê* de, li ser babeta sêcdarî û bêceziyê rawestînan, em dê li vir dîsa wê gengeşe nekin. Ji bo ku stratejiya wendakirinê bête domandin, divê nekeve rojeva cenahên curbicur, ku heger têkevê jî divê bi awayekî dezenformebûyî û cuda bê zanîn. Li vir rol û mîsyona herî girîng, a çapemeniyê ye. Her çend di çapemeniyê de hinde rojnamevanên li dijî vê nivîsîbûn peyda bibin jî, feraseta çapemeniya sereke/anaakim di vê meseleyê de wekî rola dewletê pêk hat.

Dîsa ji bo ku ev stratejî bête domandin, divê li dor behsa bizavên dewletê 'bêdengiyê zanistî' bê avakirin. Di salên 1990'an de li hemberî

⁷⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.09.2012

⁷⁷ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.09.2012

stratejiya wendakirinê, ji bilî çend îstîsnayan, akademiya Tirkîyeyê her bêdeng bû. Ji bilî hewldanên Komeleya Mafê Mirovan û Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyeyê û hinde raporên salane yên rêxistinên maf, çî eleqederiyeke sîvîl a derbarê vê babetê çênebû.⁷⁸ Dîsa divêt mirov destnîşan bike ku li ser vê babetê, ji bilî saziyên sîvîl û rêxistinên mafê mirovan, çî kesî û saziyê lêkolîn û berhemhînanî/(akademik bilgî ûretimi) pêk neanî. Her ji ber wê jî ev stratejiya dewletê bi helwesta cenahên curbicur ên sîvîl û fermî ve hate domandin û meşrûbûna wê jî bi wê yekê pêkan bû.

Ji bilî rojnameya Özgür Gündem û Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê çî rojnamevan bi xizmên wendayan re hevdiîtin pêk neanîbûn. Pirr kêr rojnamevanên Tirkîyeyê, xizmên wendayan dîtîbûn û hevpeyvîn kiribûn. Yê ku xizmên wendayan dîtîbûn jî, piştî îtirafên Abdulkadir Aygan û Doza Ergenekonê ya di 2007'ê de û dema ku di bîrên BOTAŞê de hestiyên mirovan derketin, ew dîtîbûn. Gellek xizmên wendayan jî, çî caran bi çapemeniya Tirk re pêwendî deynenîbû.⁷⁹

Ji bo pêkanîna hevkarîya di nav saziyên dewletê yên curbicur, helwesta dozgeran jî pirr girîng bû. Ji ber ku xizmên wendayan ji bo ku aqûbeta mirovên xwe hîn bibin, daxwaznameya xwe didan dozgeran. Leyla Gasyak yek ji wan xizmên wendayan e.

Di 8'ê Adara 1994'ê de, erebeya ku Ömer

78 Di salên 90'an de bêdengiyek hebû, lê piştî salên 2000'an lêkolîn zêdetir bûn. Ev rapor di sala 2012'ê de ji aliyê Rêxistina Teqîbkirina Mafê Mirovan, bi navê Rapora Dema Edaletê hatiye amade kirin. (<http://www.hrw.org/sites/default/files/reports/turkey0912tuwebwcover.pdf>), hewldanên TESEV'ê (Weqfa Etûdên Cîvakî û Aborî ya Tirkîyeyê) û palpiştiya Baroya Amedê û Baroyên deverê ya bo şopandina doza Temîzöz û Yê Din jî divêt neyê ji bîr kirin. Xebatên rêxistina YAKAY-DER û MEYA-DER'ê ya xizmên mirovên hatine wendakirin jî, di vî warî de pirr girîng in. Lêbelê ji ber ku YAKAY-DER û MEYA-DER bi tenê rêxistinên xizmên mirovên hatine wendakirin e û nemaze jî li ser wendakirina rawestîne, dîsa jî bêdengiya cenahên sîvîl ên li Tirkîyeyê bi serê xwe pûç nake.

79 Xizmên wendayan, di hevpeyvîna de bi tenê behsa rojnamevanên Saadet Yıldız, Gülçiçek Günel Tekin, İnci Hekimoğlu û rojnamevanên Özgür Gündem û xebatkarên DİHA'yê kirin.

Candoruk, Abdülaziz Gasyak, Süleyman Gasyak û Yahya Akman lêbûn, li cihê kontrola BOTAŞ'ê ji aliyê ekîbên sîvîl ve desteser dibe û ew tên girtin. Leyla Gasyak piştî ku mêrê wê Süleyman Gasyak ragirî dibe, pey re diçe def dozger:

"Ez çûm cem dozger, ez bi tena serê xwe çûm, lê nobedarê wî, li ber deriyê wî sekinî bû. Ez rabûm min daxwaznameya xwe teslîmî wî kir. Min bi Kurmancî jê pirs kir û got 'dozger li vir e?' wî got 'belê.' Wî daxwaznameya min bir hindur û an saetek an jî nîv saetî daxwaznameya min li hindur ma. (...) Ez li ber derî mam. Saetek derbas bû û mêrikek hat û got, 'were hindur', ez çûm hindur. Dozger ji min re got 'mêrê te çawa wenda bû', min jî got 'ew doh çû û ji doh ve wenda ye.' Wî daxwaznameya min xiste gulok û da destê min û ez qewirandim. Ji min re got 'biçe cendirmeyê û mêrê xwe ji wir pirs bike'"⁸⁰

Xizmên wendayan, dema ku behsa wendakirinên mirovên xwe dikin, her û her behsa ekîbên dewletê yên wekî JITEM û Tîmê yên ku zordariya dewletê temsîl dikin û behsa bêhêztiya cenahên ku li ber vê neheqiyê disekinîn, dikirin. Abdullah Dansikê ku di 22'ê Sibata 1995'ê de bavê wî Mehmet Dansik û birayê wî Ahmet Dansik hatibû wendakirin ji bo wê ev tişt gotin:

"Wê demê JITEM hebû. Li wê devêre JITEM hebû. Bîst û çar saetan li sikakan bûn. Anku kê çî bipirsiya ew jî dibirin, herkes ji wan ditirsiya. (...) Ti kesî cesaret nedikir ku aqûbeta mirovên xwe bipirse. Wextê ku hin kes an diçû û pirs dikir, ji wan re digotin 'zêde wan pirs nekin, heger hûn pirs bikin serê we jî dê têkeve belayan.' (...) Yanî çî sazî çî dozger çî dadgeh û çî kes tinebû ku mirov jê re bibêje ku ew kes bê sûc û bê guneh in û 'we ew birin ku derê.' Çî kes xwedî dernakeve û tu ji kê bipirsî dibêjin ez nizanîm."⁸¹

Hevkarîya sazûmanî wekî din hêmana bêminetiya kiryarên vê stratejiyê bû. Failên van rûdawan dizanin ku ji ber ku ew bi PKK'yê re şer dikin çî caran ew nayên darizandin û her bizavên wan

80 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 16.10.2012

81 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

derveyî darizandina qanûnî ne. Ji bilî hiyerarşîya leşkerî ya formel, îtîrafkar-leşker-cerdevan çî caran hesab nedidan amir û rayedarên xwe, ew gellek caran wekî nefermî li nav mirovan dimeşîyan. Ev jî nîşaneyê hebûna hêzên taybet a di raya dewletê de ye. Şahidê bi bernavê Tükenmez Kalem, ku di dosyeya Temizöz û Yên Din de îfade dabû, ji bo serbestiya hereketên xwe weha dibêje: "Ji bo ew mirovên ku me ew ragirî kiribûn, 3 tişt dihatin kirin: Ew kesê ku dihat girtin, an sixûrtî qebûl dikir, an dihate berdan û an jî dihate kuştin. Car caran jî me ew didarizand û bi ewraqên wan ve ew dişandin dadgehê."⁸²

Bi kurtahî, dewlet saziyeke yekpare û monolîtîk nîne, lêbelê di salên 90'an de, dewletê hem di warê wendakirinan de kompozîsyoneke sazumanîyê ava kiriye û hem jî sehayên ku karên ilmî û zanistî dikin ên wekî çapemenî, akademî û civaka sîvîl, li dor behsa vê kompozîsyonê qanî kiriye. Bêguman ev kompozîsyon, atmosfereke şexsî derdixîne holê û berjewendiyên aborî ya hêzên herêmê û tîmên lokal her diparêze û heta dereceyekê jî mixtariyetekê ji bo wan durist dike. Lê konsept wekî hevdu ye: li dor behsa 'têkoşîna bi terorê re' li devera OHALê Kurdên ku alîgirên PKK'yê ne tesnîf dikirin, wan 'an PKK'yî an dijî PKK'yî' kategorîze dikirin û dema ku pêwîst bûya ew dikuştin. Li dor behsa vê konseptê tîmên lokal, çî wext dil bikin, ji bo hakimiyeta qadê pêk bînin, dikarin mirovan bikujin û ji holê rakin. 'Hakimiyeta qadê' car caran hinde kesan wêrektir kiriye, hinde kes ajîte kiriye û hinde kes jî di emelên xwe serbest kiriye, lêbelê hinde kes jî daye kuştin, daye îmha kirin û ji holê rakiriye.

82 Neql ji Elçi, T. "Türkiye'de Gözaltında Kayıplar", 2009: 92

B) Tecrûbeyên Xizmên

Wendayan

Profesor Gökçen Alpkaya di gotara xwe ya derbarê babeta wendakirinê de, di demeke berê de nivîsîbû û di vî warî de xebateke pêşîn e, hemû mirovên ku hatine wendakirin dabeşî sê koman dike: Di koma yekemîn de, mîlîtanên çepgir ên têkoşîneke çekdarî dimeşînin, di koma duyem de mixelîfên ku bîrdozî û pênaseya xwe ya siyasî aşkîra dikin, ên wekî Partiya Kedê ya Gel û partiyên şûnşopên wê û rayedarên wê yên bajar û navçeyan, xebatkarên rojnameya Özgür Gündem, kedkarên sendîkayan û namzetên Komeleya Mafê Mirovan an Kurdên navdar, di koma sêyem de jî, Kurdên ku li devera OHALê jiyane bi cih digirin.⁸³

Ew kesên ku me li Şernexê di derbarê babetê de hevpeyvîn bi wan re çêkirin jî, wekî klasîfikasyona ku Alpkaya durist kiriye, endamên koma sêyemîn in. Ji biçûkan ta mezinan û hemû pişesazên Kurd hatine wendakirin. Me di xebata xwe de her hewl da ku em serboriya wendakirina wan mirovan û serencama xizmên wan kesên ku hatine wendakirin destnîşan bikin. Her ji ber wê, dema ku mirov li serencama mirovên ku hatine wendakirin dinihêre, aqûbeta mirovên wendakirî û yên xizmên wan ên ku li pey şop û rêça wan kesan ketine, wekî hevdu ne.

Her weha di vê beşê de em dê hewl bidin ku tecrûbeyên xizmên wendayan terîf bikin. Ev tecrûbe geh wendakirinê û geh jî rûdawên piştî wendakirinê şamil dike. Me xwest ku em van tecrûbeyan, di hevpeyvînan de bi têgehên ku zêde referans lê tên kirin terîf û îzeh bikin. Xizmên wendayan, prosesa wendakirinê û di dawiya wendakirinê de tiştên ku hatibû serê wan her û her bi van term û têgehên terîf dikirin, bal dikêşan ser van peyvên û ew aşkîra îfade dikirin. Ev têgeh dewlet, lêgerîn, edalet, niştîmanî, tunebûna gora wendayan û polîtîka bû.

⁸³ Alpkaya, G., 1995:45.

1) Dewlet

Hema hema hemû xizmên wendayan bi têgeha dewletê re û praktîkên wê yên salên 90'an ên ku bo pêkanîna 'hakimiyeta qadê' re cara yekem rû bi rû nemabûn. Di gellek hevpeyvînan de, Kurd, bi zorê mecbûrî cerdevantiyê bûne, gundên wan hatine valakirin û şewitandin, bi zorê hatine koçber kirin û tûşî tecrûbeyên kêyfi û înfazên îlegal hatine û mafê mirovî hatiye binpêkirin. Her weha jixwe xizmên wendayan stratejiyên dewletê yên salên 90'an û dewletê bi xwe baş nas dikin. Wekî din, ji bo ku ev praktîkên dewletê bihêne aşkîra kirin û enstrûmanên dewletê bihêne zanîn, tecrûbeyên xizmên wendayan pirr girîng e.

Kompozîsyona stratejiyên dewletê yên salên 90'an

Di konteksta gundan de, praktîka herî berbiçav, mecbûrkirina gundiyan a cerdevantiyê ye. Qebûlkirina cerdevantiyê nîşaneyê palpiştiya dewletê ya li devera Kurdan bû. Her ji ber wê jî, alîgiriya dewletê bi pesendkirina cerdevantiyê ve girêdayî bû. Ji bo wê jî gava ku kesekî an malbatekî cerdevantî qebûl nekira, ew tûşî mueyîdeyên koçrevkirinê dibûn. Ev yek hatibû serê gellek xizmên wendayan. Her weha Sait Fındık, ji bo mecbûr mayîna cerdevantiyê ev tişt gotin:

"Ez çawa bibêjim, ji bo ku em bibin cerdevan, gellek zilm li me kirin. (...) Me qebûl nekir. Me got 'nanê me têra me dike, ti kes têkilî me nabe û em jî têkilî ti kesî nabin, em nikarin wê sîlehê werbigrin, ew ne karê me ye.' Fehm û feraseta me wesa bû. Yek jî me ji wan re got, 'ev ne karê me ye, hûn çima bi zorê çek û sîlehan didin me, em vî karî nakin.' Yanî gellek zilm û zordarî li me dikirin. (...) Wan jî ji me re digotin 'herkes û her eşîr cerdevantiyê qebûl dike, ma hûn çima qebûl nakin? Qey hûn ji dewletê hez nakin? Fîşar û guşarên bi wî rengî hebûn. Mesela êvaran dewriyeya rê hebû, qereqola BOTAŞê hebû, ew qereqol bi tankan dihate parastin. Ji bo dewriyeya rê, tank, panzer û panzerên heşt teker, bi şev û roj her tim diçûn û dihatin. Car caran şevê du caran diçûn û dihatin. Ji BOTAŞ'a ber Silopiyayê û heta qereqola sînor

*a Cizîrê. Dewriyeyeke rê hebû, çi wext ew derbas bibûna, wan bi balafirşikana gule li me dibarandin. Yanî wesa dikirin ku em bitirsîn, dengê xwe nekin û li cihê xwe rûnin. Hemû kes li ser xaniyan radiketin, ji xwe zarokan ewk dikir û klîmayên weha jî wî çaxî tunebûn. Havînan herkes li ser xaniyên xwe radiketin.*⁸⁴

Xizmên wendayan, wextê ku cerdevantiyê qebûl nakin, çi tê serê wan bi detay îfade dikin: mêrên gund li meydana gund kom dikirin, nasnameyên wan jê distandin, ew bi saetan li wir li ser piyan disekinandin, çêr û heqaret li wan dikirin, îşkence, lêdan dixwarin, gundê wan dihat bombebaran kirin û ew yek bi yek rastî muemeleyên tundî dihatin. Heger gundî israr bikin ku cerdevantiyê qebûl nekin, gundê wan dihat valakirin, mala wan jî aliyê rayedarên dewletê ve dihat şewitandin û mecbûrî koçreviyê diman. Jixwe gellek xizmên wendayan, înfazên sivil û qetlên ji aliyê Hîzbûllahiyan ve hatine kirin bi çavên xwe dîtine. Her ji ber wê, xizmên wendayan, beriya vê stratejiya wendakirinê jî, bi taybetî jî bînpêkirina mafê insanî ya ku ji aliyê leşkerên Tirk û JÎTEM'ê ve hatine kirin, dizanibûn. Ew serencama nas û xizmên xwe yê salên 90'î, di nav kompozîsyona vê repertûara dewletê de dibînin.

Kiryar û wekî mekanîzmeyeke kuştinê, JÎTEM

Li gor xizmên wendayan, kiryarên/failên wendakirinan ev mirov in: Cemal Temizöz (Wekî din ew Cemal yüzbashi/serpel û Cemal Temiz tê bi nav kirin) Kamil Atak (Kamo) û îtîrafkarên wekî Bedran û Hakim. Ji bilî Cizîrê, li deverên din jî, failên wendakirinan û navên wan tên zanîn, lêbelê ji ber ku paşnavê wan jî bîr kirine, ritbe û payeya leşkeran ji aliyê wan ve tên gotin. Li gor wan koma JÎTEM a Silopiyayê jî ev kes in: Koçero Saluci, Sıtkı Tatar, Ramazan Erkan in. Navên van kesan her tim di bîra xizmên wendayan de ne û îhtîmalen ew ti car wan jî bîr nakin. Ew navên van failan jî bîr nakin ku heger rojekê edalet pêk bê ku navên wan bijmêrin û wan nedin jî bîr kirin. Li gor xizmên wendayan, kiryarên van rûdawan JÎTEM bi xwe ye û ev kes jî ji bo JÎTEMê dixebitin. Her

⁸⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

wêha li gor wan, tîmên JÎTEM'ê dabeşî gund û bajaran dibin. JÎTEM a Silopiyayê, JÎTEM a Cizîrê, JÎTEM a Basanê û JÎTEM a Qilabanê. Li gor wan JÎTEM weha dabeş dibe, lê di rastiya de girêdayî navendekê ne. Bo nimûne, bavê Serdar Tanış, Şuayip Tanış, failê kurê xwe wekî Levent Ersöz qebûl dike û ji bo wê dema ku ew li Silopiyê bû jî weha dibêje:

“Welleh ez nizanîm, ji berê ve hatibû, an niha hatibû, ez nizanîm. 2 sal berê bû, piştî ew kiribûn serokê JÎTEMê, ev tişt qewimîn. Ew serokê hemûyan bû.”⁸⁵

Li gor hemû xizmên wendayan, aktîsvîstên mafê mirovan, nûnerên saziyan û parêzeran, JÎTEM û tîmên wê, di emelên xwe de serbest bûn û herkes bi înisyatîfa xwe dikuştin. Xizmeke/i wendayan dibêje ku “wî çaxî jixwe her tişt di destê JÎTEMê bû, destê leşkeriyê bû.”⁸⁶ Di hemû hevpeyvînan de, gellekê bêjedarên, behsa vê sîstemê dikirin: Hemû bêjedar dibêjin ku, li deverê wê demê leşker desthilatiya wir dikirin, li hin herêman jî, kontr-gerîlayên ku di bin banê JÎTEMê de kar dikirin û wan bixwesta kî/ê tehdît bikira, dikirin. Bixwestana îşkence li kî/ê bikirana, lê dikirin û bixwestana kî/ê înfaz bikirana, ew dikuştin. Li gor wan çi otorîyeteke li ser wan tunebû. Aktîvîst û dadnasên ku me pê re hevpeyvîn kiribûn, behsa elastîkîyeta sîstema kontr-gerîlayê ya JÎTEM'ê dikirin. Ev sazî di derbarê mirovan de agahiyan kom dikin, bi sixûran re kar dikin. Her weha navê wan kesan jî nedihat aşkira kirin û bi tenê di hinde dosyeyan de kifşe ye. Ji bilî wê ew kes car caran jî bo arîşeyên xwe yê dîtir jî û ji bo berjewendiyên xwe jî mirov kuştine. Her weha ew sîstem dîsa li dor behsa konseptekê civiyan e û bi awayekî serbixwe hereket kirine. Ev yek nîşaneyên strûktura rêxistina wê sazîyê ye.

Cihûwar, Pêwendî û ‘Sektora Temizöz’

Di hevpeyvînan de bêjedarên her tim bal kêşandin ser taybetmendiyên Şernexê yê ku li sînor û nêzî deriyê sînorê Xebûrê û behsa girîngiya

⁸⁵ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 16.10.2012

⁸⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

potansiyelê wê ya bazirganiyê kirin. Li gor wan, JÎTEM'ê bazirganiya li deriyê sînor ê Xebûrê xistibû bin kontrola xwe, ji bo qaçaxçitiyê û bazirganiya her awayî, rişwet dane mirovên wir. Her ji ber wê jî bazirganiya deriyê sînor ê Xebûrê çavkaniyeke bazirganiyê ya girîng e bo JÎTEM'ê. Kontrol kirina bazirganiya li Şernexê, nîşaneya xweseriya hêzên şer ên JÎTEM'ê ye. Aktîvîsteke/î mafê mirovan, di derbarê van pêwendiyên de ev tişt gotin:

*"Xebûr wekî sektorekê bû, bazirganî bû. Xebûr di destê wan de bû, destê hêzên taybet. Yanî ev hemû tişt, kar û çalakî, her tiştî li Rojavayê (Tirkiye) û siyaset bi Xebûrê hate fînanse kirin. Gellek kesên qirêj di nav wan de hebûn, wekî sercerdevan, (...) paşê fermandarên JÎTEM'ê, walî (...) hebûn wê demê. Di nav wê sektorê de her tişt hebû, qaçaxçîtî, dîzîna erebeyan, xerac, firotina eroînê û her tişt. Çimkî ew wezîfeyên wan pîrr bûn, jê re çî dibêjin xweser dibêjin, mixtar dibêjin, lê her tişt li gor kêyfa xwe dikirin, pîrr rehet bûn."*⁸⁷

Di hevpeyvînan de babeteke dîtir jî, wekî îfadeya aktîvîstekî li Şernexê, 'sektora Temizöz' a ku ji xelkê pere dixwestin, bû. Ji gellek xizmên wendayan, bo dîtina nas û xizmên wan ên hatine wendakirin, hin kesan pere xwestibû. Bi dayîna pereyan ve qaşo dê xizmên wan ên wendabûyî bidîtina. Her weha xizmên wendayan bo dîtin û peydakirina nasên xwe pere dabûn wan kesan jî.

88

Di derbarê ekîba kontr-gerîlayan de babeteke zêde tê dubare kirin a dîtir jî, meseleya xwestina 'pereyê serê mirovan'* bû. Hemû xizmên wendayan bawer dikirin ku, tîmên JÎTEMê ji bo kuştina serê herkesî, ji dewletê pere wergirtiye. Her weha ji ber ku xwestina pereyan pîrr zêde bibû, xizmên wendayan, ji bo wan terma JÎTEMcî û kellecî di heman maneyê de bikartînin. Bi taybetî çîrokeke di derbarê Adem Yakın heye ku wî gotiye "Min sed mirov kuştin, ezê perê serê sed kesan werbigrim, tam û tam sed kes, ka

87 Hevpeyvîn: Stanbol, 11.01.2013

88 Ji bo agahiyên berfirehtir bo vê mijarê, li beşa *Lêgerînê/ Arayış* binihêrin.

eraqekê bidin min." Ev yek ji aliyê hemû xizmên wendayan ve jî hatiye teyîdkirin. Li vir tiştê girîng ew e ku, her çend ev îfadeyên xizmên wendayan rast an ne rast bin jî, dîsa dewletê ji bo kuştina niştimaniyên xwe hinde ekîb û tîm avakirine û ew kuştine.

Xaleke girîng a din jî erebeya Renault Toros a spî ye ku hema hema hemû xizmên wendayan jî behsa wê kirin. Ekîba JÎTEM'ê erebeya Toros, hem li Cizîrê hem jî li Silopiyayê bikaranîne. Ew erebe hem ji bo darizandina mirovan û hem jî bo safîkirina karên xwe hatine bikaranîn. Renault Toros a spî ji bo hemû Şernexiyan tê maneya erebeya mirinê. Bi tenê ne li Şernexê, li her der û deverên Kurdan, Torosa spî di karên JÎTEM'ê hatin bikaranîn. Mirov bi van erebeyan hatin wendakirin, yên ku siwarî van erebeyan bûn li kuçe û kolanan hatin înfazkirin. Kî/ê ku siwarî van erebeyan bûn çî caran jê sax derneketin. Du xortên Cizîrî, ji bo Torosa spî û taybetmendiyên wê demê ev tişt gotin:

"Erebeya JÎTEM'ê Torosa spî bû. Hemû bi simbêl bûn, cilûbergên wan sivîl bûn û di destê wan telefonên bêtel (telsiz) hebûn. Yek jî qabloya wê telefonê di erebeyê de kifşe dibû. Wextê ew erebe di sikakan de xuya dibû, wî çaxî tîmên kuştinê jî li ser karên xwe bûn. Kî/ê ku ew erebe didîtin, direvîn malên xwe. Li ber deriyên, li sikakan çî kes nedima û herkes direvî hindurê malên xwe."⁸⁹

Dewlet û Halê wê yê Awarte

Li gor îfadeyên bêjedaran, ji bilî tîmên JÎTEM'ê gellek mirov di der û dora wan kesan hebûn ku, wan pêwendiyeye berfireh a di derbarê agahdariyên mirovan durist kiribûn. Gelo ew kes ji bo xizmên wendayan, heta çî dereceyê dewletê temsîl dikin? An jî divêt mirov vê pirsê weha formule bike dê çêtir be. Ji bo xizmên wendayan, ev praktîkên ji aliyê dewletê dihatin kirin, heta kuderê dewletê temsîl dikin? Berî her tiştî, divêt em destnîşan bikin ku, xizmên wendayan dewlet û JÎTEM'ê wekî hevdu dibînin. Li devera OHAL'ê,

89 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.09.2012

* Tr. Kelle parası.

di salên 90'an de dewlet dihat maneya JÎTEMê û JÎTEM jî dihat maneya dewletê.

"Gelo ew kî ne? Ji wê demê heta niha dijaminê me kî ne? Dewlet e, ma ne wesa ye? Dewlet e dewlet. Wextê dewlet hebe, em ji bilî wan çî tiştî gumanbar nabin. Heger dewletê ew wenda nekiribin, divêt piştî ku ew hat wendakirin, li pey şopa aqûbeta wan biketa. Dewletê heta niha, di derbarê birayê min de çî tiştî ji min nepirsî û negot 'ka çî hat serê birayê te.'"⁹⁰

Dewletê di salên 90'an de li wan deverên ku wendakirin lê pêk dihatin, bi rejîma halê awarte rêvebiribû. Rewşa awarte di nav xwe de halên awarte yê cuda jî dihevine. Ev halê awarte yan halê îstîsna, wekî Agamben jî gotî, halekî desthilatan a di nav sînorê hiqûqî de, bînpêkirina mafê însanî terîf dike. Divêt neyê ji bîr kirin ku, pêwendiya vê qayîde û îstîsnayê, kompozîsyoneke hevkarîya dewletê nîşan dide. Ew li ser esasên hevdu ava dibin û hevdu tamam dikin. Li gor Agamben, halê awarte, normê bi xwe terîf dike. Li gor Agamben, ev halê îstîsna, rayedariya dewletê ya li ser jiyana mirovan temsîl dike û nîşaneyê desthilatiya dewletê ya modern e.⁹¹

Her weha, salên 90'î û rûdawên li devera OHAL'ê, nîşaneyê wendakirina hêza dewletê ya siyasî û leşkerî nîne. Berovajî wê, dewletê mesûliyetên xwe bi cih neanîne û ji bo xwe seheyê der qanûnî û awarte avakiriyê. Her ji ber wê jî, ew kesên ku me pê re hevpeyvîn kiribû, JÎTEM û dewletê wekî hevdu dibînin. Bo nimûne:

"Dê niha çawa bibe, ka ez çî bibêjim, bavê min mirovekî binavûdeng e. Jixwe hûn dizanin, mirovên navdar û yê ku rê li nîşanê xelkê dikin û zana ne, hatine wendakirin. Dewlet jî dizane ku heger ev mirov rêbertiya xelkê bikin, dê paşerojê bêhtir bibe mesele. Ji bo wê jî, her tim mirovên rêber û giregir hatin wendakirin."⁹²

⁹⁰ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

⁹¹ Agamben, G. *State of Exception*, 2008:24.

⁹² Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

"(Bo JÎTEM'ê) wextê mirov lê dinihêre, ew mirovên dewletê bûn. Jixwe wê demê jî dijaminê xelkê ew bûn."⁹³

"(...) dewletê jî em kuştin û nasên me wendakirin. Dewlet weha ye, heger vîjdana dewletê hebe, heger edalet hebe, heger neheqî li mirovan bête kirin, xelk bête kuştin û bête wendakirin, em jin gelo em dê çî bikin? Ka ji min re bibêje (...) ma dewletê bi tenê ev tişt neanîne serê me. Bi van sixûrên cerdevan û MÎT'ê (Saziya Saloxgêriya Netewî) ve xayîntî aşkira bû. Cerdevanan her tişt li me kirin."⁹⁴

Lêbelê, dewletê wekî din, unsûrên herêmî jî xistine nav koma tîman û ew lokalîze kirine. Wekî me berê jî gotî, bi vî awayî, dewletê enformasyona di derbarê devera Kurdistan pêk aniyê. Her ji ber wê jî, dewletê pêwendiyên xwe yê cihûwarê Kurdistan bi saya serê unsûrên herêmî qewî û muhkem kiriye. Îtirafkar û cerdevanan ev pêwendî pêk anîne. Cerdevanan pêwendiyên eşîrî û hêza eşîrên Kurd û zanîna di derbarê wan de gihandiya dewletê. Îtirafkaran jî, eleqederiya di navbera xelkê û PKK'yê aşkira kiriye û agahiyên di derbarê wan de gihandiyê tîman. Bo nimûne, Kamil Atak'ê ku sercerdevan bû, wekî din serekê eşîra Tayanê Kerevan bû. Ew û mirovên wî yê ji eşîra wî yê çekdar, bûne sedema wendakirinê mirovên Cizîrî. Wan gellek kes kuştin, ji xizma û malbatên wan bi dûr xistin. Ji bo wê jî hemû xizma wendayan, îtirafkar û cerdevanan wekî sixûran dibînin ku, agahiyên milêtên xwe ji bo yekîneyên hêzên dewletê yê kujer parve dikin û ji wan gellekî diqehirin. Hema hema hemû xizma wendayan di hevpeyvîna de aşkira kirin û van kesan wekî xedar, bêserî, çavbirçî, çavçil û qatil qebûl dikin. Mirovên ku hatin wendakirin, ji bilî wendakirinê, ji aliyê dewletê ve tûştî muemeleyên dîtir jî bûn. Dewletê mal û milkê wan desteser kir, erebeyên wan ji wan hatin standin û ji aliyê tîmên JÎTEM'ê ve hatin bikaranîn. Pêçî û tiliyên wan hatin qutkirin û gustîlk û pereyên wan hatin gaspkirin. Ev kar û emelên qetilxwîn û çavbirçîtiyê, bi giştî wekî aîdî îtirafkar û cerdevanan hate nîşandan. Her weha dema ku ev îtham li wan dihat kirin, wê demê

⁹³ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

⁹⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 01.09.2012

dubendiya terma 'dewlet'ê derket holê. Ji ber ku ev pratîk her tim ji aliyê dewletê ve hatibûn kirin. Xanim Candoruka ku jina Ömer Candoruk e, û mêrê wê, pêşiyê hatibû wendakirin, tiliyên wî bo gaspkirina gustîlkên wî hatibûn jêkirin û erebeya wî ji aliyê JÎTEM'ê ve hatibû desteserkirin, di derbarê wendakirina mêrê xwe û terma dewletê de weha dibêje:

"Cemal Temizöz, di lojmanan de dima, serpelê vê derê bû, li Cizîrê her tişt ji wî dihat pirsîn û di bin hikmê wî de bû. Heger sûcekî min hebûya, bila ez bigirtima, lê çî sûc û xetayê min tunebû, heqê wî nîne ku min werbigre. Lêbelê wê demê ev bela û bobelat anîn serê milête me. Wî bi wan segbavan re hevaltî kir, xwezî nekira, min di mehkemeyê de jî ew tişt gotin. 'Yekî wekî te çawa dibe mirovê dewletê û bi wan segbavan re hevaltîyê dike? Te ew qas mirov kuştin, tu ji Xweda natirsî, çî heyf e guneh e'"⁹⁵

Terma dewletê ji aliyê bêjedaran ve, ji tîmên JÎTEM'ê dihat cihêkirin û bikaranîn. Ji ber ku madem dewlet xwe li ser esasên hiqûq û edaletê ava dike, çawa ji bo kar û emelên bi vî rengî bêdeng e, ew dihat gengeşe kirin. Di van demên weha de, dibe ku bi awayekî zanetî nakokiyên ku rû didan. Ev yek ji aliyê wan ve weha bû: JÎTEM wekî dewletê, dewlet jî wekî JÎTEM'ê dihat qebûl kirin. Ji bo xelkê ku li deverê dijiya, dibe ku hebûna dewletê bi vî awayî di bedena wan de hatibû nexşandin, ev feraset ew qas zelal bû: "Çi kes ji dewletê baştir nizane ku, kî/ê kî/ê kuştîye."⁹⁶

2) Lêgerîn

Lêgerîna wendayan a bêsînor, bi serpêhatiya xizmên mirovên wenda destpê dike. Tiştê ku dihat niyetkirin jî, yek û yek ev bi xwe bû. Divêt xizmên wendayan, berpîrsê wendayan kî ye hem bizanibe, hem jî tam û tam nezanibe. Wekî Calveiro jî gotî, hijmeta wendakirinê, ew e ku ew hem aşkira ye û hem jî veşartî ye.⁹⁷ Yên ku

⁹⁵ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

⁹⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 16.10.2012

⁹⁷ Calveiro, P. "Torture in the heart of 'democracies'", 2008. http://www.boell.org/downloads/Calveiro_torture_democracy.pdf

li pey wendayan ketine, an xizmên wan jî xwedî qedereke li pey şop û rêça wan a bêdawî û bêsînor parve dikin.

Bi xîret û hewldana saziyên civaka sîvîl, di sala 2006'ê de, Tirkîyeyê jî îmze avêt Peymana Navdewletî ya Miletên Yekbûyî ya Li Dijî Parastina Wendakirinê. Ew peyman di sala 2010'ê de karîger û aktîf bû. Ji 91 dewletan 37'ê wê yên ku îmze avêtibûn vê peymanê, ev peyman li gor hiqûqa navxwe durist kirin û anîn dereceya qanûnî.⁹⁸ Peymana Miletên Yekbûyî, du heb terîfên maf ên nû derxistin. Ya yekem mafê wendakirinê, ya duyem jî, mafê mexdûran ê zanîna heqîqetê. Her weha sînore terîfa mexdûran hate berfirehtirkirin. Bi tenê ne ew kesên hatine wendakirin, her weha yên şûnda mayî jî wekî mexdûr hatin terîfkirin. Heger xizmên wendayan an şûnda mayî ji zanîna heqîqetê mehrûm bin, ew wekî îxlal kirina maf hat terîf kirin. Mirovên şûnda mayî an xizmên wendayan, hem li pey şopa aqûbeta wendayan ketibûn û hem jî li pey zanîna heqîqetê ketibûn. Sedema hevpeyvîna me ye Navenda Birgehê ya bi xizmên wendayan re ya di derbarê wendakirinan de ew e ku, li

Tirkîyeyê di salên 90'an de li bajarên Kurd, divêt wendakirin bihata belgekirin, têkoşîna hiqûqî bihata geşkirin, ev mesele bêhtir bihata aşkirakirin. Ji ber ku xizmên wendayan yek û yek şahidên rûdawên wendakirinan bûn û yên di bin tesira wendakirinan de mabûn jî ew bi xwe bûn. Her ji ber wê, ji bo me jî, serencama wendakirinê bi tenê serencama wendakirinê nînbû, her weha ew çîrok û serboriya xizmên wendayan bi xwe bû jî. Û heger em jiyana xizmên wendayan terîf bikin, serencama jiyana wan a mayî, serencameke li pey şop û rêça aqûbeta wendayan ketî bû.

Rojên Pêşîn: Hêviyek

Mexdûriyeta xizmên wendayan, a rast bi tenê ji binpêkirina mafê wan ê zanîna rastiyan û heqîqetê pêk nayê. Rêgeza wendakirinê, stretejiyeye sîstematîk a stratejiya dewletê ye û di hedefa wê

⁹⁸ http://treaties.un.org/Pages/ViewDetails.aspx?src=IND&mtdsg_no=IV-16&chapter=4&lang=en

de bi tenê ne wenda û xizmên wendayan hene, her weha armanca dewletê tirsandina hemû civakê ye. Tirs û xofa ku ji nezanîne peyda dibe, xelxele û diltepîniya mirovan, tatêl û telaşa tirsîna ji wendakirinê, her û her ji aliyê mirovên deverê ve hatiye hîskirin...Tiştê ku wendakirinê, ji înfazên kêyfi û yên îlegal cihê dike jî, jixwe ev xal e. Wekî Alpkaya jî diyar kiriye, xizmên wendayan, di serî de hêvî nakin ku mirovên wan hatine kuştin û naxwazin li ser esasên kuştina mirovên xwe nêzî vê wendakirinê bibin. Ji bo wê jî dema ku ew li pey şopa aqûbeta mirovên xwe dikevin, her û her bi hêviya ku ew hîn sax in an jî dijîn tevdişînin.⁹⁹ Lêbelê li aliyekî din jî, ji ber ku xizmên wendayan wextê ku mirovên wan nû tên wendakirin, her hêvî dikin ku ew nehatiye kuştin û motîvasiyona lêgerîna wan her li ser wê esasî dimeşe.

Li Tirkiyeyê sedema belavbûna terma 'wendakirinê' di rola dewletê de veşartî ye. Ji ber ku ew kesên ku hatibûn wendakirin, yekser pêşiyê ji aliyê dewletê hatibûn ragirî kirin û terma ragirî kirinê (gözetli) jî di bin mesûliyeta sazîyên dewletê de bû. Lêbelê li Stenbolê xizmên wendayan ji bo mirovên xwe her diçûn qereqolan, lêbelê li Şernexê cihê lêgerîna aqûbeta wendayan her fermandariya cendirmeyan bû. Li gor axaftinên xizmên wendayan, holik û kulûbeyên di bin malên cerdevanan de bûn, yek ji navendên darizandinê yên mirovên wenda bûn. Dozgerî jî wekî saziyeke dewletê, di dema destpêka wendakirinan de, cihê lêgerîna hiqûqî nînbûn, ew yekîne her tim ji perçeyê wan sûcê bûne.

"Di serî de min digot qey ez dê Nazım xelas bikim, min digot qey dê di nav sê-çar rojan wî berdin. Lê piştî ku di ser re hefteyek bihurî... Jixwe çî hêviyên me yên hiqûqî tunebûn, me bi tenê digot qey dê wî berdin."¹⁰⁰

Ji ber ku seheya hiqûqê di bin kontrola siyasê de bû, çî caran dadgeh an mehkeme, sazîyên serbixwe û azad nînbûn. Bi taybetî jî di nav şertên jiyana OHAL'ê de, hiqûq ji bo parastina mafê mirovî nehatiye rêkûpêkkirin. Ew bi tenê

⁹⁹ Alpkaya, G. 1995:50

¹⁰⁰ Hevpeyvîn: Stenbol / 29.08.2012

bi sazîyên xwe ve, xwe diparast, lêbelê çî fonksiyona wê ya qewîkirina heqîqetê tunebû.

"Dewletê ji me re got ku, dozgerê wî çaxî jî hevalên wan bû. Heger ew hevalên Hakîm û Bedran nebûna, Xwedê neke, min dê wî çaxî bigota, li vir yekî/ê xwe bikuşt, min dê bigota yekî xwe kuştiye. Gelo dozger û hakim dê bihatana, îfadeya min werbigirtana û ez bibirama qereqolê? Ma ev ne qanûn e, ma ev ne dewlet e? Ma ew nabêjin gelo vî zilamî ji bo çî xwe kuştiye? Ji dê û bavê wî çî tiştî napirsin? Ew gellek caran wî zilamî dibin mehkemeyê. Lêbelê dozger çî caran ji me pirs nekir. Ew hevalê Bedran û Cemal Yüzbaşı/Serpel bûn, çî tiştî ji me pirs nekir."¹⁰¹

Ev gotinên Xanim Candoruk bû. Ew jina Ömer Candoruk bû û Ömer Candoruk jî li gel Süleyman Gasyak, Abdülaziz Gasyak û Yahya Akman hatibû wendakirin. Cesedê van her çar kesan ên ku hatibûn wendakirin, ji aliyê Leyla Gasyaka jina Süleyman Gasyak hatibû derxistin. Dozgerê ku tê cihê vê rûdawê, her çend nasnameya wan hatibe aşkîra kirin jî, ji bo lêgerîn û darizandinê çî caran gazî malbata wan nake. Wekî li jor jî hate diyar kirin, rojek piştî wendakirina mêrê Leyla Gasyak, ew diçe gel dozger û bi îmkana xîreta xwe ew cesedê mêrê xwe bi xwe dibîne. Piştî ku cesedê mêrê xwe dibîne, paşê çî caran hêviya wê ya bi dozger namîne.

"Tu dizanî wê demê JITEM hebû û însan û heywan ji bo wan ferq nedikir. Kê ku kê bikuşt, nedigotin 'weha weha bû.' Kê ku di derbarê van meseleyan de qise bikira, gule û qurşûnên JITEM'ê di serê wî/ê de jî tije dibû. Me êdî nizanibû ku çî bikin, em sekinîn û paşê çûn cem dozger. Me jê re got 'şikayeta/gazî/ doz me, derdê me heye.' Wê demê dozger ji me re digot, 'herin malên xwe.' Li her der û deverê dinyayê ev hal heye, wan nehişt ku em çî tiştî bikin."¹⁰²

Sîstema cerdevantiyê ya ku di sala 1985'ê de hatibû têtbiq kirin, ji aliyê xizmên wendayan ve, wekî sedema van rûdawan hate aşkîra kirin. Li gor wan kesan cerdevan hem sedema van

¹⁰¹ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

¹⁰² Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

rûdawan bûn û hem jî akter bûn. Di rûdawên wendakirinan de egera wendakirinê her tim xwe disparte redkirina cerdevantiyê. Jixwe ev sîstem nîşaneyê muhkem kirina desthilatiya dewletê ya li bajarên Kurd bû. Li gor Balta Pakerê ku gotinên Vedat Yenererê ku di salên 90'an de rojnamevanî kiribû, neql dike, "Jixwe li gundan xebera herkesî ji hevdu heye, cîran wekî din jî nas û xizmên hevdu ne. Heger kesek nas û cîranê xwe îxbar neke, ew wekî alîgir tê qebûl kirin. Bi taybetî jî heger ew cerdevantiyê qebûl neke, ew wekî sempatîzanê PKK'yê tê pejirandin."¹⁰³ Ji ber wê jî, qebûl kirina cerdevantiyê, tê maneya destek dayîna dewletê. Di gelek nimûneyên wendakirinên ku me dixwest agahiyan jê werbigirin de, bi taybetî jî giregir û serekên eşîran, wextê ku cerdevantî qebûl nekirin, piştî wê hatin wenda kirin. Lêbelê, ji ber ku xizmên wendayan bi zimanê xwe dikaribûn derdên xwe îfade bikin, wan her dixwestin ku biçin cem cerdevanan. Gellek xizmên wendayan, piştî wendakirinan nediçûn cem wezîfedarên dewletê yan cendirmeyan. Ev yek jî nîşan dike ku, ev pêwendiyên herêmî, her tim li pêş eleqederiya bi dewletê re bûye. Her çend gellek kes ji aliyê cerdevanan ve hatibin wendakirin jî, piştî wendakirinan xizmên wendayan bo aqûbeta nasên xwe nediçûn cem sazîyên dewletê. Gellek kes ji ber ku cerdevan bêhtir nêzî xwe ditîtin, ji bo alîkariyê her tim diçûn cem cerdevanan.

Li Cizîrê, em dibînin ku, Kamil Atak, ji vê lêgerîna xizmên wendayan bi dek û dolaban qezenc kirine. Sercerdevan Kamil Atak, di hilbijartinên 27'ê Adara 1994'ê de, payeya şaredariya Cizîrê wergirt. Wendakirin, herî zêde di sala 1994'ê de qewimîn. Di gellek hevpeyvînan de, bêjedaran aşkira kir ku, dema ku Kamil Atak amadekariya hilbijartinan dikir, bo ku bê hilbijartin, soza dîtina mirovên wendabûyî dida Cizîriyan. Her ji ber wê jî, stratejiya wendakirinê, maf û îmtiyazên berfireh dide îcrakarê vê stratejiya dewletê ku paye û wezîfeya xwe pê diparêze.

Bi tenê Kamil Atak ji vê şopgerîna xizmên wendayan pere qezenc nedikir. Ji bilî wî, hinde kes hebûn ku bi mebesta nîşandana mirovên

wanê wenda, pere ji malbatên wendayan dixwestin. Gellek malbatan bi vê niyet û mebestê, hemû mal û milkên xwe dabûn wan navbeynkaran ku, mirovên xwe yê wendabûyî peyda bikin. Ev pereyê bazirganiya veşartî, yek û yek teslîmî kiryarên van wendakirinan an gumanbaran dibû.

*"Ez û birayên min tev birin. (...) Du kes hatin wê derê, çekên wan hebûn, lê sivil bûn. Ji me re gotin 'Mehkemeya Nisêbînê gazî we dike, divêt hûn bi me re werin.' Me got 'temam'. Em siwarî erebeyê bûn û çûn Nisêbînê. (...) Cihekî nêzikî termînalê hebû, li wir leşkeriya hebû, em birin qereqola wir. Ji min re gotin 'çi kesî re çi tiştî nebêjin, divêt tu ji me re 100 milyon bînî. Wextê te ew pere ji me re peyda kir, piştî wê emê birayê te berdî. Me ji wan re got 'temam'. Dema ku em ji bo ku pere teslîm bikin çûn cem wan, (...) ji me re gotin 'li wir bisekinin, emê herin birayê te bînin.' Paşê me got, 'pere jî çû bira jî çû.' Divêt me pere neda wan. Ew çûn û êdî hew çûn."*¹⁰⁴

Şêweyê perexwestina ji malbat û xizmên wendayan, ji bilî encama wê bi halê malbatan ê madî û aborî re girêdayî ye. Ji dewlemendan zêde pere dihat xwestin. Û dîsa piştî vê pêwendiya civakî ya ku li ser xwestina pereyan durist bûyî, şikl û awayê lêgerînê jî diguhure. Hinde kes hene ku bi van pêwendiyên xwe digehînin gellek meqam û kesên dîtir; hinde kes jî hene ku bi tena serê xwe û bi îmkanên xwe li pey şopa xizmên xwe yê wendakirî dikevin. Piştî ku Yusuf Kalenderoğlu, Mehmet Dansık û Ahmet Dansık di sala 1995'ê de li Silopiyayê tîn wendakirin, hema hema hemû gundiyan Nehrîvanê, yê ku demekê Mehmet Dansık û Yusuf Kalenderoğlu jî lê mixtarî kiribûn; bi tenê ji bo wendayan serî li Femandariya Cendirmeyê ya Silopiyayê dan. Heger kesek an malbatek pêwendiyên bi vî rengî nikaribe peyda bike, nemaze jî ew jin be û xwedîkirina zarokan divê be, mesûliyeta wan zarokan car û bar dibû egera astengiyên lêgerînê.

"Zarokên min digotin 'dayê, em dernekevin, dê me bikujin'. Ew zarokên min şeş salan derneketin

103 Balta Paker, E., 2010:419

104 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 12.10.2012

derve. Nediçûn cihekî ku bi zarokan re bileyzin. Min ji wan re digot 'ezê biçim dikanê, nan bikirim' ew ditirsyan û digotin 'neçe dayê, neçe dê te jî bikujin, kê dê li me xwedî derkeve.' Ez serê sibehê şiyar dibûm, min didît ku li ber derî gellek balîf hene. Min digot 'kurrê min' ev çi balîf in? Wî balîf û nivînên xwe dibirin ber derî, wesa rêz dikir. Serê wan li erdê bû, min ji wan re digot, 'kurrê min te çima ev balîf deynîne vir', wan digot 'dayê em ditirsin, heger şevekê werin û te jî bibin û me bikujin dê çi bibe?' Qey ew balîf li wir bin ew nikarin têkevin hindurê malê."¹⁰⁵

"Zarokên min nehiştin ez biçim, her sêyan jî ez hambêz kirim û girin. Gotin 'dayê neçe, dê te jî bibin.'" ¹⁰⁶

Wekî me di serê serî de jî aşkira kir, sedema stratejiya wendakirinê, tirsandina mirovan e û pê re belavkirina tirs û xofa nav mirovan e. Piştî wendakirinan, proses û qonaxên şopgerîna wendayan, gef û tehdîten curbicur li ser xizmên mirovan ferz dikir. Ev yek bi awayekî eyan û beyan ji aliyê Hasan Karakoçê ku birayê wî Rıdvan Karakoç hatibû wendakirin ve terîf bû. "Di têkoşîna şopgerîna aqûbeta mirovên wenda de, qebûl kirina wendahiye, potansiyela wendabûnê li ser mirov bi xwe ferz dike."¹⁰⁷

"Sê-çar caran, texsiyeke spî û marqeya wê Reno bû, jixwe plakaya wan her tim dihat guhertin, li sûkê bi tampona erebeyê li min xistin û ji min re gotin 'rojên te jî pîr kêman mane.'... Û rojekê dîsa li vê kuçeyê dora min pêçandin."¹⁰⁸

"Bedran du caran riya min girt. (...) Li wir polîs tunebû. Heger xelk li wir nebûna û erebe di wir re derbas nebûna, dê min jî bibirana û bikuştana. (...) Belê ji min xwest ku ez dev ji daxwaznameya xwe berdim. Min jî ji wan re got ez dê dev jê neberdim."¹⁰⁹

¹⁰⁵ Hevpeyvîn: Stenbol / 25.07.2012

¹⁰⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 02.09.2012

¹⁰⁷ Hevpeyvîn: Stenbol / 06.10.2012

¹⁰⁸ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

¹⁰⁹ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

Rûdawên bi vî rengî gellek in. Gefxwarina weha, bi çavekî îro dibe ku li ser xizmên wendayan di rêka şopgerîna mirovên xwe de tesireke berbiçav nîşan nekiribe. Lêbelê, diyar e, dibe ku ev çavtirsandina xizmên wendayan bi tenê ji nimûneyên Silopiya û Cizîrê pêk tê. Ev peygerîna şopa wendayan, an jî xîreta lêgerînê di rastiyê de ji bo xelaskirin an rizgarkirina wendayan bû. Û helbet di navîna mehekê de, ev qonax û proses xelas dibe û lêgerîneke din destpê dike.

Şikandina Hêviyan: Ew Sax e An Na?

Berfo Kırbayır 105 salî bû, hestiyên kurrê wê yê Cemil Kırbayır û sozê ji bo wê hatibûn dayîn, bi cih nehat û wê wefat kir. Heta ku ew sax û silamet bû, deriyê mala wê, bi mebesta ku rojekê kurrê wê Cemil dê vegere, her tim nedihat dadan. Wê her tim digot, 'ez dixwazim hestiyên kurrê xwe bibînim'. Ev yek jî nîşaneya hêvîdariya wê bû. Motîvasyona wê her tim bi hestên 'gelo ew sax e an na' ve dom kir û ew her tim gumanbar bû ku gelo kurrê wê diji an na?

"Zarokên min deh salan her pîrs kirin û gotin bavo li ku derê ye? Gelo çi hate serê wî? Erebeya me wî çaxî spî bû, pênc salan wextê me erebeyeke spî bidîta ew her tim diseqinî. Digot gelo ew ji erebeyê derkeve û bibêje 'tu diçî ku derê?' Pênc salên me bi van hêvî û xeyalan bihurî. Wextê ku zengila me lê dixist, em ditirsyan ku xebereke nexweş ji me re bibêjin. Nizanim, ew bibêjin li vir hatiye kuştin, li wir hatiye defînkirin. Em diseqinîn, em pîr sekinîn."¹¹⁰

"Ew ne aşkira bûn, loma dilê me nerehet bû. Mêzê bike, niha jî hinde erebe derbas dibin, wextê ew frên dîkin û diseqin, ez dibêjim qey ew hatiye û dê jî erebeyê derkeve. Bawer bike çend caran weha bû, ev çend sal in, yanî di saet yek û diduyan de wextê erebe, panzêr û erebeyên dewletê derbas dibin, ez dibêjim wa hatin, dê xwarziyê min niha bînin ber derê daxînin. Ez hîn jî xeyala hatina wî dikim."¹¹¹

¹¹⁰ Hevpeyvîn: Stenbol / 10.08.2012

¹¹¹ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

"Ez dê îlla biçim İzmîrê, ji min re cihê wî gotin, ez dê wî bibînîm, weha em li pey wî ketibûn. Ji bo wê jî, min dayika xwe ji vê meseleyê bi dûr xist û nehişt ku ew zêde têkeve nav xem û xeyala wî. Lêbelê ez hîn jî bawer nakim ku ew hatiye kuştin. Wextê kesek telefonê vedike û dengê xwe nake, dayika min her dibêje gelo ew e an na. Yê ku telefon vekiribû, qaşo ew bû. Min her şîretên xwe lê dikirin. Jê re digot, vegere were, min jê re her tişt got. Lê paşê qala wî ji min re kirin, doh êvarê dîsa telefon vekir, filan û bêvan."¹¹²

Piştî ku ew qas dem di ser wendakirinan re bihurî, em hêdî hêdî dibînin ku xizmên wendayan, her çend cesedê wan nebînin jî, êdî mirinê qebûl dikin... Êdî mecbûrî qebûl kirinê ne...Lêbelê ev nayê maneya devjêberdena şopgerîna wendayan. Lêgerîn ji aliyê nîfşên nû ve jî tê berdeyam kirin. Heger zarokên wendayan hebin, ew piştî demekê dibin akterê lêgerînê. Her çend jê hindêk bi bîr neynin jî, tiştê ku ji wan re tê gotin, piştî demekê dibe çîrok û serencama wan bi xwe. Yek jî di hevpeyvînan de hinde zarok hene ku, ew jî bi van serboriyan dihesin, bi der û dor re parve dikin û piştî demekê bi wêrektî bi meseleyê re eleqeder dibin. Em niha baş nizanin ku barê wan hilgirtiye ser milên xwe, gelo dê bibe sedema çî rûdawan û çî maneya xwe hebe.

Têkoşîna Kolektîvî

Wekî li her der û deverê dinyayê qewimî, li Tirkiyeyê jî têkoşîna xizmên wendayan, êdî belavî kuçe û kolanan bûye. Komeleya Mafê Mirovan, di sala 1992'ê de kampanyeyê di derbarê wendakirinan de li dar xist. Ev kampanya, li Tirkiyeyê yekem kampanyaya di derbarê wendakirinan de bû. Sê sal piştî wê, di sala 1995'ê de, Komeleya Mafê Mirovan li gel Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê rêkxirawiyê berfirehtir pêk anî.¹¹³ Dîsa aktîvistên mafê mirovan û xizmên wendayan, cara yekem 27'ê Gulana 1995'ê de, li Qada Galatasarayê

çalakiyê bi navê 'Çalakiyên Şemiyê' li dar xistin û piştî wê arîşeya wendakirînê, li Tirkiyeyê bêhtir ket nav rojevê. Li Stenbolê, Hasan Ocak, 58 roj piştî wendakirînê, cesedê wî yê îşkencelêkirî li goristana bêxwediyar hate dîtin; dema ku xizmên Hasan Ocak li pey şopa cesedê wî ketibûn, Rıdvan Karakoç jî hate wendakirin; dîsa di wê demê de Ayşenur Şimşek jî hate wendakirin. Piştî van wendakirinan, nêzî 50 rêkxistinên mafê mirovan û xizmên wendayan hatin gel hevdu û li pey şopa wendayan ketin. Wan bi tecrûbeyên li Arjantînê yên ku Dayikên Plaza de Mayo dabû destpê kirin, bi awayekî periyodîk û wekî çalakiyê bêdeng, di 27'ê Gulana 1995'ê de li Qada Galatasarayê bi şîara "bila wenda bêne dîtin, berpîrsên wê bêne darizandin." rûniştin û bizavên dîtin dan destpê kirin. Ev çalakî 200 hefteyan berdeyam kir. Lêbelê, ew sal hîn jî stratejiya wendakirînê berdeyam dikir û çendîn ev çalakî diketin rojevê, ew qas jî polîtîkayê astengkirina vê çalakiyê dihat li dar xistin. Piştî van fişar û zextiyar xizmên wendayan, bi şîara ku "ji bo me her der Galatasaray e, em dê li her derê li pey şopa wendayên xwe bikevin" di 13'ê Adara 1999'ê de navber dan têkoşîna xwe.¹¹⁴ Piştî ku îdînameya Ergenekonê di sala 2008'ê de hate amade kirin, di 31'ê Rêbendana 2009'ê de çalakiyên wan careke din hate destpêkirin. Li dor behsa lêpîrsînê, piştî ku berpîrsên wendakirinan hatin darizandin, ev çalakî jî bi awayekî mecbûrî hate meşandin.

Di serdan û hevpeyvîna me de, hate destnîşan kirin ku, di destpêkirina çalakiyên Şemiyê yên li Cizîrê de, faktera herî girîng, destpêkirina doza Temizöz û Yê Din a sala 2009'ê bû. Xizmên wendayan, bo teqîbkirina dozê ya li Amedê çûn ber dadgehê û dest bi çalakiyên xwe kirin. Di sala 2011'ê de, komek parêzer û aktîvistên mafê mirovan ên ku doz teqîb dikirin, bi xizmên wendayan re civînek pêk anî û di 29'ê Rêbendana 2011'ê de biryara destpêkirina çalakiya şemiyê, yekem car li Cizîrê dan.¹¹⁵

¹¹² Hevpeyvîn: Stenbol / 25.06.2012

¹¹³ Öndül, H. "Zorla Kaybedilme", 2011. <http://ihd.kardaizler.org/index.php/makaleler-mainmenu-125/2376-zorla-kaybedilme.html>

¹¹⁴ Hevpeyvîna bi Maside Ocak re <http://www.siddethikayeleri.com/portfolio/her-kayip-yakini-sevdiginin-son-sozunu-bilmek-ister/>

¹¹⁵ Hevpeyvîn bi Veysel Vesek re-nûçe. <http://hakikatadalethafiza.org/duyuru.aspx?NewsId=118&LngId=1>

Xizmên wendayan îro li Stenbol, Amed, Batman û Cizîrê, her roja şemiyê bi wêneyên mirovên xwe yên wenda ve, li qadan çalakîyên xwe berdewam dikin.

*"Ji bo min tiştê herî mezin, firsenda herî mezin, ew Galatasaray bû. Ev fikra min e, ez wesa dibêjim, tiştê herî mezin ew bû divêt me dev ji Galatasaray berneda. Heger me ew çalakî dewam bikira, wî çaxî çî kes nedihat wendakirin. Yanî ez dibêjim bila çî kesî wenda nekin. Ev fikra min e. Ya din jî, wextê ew sûret û wêne ji wir rakirin ax... Yên ku îşkence li wan kirin, ew bi têlan xeniqandin, naylon helandin ser bedena wan, dibe ku rojekê ji jana wijdana xwe bimirin, û bibêjin, belê min ew mirov kuşt, ez cihê wî dizanim. Dibe ku rojekê gora wî li me nîşandin. Ji bo wê jî Galatasaray ji bo min pirr girîng e, ez naxwazim dev ji wir berdim."*¹¹⁶

Xanim Tosun, wextê ku wêneyê mêrê xwe radikir, hîn jî hêvî dikir gelo kesekî/e were û cihê mêrê wê jê re bibêje an na. Ev têkoşîna xizmên wendayan ên rêkxistî û kolektîv, vê meseleya wendakirinê hem naxe nav konteksteke şexsî, hem jî bo dengvedena têkoşîna wan jî çalakiyeke girîng e. Lêbelê di hevpeyvînên me yên li Stenbol, Cizîr û Silopiyayê de, hate fehmkirin ku, maneya çalakiya Şemiyê ya li Stenbolê ji bo xizmên wendayan cudatir bû. Me di derbarê 69 wendayan de bi xizmên wendayan re axaftin kir. Ji wan 69 kesan, bi tenê 7 kes li Stenbolê hatine wenda kirin. Di 6 hevpeyvînên me yên li Stenbolê de jî, ew xizmên wendayan ên ku bi me re axifîn piştî wendakirinan koçberî Stenbolê kirine. Piştî ku ew hatin Stenbolê, wan gellek xerîbî kêşa û şertên Stenbolê yên aborî ew her şerpeze kirin. Ji bo wê jî, Qada Galatasarayê cihê mirovên wekî wan bû.

"Wextê em diçin wir, dilê me pê xweş, bêhna me pê fireh dibe, em dizanin ku herkes wekî me ji bo wendayên xwe li wir in. Gora me nîne, dema ku em li wir hevdu dibînin... Derd û kulên me yek in. Ez rast bibêjim, wextê ez diçim wir, dilê min rehet dibe. Ew jî wekî min in, derdê wan jî yek e. Em naçar in, cihek tune ku em biçinê. Em çûn kuderê,

116 Hevpeyvîn: Stenbol / 25.08.2012

*me berê xwe da çî dergehê, her tim derî di ser me de hate dadan."*¹¹⁷

Li Cizîrê çalakîyên xizmên wendayan ji 100 hefteyan zêdetir berdewam dike, ji bilî çalakîyên li Stenbolê, ji palpiştiya parêzeran, aktîvîstên mafê mirovan û saziyên civaka sivîl bêpar û mehrûm man û niha bi tenê bi dilsoziya xizmên wendayan didome.

Ew û ji wan bêhtir jî jin, li ber Lîseyê Cizîrê, berê xwe didan qereqolê û li wir kom dibûn. Li Cizîrê yên ku kom dibûn, bi tenê xizmên wendayan nînbûn. Lêbelê li herêmê mirov nikare ferqa wê diyar bike û cudahiya vê yekê ji xelkê re îzêh bike. Hemû kiryarên wendakirinê diyar in, lêbelê ji bo wan êdî çî kes nemaye. Hestiyariya li Cizîrê wekî ya Stenbolê bi xurt nînbu. Ji ber ku li Cizîrê di her malekê de serboriyeke wendakirinê heye. Lêbelê li Cizîrê zêdebûna serboriyan, ji aliyê xizmên wendayan ve nehatiye pejirandin. Her weha ew mecbûr in ku her li pey şopa aqûbeta mirovên xwe bikevin.

*"Em mecbûr in li mirovên xwe bigerin, ma ne wesa ye birayê min. Em îro wan mirovên xwe dixwazin, heqê me heye, em niha çî bikin heqê me heye. Îro ji me re bibêjin rojên Şemiyên wêneyan werbigrin û biçin çalakiyan, em dê biçin. Em çûn Silopiyayê, me wêneyên wan nîşan kir, sê caran jî em çûn Diyarbekirê û me li wir jî wêneyên wan bi xwe re birin. (...) Çimkî ez dixwazim mêrê xwe bibînim, min çî neheqî li kesekî/ê nekiriye. Ez mêrê xwe digirim. Ez mecbûr im ku li pey wî biçim."*¹¹⁸

3) Dadmendî

Ji bo xizmên wendayan, têkoşîna dadmendiyê ya bo wendayan, dabeşî du qisman dibe: beriya 2008'ê û piştî wê. Di beriya sala 2007'ê de, ji çî dozekê netîceyek derneket, her weha piştî sala 2007'ê, bi taybetî jî piştî doza Ergenekonê, rûdawên salên 90'an dîsa li dor behsa wê dozê de kete rojevê. Di sala 2008'ê de, bi girtina Veli Küçük ve ku ew li devera Kurdan jî pirr dihat

117 Hevpeyvîn: Stenbol / 10.08.2012

118 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 02.09.2012

nasîn, daxwaza berfirehtir kirina doza Ergenekonê ya 'rojhilata çemê firatê' zêdetir bû. Piştî wê, doza Ergenekonê bi taybetî jî di demê pêşîn de, bû egera kelecaneke. Di Adara 2009'ê de, bi serlêdana baroya Şernexê, di Tesîsên Sînan û bîrên BOTAŞ'ê de vedan û kolanek hate kirin û jê hestiyên gellek kesan derketin.¹¹⁹ Baroya Şernexê, wê demê 120 daxwazname berhev kir û dest bi doza kiryarê nediyar kir. Her çend gilî û şikayet hatibin kirin jî, çi encam nehat bi dest xistin û ew dosye jî jinûve hatin rojanekirin.

Doza Ergenekon û Balyozê

Wextê ku doza Ergenekonê destpê kir, xizmên wendayan jî, dest bi teşebûsan kirin. Îslam Zeyrekê Birayê Mursal Zeyrek, ku ew di Pûşbera 1994'ê de hatibû wendakirin, hîn bû ku, Serdar Öztürk, di doza Ergenekonê de hatiye wergirtin û tê darizandin. Îslam Zeyrek, pêwendiyên Ergenekonê, di hevpeyvîna me de weha terîf kir:

*"Serdar Öztürk ev dosyeya kuştinê hazir kiribû û teslîmî Kenan Topçuyê Fermandarê Cendirmeya Sînor a Xebûrê kiribû. Jê re gotiye 'wextê lazimî çêbû, tu dê vî mênîki teslîmî min bikî.' Ez dibêjim tê wê maneyê, wesa ye belê (...) Çimkî Serdar Öztürk ew dosye hazir kiribû. Ew û fermandarê Cendirmeya Sînor a Xebûrê Kenan Topçu mirovên hevdu bûn. Mesela Serdar Öztürk çend salan li wî welatê kar kiribû, lê çi kesî ew nas nedikir. Em dizanin eleqeya wî bi kê re heye. Bi qasî ku em dizanin, ev mênîk lehengê Tansu Çiller a ku kuştin li ser Kurdan ferz kiribû bû. Ev jî ji zarokên wê yê baş bû. Bi rastî jî ev û cihê wî ye kar, kifşe nînbû, ritbeya wî diyar nînbû. Ew xwe wekî Serpel/Üsteğmen nîşanî herkesî dike. Ew xwe wekî fermandarê beşa Erenê bi xelkê dide nasîn, lêbelê derket ku ew mirovê Ergenekonê ye, dijminê vî welatî ye."*¹²⁰

Wextê ku Îslam Zeyrek hîn dibe ku Serdar Öztürk, li dor behsa doza Ergenekonê tê wergirtin, ew

¹¹⁹ "Di vokolana BOTAŞA Silopiyayê de, hestiyên mirovan û pirtî hatin dîtin", *Bianet*, 10ê Adara 2009, <http://bianet.org/bianet/bianet/113040-silopi-botas-kazisinda-kemikler-ve-bezler-bulundu>

¹²⁰ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

diçe gel Baroya Şernexê û bi palpiştîya wan daxwaznameyekê bo dahilbûna dozê dide Dozgeriya Cimhûriyetê ya Silopiyayê. Çi bersivê nadin wî. Koçer Saluciye ku endamê tîma JITEM'ê bû, xwe wekî bi navê Cindî Salûcî dabû nasîn û ji ber ku ew ji doza Ergenekonê hate wergirtin, gellek kes bi wê şad û bextewar bûn. Lêbelê paşê Saluci tê berdand û ew niha jî hîn li Silopiyayê dijî.¹²¹ Her ji ber van geşepêdanên doza Ergenekonê, kelecana xizmên wendayan a ku bi dozê rû dabû, piştî ew doz negiha ser behsa wendakirinên Şernexê û ew şamil nekir, xizmên wendayan jî ji dozê sar bûn û hêviyên her ku çû bi dozê neman. Lêbelê divê em li vir aşkira bikin ku, her çend hêviyên wan kêmbin jî, xizmên wendayan, her tim tevî doza Ergenekon û Balyozê ya ku bi taybetî Cemal Temizöz, Veli Küçük û tîmên JITEM'ê jî di nav de dihatin darizandin, dibûn.

Dosyeya Cemal Temizöz û Yê Din

Piştî sala 2009'ê geşepêdaneke girîng rû da û dosyeya Cemal Temizöz û Yê Din bû babeta dozê û gellek berpîrsê wendakirinên li Cizîrê hatin darizandin. 8 bersûcên wê dozê hebûn: Cemal Temizöz, Kamil Atak, Temer Atak, Adem Yakın, Fırat Altın (Abdullah Güven) Hıdır Altuğ, Kukel Atak û Burhanettin Kıyakê ku demekê di nav tîma darizandinê de bi cih girtibû û ew di Gelawêja 2012'ê de tevî doza Cemal Temizöz û Yê Din bû. Heta Sibata 2013'ê jî hîn Cemal Temizöz, Burhanettin Kıyak, Adem Yakın, Fırat Altın (Abdulkakim Güven) û Hıdır Altuğ bi girtî tîm darizandin. Me bi malbata 7 wendayên ku navê wan di dosyeya Cemal Temizöz û Yê Din de derbas dibin re hevpeyvînek kir. Navê wan wendayan: Abdullah Efelti, İhsan Arslan, İzzet Padır, Abdullah Özdemir, Süleyman Gasyak, Ömer Candoruk û Mehmet Acar bû. Hemû malbat rûniştina/celseya doza Cemal Temizöz û Yê Din hîn jî bi rêkûpêk teqîb dikin. Bi tenê xizmên wendayên ku navên wan di dosyeyê de hene na, xizmên wendayên din jî dozê û rûniştina wê teqîb dikin. Doz li Dadgeha Cezaya Giran a Amedê tê dîtin; loma jî malbatên wendayan bo dadgehê her

¹²¹ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 02.12.2012

û her ji Cizîrê tên Amedê. Malbatên wendayan bi zor û zehmet vê dozê dişopînin. Bi tenê ne xizmên wendayan, malbatên mexdûrê înfazên sivîl û kêyfi jî, her û ber vê dozê dişopînin.

Doza Temizöz û Yên Din, ji bo fehmkirina rewşa hiqûqê li Tirkiyeyê û sosyolojiya hiqûqî nimûneyeke girîng e. Me di serî de, di sala 2011'ê de, bi deweta TESEV'ê ya ku projeya şopandina doza Temizöz û Yên Din, li gel saziyên civaka sivîl teqîb kir. Piştî me bi ser navê Navenda Bîrgehê her hewl da ku rûniştinên dozê teqîb bikin. Ew rûniştinên dozê ji bo têgehiştina pêwendiyên di navbera kiryanan, xizmên kiryanan û xizmên wendayan de jî girîng bû. Xizmên Kamil Atak û mirovên eşîra wî jî wekî xizmên wendayan, ji bo palpiştiya Kamil Atak tevî her rûniştinên dozê bûn. Kamil Atak û nas û xizmên wî, di her rûniştina dozê de, gef û tehdîtan li xizmên wendayan û parêzerên ku dahilî dozê bûne dike. Gazinkarên/miştêkî ji eşîra Keçanê yên ku li dor behsa dozê îfade didin. Ew îdiayên xizmên wendayan dispêrin neyartiya di navbera eşîra Keçan û Tayanê û loma wan wekî îftîrayan/ tawanbarkirinan qebûl dike. Ji ber ku lijnaya dadgehê, destûrê dide bo axaftina gazinkaran, ew jî her protestoya vê yekê dike. Ew di rûniştinan de ji parêzeran re dibêje 'Di nav parêzeran de kesên ji eşîra Keçanê hene, ew di nav ewran de bin jî, ez dê wî bibînim û şîmaqan lêxim' û her tim gef û tehdîtan li wan dike. Rewşa rûniştinên dozê û tehdîtan li parêzeran tên kirin û bo ku rûniştin bi rêkûpêk û edîlane bidome, Rêxistina Çavdêriya Mafê Mirovan (Human Rights Watch) di sala 2012'ê de raporeke bi navê Dema Dadmendiye weşand û ew bo vê babetê daneyeke girîng e.¹²² Kamil Atak di îfadeyên xwe yên dadgehê de, her tim xwe bi hevkarîya dewletê ve li dijî PKK'yê şer dike, dida nîşandan û parastina xwe li ser wê esasê durist dikir. Wî ji dozgeran dixwest ku ji ber vê hevkarîya bi dewletê re divêt ew neyê darizandin. Ew pirr hêrs bibû, wextê ew li dadgehê bû û bi taybetî jî şerekî giran di sala 2012'ê de rû dabû, ji dozger re got 'ez li vir tîm darizandin, lê mirovên min niha ji bo

¹²² Human Rights Watch, Dema Dadmendiye, 2012, Stanbol. Bo hemû metna raportê bnr. <http://www.hrw.org/sites/default/files/reports/turkey0912tuwebwcover.pdf>

dewletê bi PKK'yê re şer dikin, ev neheqî ye.' Ew bi hinde îtirafkaran re, avakirina çeteyekê ve dihat tawanbar kirin, ev yek jî ji bo 'feodalekî' wekî dihat maneya zilm û zordariyê. Temizöz di parastina xwe de, her tim kar û emelên xwe disparte polîtîkayên dewletê yên wê demê û qaşo haya dewletê bi hemû kar û şixulên wî hebû. Li gor derbirrînên wî yên dadgehê, sedema darizandina wî, nakokî û berberîya wî ya bi tevgera Fethullah Gülen re bû. Wekî Kamil Atak, ew jî îdîa dike ku neheqiyek lê tê kirin.

Xizmên wendayan, hemû rûniştinên dozê bêdeng û 'bi nifiran' teqîb dikin.¹²³ Li gor agahiyên parêzerên midahilê dozê bûne, ew kesên ku bo piştgiriya Kamil Atak tên dadgehê, di rastiye de, ne ji bo destek dayîne tî, ji ber ku ew ji heman malbat û eşîrê ne, divêt ew car caran bî û xwe li kesên wir bidin nîşandan. Her weha gellek kesên ku ji bo piştgiriya Kamil Atak tên dadgehê û dozê teqîb dikin, di rastiye de piştgiriya xizmên wendayan dikin û ev yek gellek caran ji xizmên wendayan re hatiye gotin. Gellek caran jî, ji xizmên wendayan xwestine ku, ew dev ji têkoşîna xwe bernedin û her çavdêriya meseleyê bikin. Xizmên wendayan, hem ji bo darizandin û zelalkirina dosyeya kiryarê nediyar, hem jî ji bo maneya dozê ya sembola wendayên Şernexê, tevî hemû rûniştina doza Cemal Temizöz û Yên Din bûne. Wextê ku me ji wan pirs kir ku gelo çî hêviyên wan ji dozê û encama wê hene, Şahin Kalenderoğlu di derbarê Yusuf Kalenderoğluyê ku di 22'ê Sibata 1995'ê de li Silopiyayê hatibû wendakirin, ev tişt gotin:

*"Welle em niha dixwazin û hêvî dikin ku herkes jî heman tiştî hêvî dike. Yanî em naxwazin Cemal Temizöz û ekîba wî were berdan, em naxwazin ew li derve bin û bi rehet bigerin. Ev yek mirovan pirr diêşîne û heger dewlet adîl be divêt wan serbest bernede. Yanî divêt hesabê her tiştî ji wan bê standin. İnşallah dê wesa be, hêviya me ew e."*¹²⁴

Ji bilî Kalenderoğlu, hemû xizmên wendayan,

¹²³ Beyanên xizmên wendayan ên di dema rûniştina dozê de, 22.06.2012

¹²⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

dixwazin ku berpîrsên van rûdawan bêne cezakin û hesabê wendayan ji wan bèn pîrsîn. Lêbelê mirov nikare bibêje ew hêviya çareserkirina vê meseleyê dikin. Hema hema hemû xizmên wendayên ku me pê re hevpeyvîn kiribû, hêvî nedikirin ku çî encameke dadwerî ji vê dozê derkeve. Gellek bersûcên vê dozê negirtî dihatin darizandin, ev jî sedema vê bêhêviyê ya sereke bû; ji ber ku di rûniştina 21'ê Berfenbara 2012'ê de, biryar hat dayîn ku Kamil Atak dê negirtê bê darizandin, parêzerên dahilî vê dozê bibûn zêdetir bêhêvî man.¹²⁵ Kamil Atak û cerdevanên din, şeva ku Kamil Atak serbest bû, li Cizîrê bi çekan şad bûn û serbestberdana wî pîroz kirin.¹²⁶

Feraseteke Dadmendiye ya Mesîhane/ Messianic

Feraseta xizmên wendayan a dadmendiye, bi tenê bi doza Temizöz û Yên Din û darizandinekê ve nehatiye sînor kirin. Ew hemû dozên bi vî rengî û dosyeyên doza Temizöz û Yên Din, Ergenekon û Balyozê bi hişmendiyeke raçav dikin. Lêbelê; tiştên ku ew kes ji edalet, maf û hiqûqê fehm dikin, ji yên me hindekî cudatir in. Hema hema hemû xizmên wendayên ku me pê re hevpeyvîn kiribû, daxwaza darizandineke dadwerî ya kiryar û berpîrsên wendakirinê kiribûn; lêbele, hema hema hemûyan, çî hêvî nedikir ku ev mesele bi dadwerî were çareser kirin û berpîrsên wê cezayan bixwin. Kemal Mübarizê ku birayê Ömer Mübariz bû, di 2'ê Rêbendana 1994'ê de, li qereqola ser rîya Nisêbînê hat wergirtin û wendakirin. Ömer Mübariz û Kemal Mübariz, li Qereqola Cendirmeya Turgutluyê ji aliyê leşkerên ku xwe wekî 'tîmên îstîxbaratê' didin nasîn ve ragirî dibe. Ew kes Ömer Mübariz serbest dihêlin û ji bo berdana birayê wî yê Kemal jî 100 milyon lîrayê Tirkiyeyê dixwazin. Ömer Mübariz, bi birayekî xwe yê din ve, diçe termînalê Nisêbînê

¹²⁵ "Aktar'dan Kamil Atak Tahliyesine Tepki", *Yüksekova Haber*, 24'ê Berfenbara 2012'ê <http://www.yuksekovahaber.com/haber/aktardan-kamil-atak-tahliyesine-tepki-90857.htm>

¹²⁶ "Eski korucubası Kamil Atak tahliye edildi", *CNNTurk*, 22'ê Berfenbara 2012'ê, <http://www.cnntrk.com/2012/turkiye/12/22/eski.korucubasi.kamil.atak.tahliye.edildi/689686.0/index.html>

û wî pereyê teslîmî wan dike. Ömer piştî wê rojê, ne wan kesên ku pere jê standibûn dibîne, ne jî agahiyekê ji birayê xwe yê wenda hîn dibe. Ömer Mübariz ji bo hêviyên xwe yên di derbarê dadmendiye de ev tişt gotin:

"Ez dixwazim ku failên kuştinên nediyar bêne tespît kirin. Bila edalet hikm bike. Jixwe edaleta dewletê nîne. Edaleta dewletê wekî ya roviyan e. Heger tu mirîşkan teslîmî rovî bikî dê çî bike gelo? Em dixwazin ku bizanibin ka hestiyên mirovên me hene an na, em dixwazin ku bizanibin hestiyên wan niha li kuderê ne, çî bûne. Ew dê ji bo me baş bibe. Ji bilî wê çî daxwaza me nîne."¹²⁷

Li jêr di beşa *Wendayên Bêgor* de jî dê bête gengeşe kirin, lêbelê, ji bo xizmên wendayan, pêkanîna edaletê, bi tenê darizandina berpîrsên wendakirinê nîne; ji bo xizmên wendayan, dîtina hestiyên wendayan, nîşaneya duristbûna dadmendiye ye. Berî her tiştî dadmendî dîtina hestiyên zarok, mêr, xwarzî xizmên wan ên bêşûc û bêguneh ên ku hatibûn wendakirin e. Piştî jî darizandin û cezakirina berpîrsên van neheqiyân e. Hema hema ji bo hemû xizmên wendayan, heger edalet hebûya divêt sûcdarên doza Temizöz û Yên din, bêgirtî nehatibana darizandin, her weha divêt wan cezaya miebetê bixwaribana. Li gor xizmên wendayan, demên Şernexê yên salên 90'an, di nav atmosfereke bi tirs û xof de bihurî û serboriya wendayan jî, di nav wan şertan de hate pê. Piştî ku bersûcên doza Temizöz û Yên Din, hatin girtin, ew hindekî dilrehet dibin. Her ji ber wê jî ew daxwaz dikin ku, bila bersûcên dozê bi girtî bêne darizandin û beramberî kar û kiryarên xwe jî heta hetayê her di girtîgehê de bimînin.

"Em dewedarê wan in, heger ew bêne berdan, em vê qebûl nakin û dev ji vê dozê bernadin. Heger dewleta Tirk behsa edaletê bike, behsa qanûnan bike, divêt wan serbest nehêle. Ew bêne berdan, jixwe ev edalet nîne. Edaleta wan tune. Ez bang li dozger dikim (...) Çimkî ew bêşûc û bêguneh bûn û hatin kuştin û hatin veşartin. Mirovan hîn cenazeyên xwe nedîtine (...) Ew niha

¹²⁷ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 12.10.2012

di destê dewletê de ne, dewlet dizane ka li kuderê ne, cezayê wan heye, lê dewlet çi cezayê nade wan. Ev bû 3 sal ku, em her tim diçin û tîn, divêt dozgerê Diyarbekirê êdî vê çareser bike. (...) Heger dewleta Tirk ew negirtibana, me nikaribû ew sûcdar bikirana. Em ditirsîn. Me digot 'dê bêne û me jî bikujin.' Welleh ew niha bêne berdan, îhtîmal heye ku ew me bikujin jî. (...) Daxwaza me ew e ku ew neyên berdan. Divêt edalet weha be, lê ew êdî maye kêyfa dewletê, ev jî bi kêyfe nabe. Ew qas mirov diçin mehkemeyê, Wellah zikê min diêşe ji ber ku bîst roj şûnda mehkeme heye. Ez gêj dibim, dilê min radibe, bêhal û bêmecal dibim. Çi heqê Bedran û Hakim hebû ku van tiştan bînin serê me? Cemal Yüzbaşı, mirovê dewletê, edalet û qanûnan bû. Li lojmanan dinihêrî, berpîrsê edaletê bû. Heqê kî/ê hebû û yê kî/ê tunebû (...) Mêrê min çû, hîn jî ehliyet, nasname û eşyayên wî li cem Cemal Yüzbaşı bû. Ew dizanin ew niha li kuderê ne. Texsiya me jî ji me standin. Bedran, Hakim û Cemal Yüzbaşı hevalên hevdu ne, pereyê wî jî xwarin. Dewletê çima hesabê van tiştan ji wan nepîrsî? Wî çaxî her tişt di destê Cemal de bû. Hemû rûdawên li van der û deveran, ji aliyê Cemal ve hate kirin. Li Silopiyayê, li deriyê sînor û li her derê ji bo dijberiya PKK'yê fail her Cemal bû.¹²⁸

Li gor xizmên wendayan, ji ber ku ew kesên ku mirovên wan wenda kirin jî wezîfedarên dewletê bûn û yên ku niha darizandina wan dikin jî wezîfedarên dewletê ne, çi encameke adîl ji vê dozê dernakeve. Jixwe wextê ku ew kes hatin wendakirin, dewletê çi tişt li hemberî wê yekê nekir. Her çend duristkirina edaletê pêkan nebe jî, xizmên wendayan dê her vê dozê û vê têkoşînê berdewam bikin. Heta hetayê dê her bi rêxistî bitêkoşin û dest ji pêşîra kiryarên wan sûcan bernedin.

"Welleh, şebekeyên Bedran, Hakim û (...) Cemal Yüzbaşı pîrr bûn. Kûçikên wan gellek bûn. Hevalên wan pîrr bûn. Wan mêrên me wergirtin, gellek mirovên bêguneh kuştin. Erê Welleh, bi destê xwe kuştin. Heta ku em li ser rûyê dinyayê bin, em dê her tim ji Bedran û Hakim bi gilî û gazin bin."¹²⁹

128 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

129 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

Ew edaleta ku ew dê heta hetayê li pey bikevin, ji feraseta dadmendiya dewletê cudatir, wêdatir û zêdetir e. Wekî edaleteke mehşerî û mesîhane ye ku, mafê kesên bêşûc û bêguneh divêt bêne teslîmkirin û sûcdar û berpîrsên wan sûcan jî bêne cezakirin. Ev feraset di nav sîstema dadmendiya dewletê de pêkan nîne, lêbelê ew zêde dişibe feraseta Benjamîn a mesîhane ku di roja qiyametê de piştî serûbinbûnekê teslîm kirina mafên herkesî û wekî apokalîps û şoreşger.¹³⁰ Xizmên wendayan baweriya xwe bi vê feraseta mesîhane tînin, nîfşên nû jî bi vê bîr û baweriyê dihêvojin û dê her li ser van esasan têkoşîna xwe bidomînin û dibêjin: "Em dê di dinyaya din de jî dewakar bin. Ez dê di hizûra Xwedê de, dest biavêjim pêşîra wan. Li ba Xweda jî em gilî û gazinkarên wan in."¹³¹

4) Têgeha Niştîmanî/Hemwelatî

Xizmên wendayan, di hevpeyvînan de gellek çar bal kêşan ser nakoyên di derbarê mafên niştîmaniyê. Ew, neheqiyên wezîfedarên dewletê yên ku bi ser navê dewletê zirar dabûn wan û mirovên wan wenda kiribûn, qebûl nakin. Wan, mirovên xwe di şert û mercên devera OHALê de wenda kirin. Her ji ber wê jî, vê yekê wekî binpêkirina mafên niştîmaniyê qebûl dikin. Leyla Gasyak di derbarê vê yekê de ev tişt gotin:

"Welleh ez nizanim wan ji bo çi ew kuştin, aha mala min 100 metre nêzî qereqolê ye, va ye ev zarokên min in, ev jî nasnameya min e. Qaşa ez jî hemwelatî bûm. Min li karê xwe dinihêrî, mêrê min jî bazirganî dikir, çi sûcê wî tune bû; ew çima kuştin? Ez jî ji we pîrs dikim. Çima ew kuştin? Ji bo pereyan ew kuştin, em nizanin gelo ew kî bo kefareta çi kuştin."¹³²

Li gor hinde kesan jî ew kesên ku mirov wendakirin, divêt ew ji hemwelatîyê bêne avêtin û

130 Salzani, C. "Violence as Pure Praxis: Benjamin and Sorel on Strike, Myth and Ethics", 2008:23

131 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

132 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 16.10.2012

heger neyên avêtin dê pirr eyb bibe¹³³ Wan kesan tiştên nebaş kirine û divêt ji hemwelatîyê bêne derxistin, divêt ew wekî hemwelatî neyên qebûl kirin. Xizmên wendayan ên wekî Xanim Candoruk jî, wendayan wekî hemwelatî îfade dikin û balê dikêşin ser wê yekê. Xanim Candoruk, wenda wekî 'mîrovên vî welatî' qebûl kirin.

"Ew hemwelatîyê vî dewletê bûn. Min ev ji dozger re jî got. Ew dikarin min ji hemwelatîyê derxînin gelo? Min got 'ez jî hemwelatîya vê dewletê me.' Wî got 'dibe ku van mirovan mêrê te nekuştibe.' Min got qey dê bibêje 'ew ne mêrê te ye.' Min got 'çawa mêrê min nîne' û min qeyda xwe nifûsê li wî nîşan da. Em îftirayan navêjin wan. Her yekî pênc û şeş zarokên me hene. Pênc zarokên Leylayê, şeş jî yên min hene. (...) Hemû hemwelatîyên vê dewletê bûn. Mîrovên vir bûn. Ew ketibûn destê dewletê, mîrovên xerab nînbûn. Wan dizî nekîr, neheqî li kesî nekîr. Dewlet van tiştan ji me çêtir dizane."¹³⁴

Mafên Hemwelatîyê Yên Wekhev

Ev sih sal in, li gellek der û deverên dinyayê, gengeşeyeke struktural di derbarê niştimaniyê/hemwelatîyê û li dor behsa komên etnîk, kêmar/ekaliyet û mafên jinan, tînen kirin. Neheqiyên li dijî mafên kêmaran, an pênasîya cinsî û tandansa cinsî, car û bar, di nav gengeşeya pirçandî de tê kirin û bi tîgeha 'hemwelatîya makeqanûnî ya wekhev' tê gengeşe kirin. Gellek mafên hemwelatîyê yên wekî komên koçberan û kesên LGBT (Lezbiyen, Gey, Bîseksuel, Transseksuel) ji aliyê dewletên modern ve hatin bînpêkirin. Em vê meseleyê li dor behsa "mafên/daxwazên hemwelatîyê yên wekheviyê" bi nav dikin û bo bidestxistina wan mafan, ev gengeşe girîng e. Ji ber ku her mirov xwedî hizir û nerînen curbicur in û xwe aîdî grûbên civakî yên curbicur dibînin, her ji ber wê jî, divêt sînorê hemwelatîyê li ser esasên pirjimar û gelemperî bêne diyar kirin. Her weha ev gengeşe, li dor behsa bikaranîna mafên însanî, seheya civaka sivîl û cudahiya komên fikr û mirovan ava bû. Tabiyeta mirovan a

¹³³ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

¹³⁴ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

netew-dewletê vê yekê dixwe meseleyeke maf û edaletê.¹³⁵

Li Tirkiyeyê ev babet, bi taybetî jî li dor behsa arîşeya Kurd, hem di warê siyasî û hem jî di warê akademîk de, bû egera geşepêdanên gewre. Tevgera Kurd, daxwaz kir ku terîfa hemwelatîyê, ji sînorê etnîk bêne derxistin û di nav makezagonê de bi wî rengî bêne terîfkirin.¹³⁶ Tîgeha hemwelatîyê di hevpeyvînen me yê li gel bêjedaran de, bi taybetî jî piştî berteka li dijî praktîkên dewletê yên bînpêkirina mafê mirovî, derket holê.

Xizmên wendayan, xwe jî wekî hemwelatî dibînin û ew reaksiyona wan a li dijî van praktîkan, piştî kar û kiryarên dewletê rû dan. Xizmên wendayan, wendakirina hemwelatîyan a ji aliyê dewletê qebûl nakin û vê muemeleyê wekî derqanûnî qebûl dikin. Wekî din jî ji kesên ku bi van serboriyên wan re eleqeder dibin, daxwaza qebûlkirina vê yekê dike. Her weha, her çend ji aliyê dewletê ve neheqî li wan hatibin kirin jî, ew dîsa xwe wekî hemwelatîyên Komara Tirkiyeyê qebûl dikin û bertek û îtirazên xwe li ser van esasan dikin. Loma jî du fonksiyonên terîfa hemwelatîyê derdikevin holê. Li aliyekî, Şernexî xwe wekî hemwelatîyên vê dewletê dibînin, û mafên xwe jî wekî her mirovekî li vî welatî dijîn, qebûl dikin û ev mafên wan tê bînpê kirin, li aliyekî din jî, dewlet her çend normên qanûnî ji bo hemû hemwelatîyên xwe durist dike, lêbelê li gor wan esas û rêgezên hiqûqî tevnagere. Xizmên wendayan, arîşe û dubendiyên li ser tîgeha dewletê bi pîrsekê krîstalize dikin: kuştina wan mirovan, kefareta çî bû?

"Belê heta niha dewletê li gundê me, mektebek çênekiriye. Yanî tu dibêjî qey gundê me nav sînorê

¹³⁵ Ji bo gengeşeyeke berfirehtir di derbarê vê babetê de bnr. *Vatandaşlığın Dönüşümü: Üyelikten Haklara*, berhevkar. Ayşe Kadioğlu, Weşanxaneya Metis, İstanbul, 2008; Nancy Fraser, "Rethinking the public sphere: A contribution to the critique of actually existing democracy", *Habermas and the public sphere*, der. C. Calhoun, MIT Press, Cambridge, 1992; Nira Yuval-Davis, "The citizenship debate: Women, ethnic processes and the state", *Feminist Review*, No: 39, 1991.

¹³⁶ Kadioğlu, A. "Vatandaşlığın Ulustan Arındırılması: Türkiye Örneği", 2008: 44-52.

Tirkiyê de nîne û em welatîyên wan nînin. Tu dibêjî qey Tirkiye îdareya me nake. Welleh, gundê me cihekî ecêb e."¹³⁷

"Ez çûm cem qeymeqam beg û min jê re got 'bavê min hatiye wenda kirin, em ji JÎTEM'ê ditirsîn, doh erebeyên reş û spî li cihê qontrolê li pey mirovan ketibûn. Em ji wan ditirsîn, çimkî wan gellek mirov revandin û wenda kirin."¹³⁸

*"Yanê serokkomar û serokwezîr ev tişt kirine. Çimkî serokwezîr îdareya vî welatî dike, her tişt girêdayî wî ye. Mesela her roj mirov wenda dibin û tîn kuştin, lê failên wan nayê zanîn. Mirov nabêje ew li kuderê ne? Ev mirov jî hemwelatîyên Tirkiyê ne, ew nabêjin ka çi hatiye serê wan?"*¹³⁹

Avakirina Dadmendiye û Duristkirina Şertên Hemwelatîyê

Mehmet Fındık û Ömer Fındık birayên Sait Fındık bûn, carekê ji wan daxwaz kirin ku, ew elokên sorkirî bibin lîwaya leşkerî. Ew rojekê elokên sorkirî dibin lîwayê û ji mala xwe derdikevin, piştê ji wê lîwaya leşkerî çî caran dernakevin. Sedema wendakirina wan her du birayan, redkirina cerdevantiyê, û redkirina çekan bû. Fermandarê Lîwaya Şernexê bo cerdevantiyê zor li wan dikir û ji wan re digot 'hûn an alîgirê PKK'yê ne û an jî alîgirê dewletê ne. Du zebeş bi destekî nayên girtin.' Divêt wan palpiştiya aliyekî qebûl bikira, an aliyê dewletê an aliyê PKK'yê. Sait Fındık îtirazan li vê helwesta fermandar dike û xwe wekî hemwelatî nîşan dike. Li gor wî, redkirina cerdevantiyê mafê herkesî û ya her gundiyan e. Mirov mecbûr nînin ku cerdevantiyê qebûl bikin û dewletê biparêzin. Her weha sînorê têgeha hemwelatîyê; bi tenê di behsa wendakirinan, mecbûrhiştina cerdevantiyê, çalakîyên der qanûnî û binpêkirina mafê mirovan de eyan û beyan dibû.

"Ez baş dizanim ku ev karê JÎTEM'ê bû JÎTEM.

137 Hevpeyvîn: Şernex-Hezex / 01.12.2012

138 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

139 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 02.12.2012

Her tim nas û dostên me, mirovên me yek bi yek dihatin wendakirin. Xwarzî û xalên min li wê derê, pismam û zavayê me, li vê derê hatin wendakirin. Wekî din mirovên ku me jê hez dikir, ji Cizîrê dihatin. Me weha li der û dora xwe dinihêrî, me ji kê/i hez bikira, ew yek bi yek dihatin wendakirin. Me dizanibû ji bo çî wesa dikirin. Me dizanibû em çî dikin û sûcê me çî ye. Ji ber ku me cerdevantî qebûl nekiribû, ev tişt dianîn serê me. Wî ji me re gotibû du zebeş bi destekî nayên girtin. Yanî maneya wê ev bû. (...) Divêt me aliyê xwe kifşe bikira. Ew jî ne karê me bû. Ew ne karê mirovên bi aqil bû, çimkî em hemwelatîyê wan bûn. Min pere ji leşker û polîsan nedixwest. Karê wan cuda bû, ez bi tenê hemwelatî bûm. Ez mecbûr nînim ku parastina dewletê bikim."¹⁴⁰

Birayê Ömer Kartalê ku hatibû wendakirin, Mehmet Kartal (li gel Mehmet Fındık û birayê wî Ömer Fındık hatibûn wendakirin) ji bo duristkirina dadmendiye bal kêşa ser têgeha hemwelatîyê. Kartal dixwaze ku bila berpirsên wendakirinan bêne cezakirin û dadmendî dê encax wî çaxî bête durist kirin. Ev jî ji bo çêbûna feraseta 'Kurd jî hemwelatîyên vî welatî ne' gav û qonaxeke girîng e. Di rastiyê de eleqeya duristkirina dadmendiye, anku teslîmkirina mafên Kurdan û tesîskirina wekhevîyê û darizandina berpirsên wendakirinan û mafên binpêkirî yên li devera OHAL'ê, bi hev re heye:

"Wextê ku ew li pey şopa van neheqîyan ketin û ew mesele safî kirin, helbet edalet dê wî çaxî hikm bike. Ew jî bo me Kurdan, ku em bibêjin em jî hemwelatîyê vê dewletê ne, gavek e. Lêbelê ew me wekî hemwelatî qebûl nakin, me wekî însanan qebûl nakin ku tiştêkî bikin. Ji me re dibêjin 'hûn li vê dinyayê nînin.' Loma bawerîya me bi wan (dewletê) nîne."¹⁴¹

5) Polîtîka

Wekî me berê jî gellek caran destnîşan kir, ev praktîkên der qanûnî yên li dijî Kurdan di salên 90'an de, ji bo "duristkirina hakimiyeta qadê û

140 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

141 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

PKK'yê ji gel û palpiştiya gel mehrûm bihêle" hatin kirin. Her ji ber wê, wendakirin, xwe dispêre motîvasiyoneke polîtîk: Têkoşîna bi PKK'yê re. Her weha, wekî fermanîdarên ku li devera Kurdistan kiribûn jî gotî, ew di derbarê palpiştiya siyasî ya gel a bo PKK'yê çî tiştî nizanin. Loma jî, herkes wekî gerîllayên PKK'yî muemeleyan ji wezîfedarên dewletê dibîne. Me berê jî destnîşan kiribû, qebûlkirina cerdevantiyê, an nîşaneyan alîgiriyê dewletê bû an jî nîşaneyan dijberiya dewletê. Lêbelê ev nakokî her berdeham dikin, dewlet dîsa jî 'hemwelatîyên xwe yên dilsoz' û 'xayînan' jî hev cuda nake.

Belê tam jî ev muemele, ji bo wezîfedarên dewletê egera wendakirinan û motîvasiyona vê polîtîkayê bû. Heger qeneat çêbûye ku kesek palpiştiya PKK'yê dike an li dijî wê nîne, wî çaxî ew kes êdî di lepên dewletê de ne. Loma jî ew rastî muemeleyên der qanûnî dibin û bînpêkirina mafên însanî li wan tînan ferz kirin. Her ji ber wê jî, ev polîtîka hem di nav xwe de wendakirinan pêkan dike û hem jî, cih û meyla ew kesên ku hatine wendakirin jî destnîşan dike.

Milîs, Piştevan, 'Welatparêz'

Me di gellek hevpeyvînên berê de jî destnîşan kir, tîma darizandinê, ew kesên ku wendakiribûn, bi hinceta ku ew milîsên PKK'yê ne, ew berze kiribûn. Qismek ji wan wendayan, beriya ku bînan wendakirin; hatibûn ragirî kirin û dîsa ji aliyê heman tîman ve hatibûn tehdîtî kirin. Ew kesên ku bi milîsiyê nehatibûn sûcdar kirin jî, wekî piştevanê PKK'yê hatibûn tawanbar kirin.

Di hevpeyvînan de, xizmên wendayan, behsa van argumentan û bersiva wan kir. Li gor xizmên wan, ew gellek caran hatibûn ragirî kirin, ji ber ku cerdevantî qebûl nekiribûn, muemeleyên xerab û îşkence li wan hatibûn kirin. Tîman û wezîfedarên dewletê, daxwaza 'hevkarîyê' ji wan kiribû û ji ber ku ew daxwaza wan nehatibû pejirandin, ev tişt hatibûn serê wan. Lê ji bilî wê, gellek xizmên wendayan got ku, heger eleqeya xizmên wan bi milîsiya PKK'yê re hebe jî, dîsa ew ne sedema wendakirina wan bû. Îslam Zeyrek, digot ku fermanîdar her tim jê re gotiye ku birayê

te milîsê PKK'yê ye. Lêbelê li gor Îslam Zeyrek, heger edalet hebûya, di rastiyê de birayê wî milîs û sûcdar bibûya jî divêt ew bihata cezakirin.

"Bi hezaran PKK'yî niha li zindanan de ne, bi hezaran, xwezî birayê min jî qe nebe di zindanê de bûya. Ma pariyeke nan jî tune bû bidana wî? Na, qaşo ew terorîst bû; na, ew terorîst nebû. Kê/i ku mirovên bêsuc û bêguneh kuşt û avêt çeman û kê/i ku serê mirovan jêkir terorîst ew e. Terorîstê kurrê terorîstan, ew jî, yê dijminê dewletê, dijminê memleket ew e, dijminê vî milletê ew e. Ew bêsuc û bêguneh bûn."¹⁴²

Bi tenê Îslam Zeyrek bal nedikêşa ser vê babetê. Zeyrekê ku yek ji xizmê wendayan bû, bi tenê behsa wî tiştî nekir, Apê wî yê Kamil Bilgeç jî, Yusuf Kerimoğluyê ku di sala 1995'ê de li Silopiyayê hatibû wendakirin jî, heman tişt gotin.

"Temam, madem sûcê apê min heye, çima mehkeme û edliye hene wî çaxî, cihê heq û hiqûqê kifş e, sûcê wan hebe, ceza bide wî, muebetê bide wî. Wî çaxî min jî dengê xwe nedikir, çî kesî jî dengê xwe nedikir. Heger edliye û mehkeme cirma cezayê wî bibirana, me tu tişt nedigot. Em ê her roj, her hefte û her sal biçûna ziyareta wî. Me dê ew bidîta û emê dîsa vegeyriyana. Lê ew bêsuc û bêguneh e."¹⁴³

Mêrê Taybet Acet, beriya ku nehatibû wendakirin, gellek caran ji aliyê leşkeran ve hatibû ragirî kirin û rastî muemeleyên kirêt hatibû. Wextê me jê pirs kir ku mêrê wê ji bo çî hatibû ragirî kirin jî got 'ji bo siyasetê, ji ber ku siyaseta dikir.' Wê got, çî kes jî ber ku siyaseta dike, heq nake ku were wendakirin. Paşê jî got ku ez jî di rêka siyaseta mêrê xwe de me. Di dawiya dawiyê de, ji bo van meseleyan wê ev tişt gotin:

"Em dixwazin ku biserkevin û em edaletê dixwazin. Em dixwazin ku deriyên heps û zindanan bêne vekirin, em serkeftinê ji gelê xwe re dixwazin û heta hetayê em dê li pey doz û têkoşîna xwe bikevin. Em nabin xayîn, em çî caran dest ji vê dozê

¹⁴² Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 15.10.2012

¹⁴³ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

nakêşin, heta ku em li ser rûyê dinyayê bin."¹⁴⁴

Her weha gellek xizmên wendayan, fikr û ramanên xwe yê siyasî, bi awayekî aşkira destnîşan kirin. Gellek kesan xwe wekî 'welatparêz' terfî kirin û li gor gellek kesan jî fikr û ramanên siyasî ne egera tunekirin û wendakirinan bû.

Di hemû hevpeyvînan de jî hate destnîşan kirin ku, ew kesên ku hatibûn wendakirin, bi faktereke 'kêyfi' hatibûn wendakirin. Tîm xwediyê îmtiyazên berfireh bûn, serek û giregire eşîran jî, bo xurtkirina eşîra xwe û têkbirina eşîran din û car caran jî bo berjewendiyên xwe yê aborî, gellek mirov wendakirin. Di gelek hevpeyvînan de bal kêşandin ser vê faktera 'kêyfiyê.' Loma jî, em nikarin bibêjin ku sedema wendakirina wan kesan bi tenê polîtîk bû.

Avakirina Rêxistina HADEP'ê ya Navçeya Silopiyayê

Wendakirina serokê HADEP'a (Partiya Demokrasiya Gel) navçeya Silopiyayê Serdar Tanış û rêvebirê navçeyê Ebubekir Deniz a di dema 25'ê Rêbendana 2001'ê de; pêwendiya polîtîkayê û wendakirinê destnîşan dike. Wekî bavê Serdar Tanış salix dabû, dema ku ew ji leşkeriyê tê îzinê, dibêje "Bi Xwedê kim, ez dê vê partiyê (HADEP) li vî bajarî (Silopiya) vekim." Bo avakirina partiyê jî xîret kir. Piştîre dîsa çû leşkeriyê, du mehên wî mabûn ku tezkereya xwe bistîne. Piştî ku Serdar Tanış vedigere, fişar û zext li ser malbata wî tînin kirin.

Leşker gellek caran bi ser mala Serdar de digirin û wênayên Abdullah Öcalan û alên PKK'yê datînin mala wî. Bavê Serdar Tanış, Şuayip Tanış tê ragirîkirin û piştîre jî tê girtin. Demekê di girtîgehê de dimîne û paşê tê berdan. Wextê ku ew tê berdan, dibîne ku kurrê wî yê Serdar Tanış hewl dide ku rêxistina navçeya Silopiyayê ava bike. Rêvebirên rêxistinê di serî de tînin, paşê gellek kes naxwazin û lîsteyeke dîtir tê hazirkirin û dawiya dawiyê lîsteya rêvebirên

144 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 05.09.2012

navçeyê tê amadekirin. Piştî ku Şuayip Tanış ji girtîgehê derdikeve, nêzî Cizîrê, erebeya wan tê rawestandî. Paşê jî jê re dibêjin ku Levent Temizöz dixwaze ku wî bibîne. Piştî van gotinan ew diçe Femandariya Lîwaya Şernexê û Levent Ersöz dibîne:

"Ew rûniştîbû, min silav da wî. Ji min re got 'Şuayip Tanış tu yî? Min got 'belê.' Ji min re got rûne, ez jî rûniştim. Ji min re got 'ka Serdar Tanış.' Min got 'ew çû Diyarbekirê, doh êvarê li malê bû, îro çû. Ji min re got 'bo çî çû Diyarbekirê?' Min got 'ji bo kar û barê partiyê çû.' Wî got 'hejmara wan pîr zêde bûne, ez dibêjim.' Yanî ji bo çûyîna wan. Min got belê. Wî got 'Şuayip Tanış', min got 'belê'. Wî got 'jê re bibêje, bila têkilî kar û barê partiyê nebe, ez nahêlim ew çî tiştî bike.' Min jê re got 'ew partî li her derê heye, ev karekî qedexe nîne, serbest e, em çima têkilî kar û barê partiyê nebin?' Wî got, 'êdî ez dibêjim.' Min got 'Ûkten reîsê belediyeyê ye, ew jî dike, Ûktenê din û Tatar mebûstiyê dikin. Tu çima weha dibêjî, em jî mirov in, tu çima ji me re dibêjî terorîst. Wextê kesek dibe mebûs, tu çima jê re dibêjî terorîst. Em jî mirov in, em jî.' Min eynî wesa got. Ji min re got 'temam lêxe here.' Paşê jî got 'ji Serdar re bibêje, bila têkilî kar û barê partiyê nebe, dest jê bikêşe, partiyê veneke, Welleh ez we sax nahêlim.' Eynî wesa got. (...) Got 'ez we sax nahêlim.' Wesa got. Bi tenê ji bo Serdar negot, ji bo herkesî wesa got. Min got 'qomutanîm/fermandarê min.' Wî piştîre got 'Enqere paytexta me ye, Şernex jî bajarekî me ye, wî partiyê venekin, bigrin. Enqereyê ew negirt, walî li Şernexê ye, liq/tûmen li Şernexê ye, lîwa li Şernexê ye, bila bajar bigrin. Silopiya jî qezaya Şernexê ye. Li qezayê nayê vekirin jixwe.' Eynî wesa got. Paşê jî got 'li vê derê ez hikman didim, ez çî bixwazim dê wesa bibe.' Min got 'tu nikarî çî tiştî bikî, wextê te kir, ezê jî koç bikim.' Min jî wesa got. (...) Paşê hêrsa wî danî û ji min re got 'bila Serdar min bibîne.'"¹⁴⁵

Serdar Tanış, piştî vê daxwazê neçû cem fermandar, jê re telefon vekir. Piştîre dîsa ji qereqolê telefon hat û Şuayip Tanış dîsa çû qereqolê. Li qereqolê Süleyman Yüzbaşî hat cem wî û jê re got, 'Levent Ersöz dixwaze ku te bibîne.'

145 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 16.10.2012

Şuayîp Tanış piştî wê, jê re dibêje 'min du roj berê ew dît, ez êdî naçim cem wî.' Süleyman Yüzbaşı jî telefonê dide Levet Ersöz û ew bi Şuayîp Tanış re diaxive. Ew ji hevdu re van tiştan dibêjin:

"Min got kerem ke Levent Ersöz. Wî ji min re got 'ka Serdar çima nehate cem min?' Min jê re got 'çendî ez dizanim, Serdar telefon bo te kiriye.' Wî got 'temam telefon kiriye, lê ew nehat cem min.' Wî ji min re got 'gava ku ew careke din piyê xwe biavêje Şernexê ezê wî bikujim.' Min jî got 'ezê eynî wesa jê re bibêjim.' Wî got 'bibêje, cihê min, ritbeya min, meqama min kifş e.' Bi Xwedê kim, eynî wesa got. Min got 'temam.' Wî got tamam, telefon bi ser min de girt, em rabûn hatin, min dîsa telefon bo Serdar kir. Min jê re got 'hal û meseleya fermdandar weha ye.' Paşê Serdar 3 heb daxwazname dinivîse, yek ji Wezaretê Karê Navxwe, yek ji Serokwezîr re û yek jî ji Serokkomar re."¹⁴⁶

Serdar Tanış piştî van rûdawan, di daxwaznameya xwe de behsa van rûdawan û gefên lê têne kirin dike, piştî jî van tiştan dinivîse: "Ez niha nikarim biçim bajarê Şernexê. Ez nikarim kar û barê xwe safî bikim û şerpeze bûme. Wekî din hevalên min ên rêvebirê HADEP'ê jî rastî van muemele û neheqiyên tîn. Em baş dizanin ku, partiyên siyasî bingeha demokrasîyê ne. Ew partiya ku ez jî di nav de me, daxwaz dike ku partiyên din çawa muemele dibînin, wesa muemele bibînin. Ez daxwaz û arezû dikim ku, bila ev neheqiyên der qanûnî, bêne rakirin, û faalîyetên însanî yên bo her mirovî bêne nîşan kirin û bizavên antî demokratîk bêne berteref kirin."¹⁴⁷

Piştî vê daxwaznameyê, 17 roj dibihure û roja 25'ê Rêbendana 2001'ê, serokê HADEP'a navçeya Silopiyayê Serdar Tanış û rêvebirê partiyê Ebubekir Deniz têne wendakirin.

"Wan partiya xwe ava kiribû, hejdeh roj bibû. Hejdeh roj. Serdar û Eyüp, (...) ewil ew û Eyüp tîn. Diçin rex PTT'yê (Teşkilata Posta û Telgrafê) û dixwazin ji bo partiyê telefonê girê bidin. Dinîhêrin texsiyek tê, nizanîm navê wê Fiat Moldov

146 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 16.10.2012

147 Başlangîç, C. Korku İmparatorluğu, 2001:9-201

e çiyê. Ew texsî jî tê hinda PTT'yê. Jê re dibêjin 'Serdar Tanış tu yî?' ew dibêje 'ez im', wî siwarî texsiyê dikin. Serdar siwar nabe, ji wan re dibêje 'hûn kî ne, ez we nas nakin.' Ew nasnameyên xwe nîşanî wî dikin, jê re dibêjin 'em hatine wezîfedar kirin.' Serdar dibêje 'na ez siwar nabim, nayê çî derê.' Ew zorê didin Serdar. Ew jî berxwe didin û naçin. Ew dibêjin 'tu çawa muqewemetê li dij wezîfedarên asayîşê dikî?' Serdar wê yekê qebûl nake û dibêje 'heger asayîş bixwaze ez ê biçim wir, lê ez niha nayê çî derê. Ew dibêjin 'temam' û radibin diçin. Serdar û Eyüp jî diçin partiyê. Piştî sê û çar saetan ji midiriyeta asayîşê telefonê jê re tê. Ew nizanîm dibêje ez Süleyman Yüzbaşı me, an wezîfedarê Süleyman Yüzbaşı me, ez baş nizanîm. Dibe ku ew bi xwe be jî. Jê re dibêjin 'were navenda asayîşê' Eyüp wî çaxî hazir nîne, ew diçe camiyê, diçe destavê. Serdar û Ebubekir bi hev re diçin. Zarokê din jî siwarî erebeyê dikin û heta ber deriyê asayîşê diçin. Ew zarok jê re dibê 'heger hûn bixwazin ez li benda we bisekinim.' Ew dibêjin, 'na, na tu here, bila te jî nas nekin û plakaya erebeya te jî negrin. Rewş xerab bû, ma kîjan heval wesa dikin. 'Bila çî kes me nebîne, wextê karê me xelas bû, ez dê te bibînim, bila te nebînin û te jî aciz nekin.' (...) Ew diçin qereqola cendirmeyê û êdî hew ji wir derdikevin."¹⁴⁸

Hingî ku Serdar Tanış û Ebubekir Deniz çûn wê qereqola cendirmeyê, heta niha çî xeber û agahî ji wan nehatiye standin. Wendakirina van her du rêvebirên navçeyê yên HADEP'ê di demeke wekî 2001'ê de û her weha nêz hate pê, ev tişt ji bo vê stratejiyê xaleke girîng e. Ya yekem ew e ku di nezera leşkeran de çî ferqa tawanbarkirina milîsiyê ya PKK'yê û endamtiyê partiyêke siyasî nîne. Ji bo Levent Ersöz, astengkirin û destûrnedana vekirina HADEP'ê li Silopiyayê, bi qasî têkoşîna bi PKK'yê re cidî û muhim e. Li devera OHAL'ê, çî ferqa endamtiya rexistinekê, revebiriya partiyekê, mafên hemwelatiyê û polîtîkayên ruxandinê nîne. Ya duyem, di sala 2001'ê de jî hîn wezîfedarên dewletê bêminetî wekî salên 90'an, gef li mirovan kirin. Wan her zanibû ku ew qet nayên darizandin û bi aşkira mirov tehdîtkirin û kuştin. Levent Ersöz, wekî

148 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 16.10.2012

fermandarên ku di salên 90'an de li wir kar kiribûn, mirov tehdîtîkirin. Ew bêminetî xwe aşkira dike, cih û nav û ritbe û nîşana xwe eyan û beyan dike. Ya sêyem, ev polîtîkaya ruxandinê, bi tenê ji bo şexs û kesan pêk nehatiye, her weha, hemû Silopî rastî reng û nîşaneyên zextiya dewletê hatine. Wextê Serdar Tanış HADEP'a Silopiyayê vedike pirr bi coş û kelecana dibe. Birayê wî behsa kelecana wî kir û wî birayê xwe bir avahiya partiyê û li wir gerandin. Birayê wî wê demê biçûk bû. Wî got Serdar ew roj serê sibehê şiyar bibû û bi coş û kelecaneke çûbû avahiya partiyê ya ku niha bûye dikaneke kotfiroş û heta êvarê li wir bi tena serê xwe rûniştibû. Di her hîlbijartinê de HADEP û partiyên bi wî rengî ji sedî 60 û 70 deng digirin, lêbelê wextê ku partî ava bû, çî kesî cesaret nekir ku biçê avahiyê. Serdar Tanış, di 22 saliya xwe de bû serokê partiya HADEP'ê ya navçeya Silopiyayê. 18 roj beriya ku were wendakirin, di avahiya partiyê de bi tena ser xwe heta êvarê rûniştibû.¹⁴⁹

Partî û wekî bizaveke rojane 'polîtîka'

Di hemû hevpeyvînên me yê li gel xizmên wendayan de, mexseda bêjedarana a ji 'partiyê', Partiya Demokrasî û Aştiyê (BDP) û partiyên beriya wê bûn. Piştî ku xizmên wan hatin wendakirin, ji bilî BDP û partiyên berî wî, çî partî xwedî li xizmên wendayan derneketin û destdirêjîya malbatan nekirin. Partiyên din, ji bilî çend kesên di nav de, çî caran bi xizmên wendayan re pêwendî deynenîn. Lêbelê hemû daxwaz û arezûya xizmên wendayan, ji aliyê BDP'yê ve jî nehatiye kirin. Ew ji BDP'yê daxwaz dikin ku parlementerê wê, her û her wendayan bikin nav behs û polîtîkayên xwe, rêvebirên partiyê bila her eleqe û pêwendiyê li gel xizmên wendayan girê bidin. Gellek rexneyên wan jî, ji

¹⁴⁹ Mehmet Nuri Binzet, di ifadeya xwe ya bo dosyeya Temizöz û Yê din a lêzêdekirî, agahiyên di derbarê Serdar Tanış û Ebubekir Deniz de dan. Li gor ifadeyên wî, bi daxwaz û telîmata Levent Ersöz, Hazım Babat û Kamil Atak bi hev re Serdar Tanış û Ebubekir Deniz dikujin. Îtirafkar wî dikujin. Her du civan tên kuştin, li gundekî berpala çiyayê Cûdî tên defnkirin/veşartin. Bo agahiyeke berfirehtir bnr. "Kaybolan HADEP'liler Cudi Dağı'na gömüldü" (2009). *Radikal*, 18'ê Gelawêja 2009ê. <http://www.radikal.com.tr/Radikal.aspx?aType=RadikalDetayV3&ArticleID=950356&CategoryID=78>

bo BDP'yê hene. Wan gellek caran behs kirin ku, divêt kiryarên van kuştin û wendakirinan bêne darizandin, dadmendî bête durist kirin û şert û mercên malbatên wendayan bêne qewîkirin û her weha pêwendiya xizmên wendayan jî bêne xurtkirin.

Ew xizmên wendayên ku behsa rêxistinên sîvîl kirin, hema hema hemûyan behs anîn ser Komeleya Mafê Mirovan (İHD). Ji bilî İHD'yê çî rêxistin nînbû ku, xizmên wendayan biçin derdên xwe ji wan re bibêjin û bo prosesa hiqûqî alîkariyê bixwazin. Xizmên wendayan, Komeleya Mafê Mirovan, wekî "Mafê Mirovan" bi nav dikin û wê wekî rêxistineke di salên 90'an de li ber zilm û gefxwarinan berxwedayî terîf dikin. Xizmên wendayan bi her awayî jî İHD'yê xweşhal in.

Mirov bi tenê di partiyên siyasî de polîtîkayê nake. Di nav şert û behsa rojane de, awayê siyaset û polîtîkayê her diguhure. Li Şernexa ku bibû cihê kuştinê û warê wêrankirî, egera geşepêdana rexistina rojane, bi tena serê xwe karekî polîtîk bû. Ji bilî Makbule Ökdem, li Cizîrê, hemû mirovên ku hatibûn wendakirin, mêr/zilam bûn. Ew kesên ku hatibûn wendakirin, hema hema gellek ji wan, li mal û malbata xwe dinihêrin û bo îdarekirina/debara malbata xwe dixebitîn. Wextê ku kesek hat wendakirin, debara mal û malbatê, mezinkirina zarokan, çûyîna pîrozbahiya roja jinan û hemû kar û bizavên bi vî rengî ji aliyê jinan ve tê kirin. Di rastiyê de, di nav vê sîstema Şernexa ku bibû cih û warê xopankirinê de, hem bi awayekî madî û hem jî bi awayekî arişî, herî zêde jin zehmetkêşîya jiyanê dikin û herî zêde ew li ber van arîşeyên jiyanî berxwe didin û ditêkoşin. Ev mekanîzmeya ku mirov dikuştin, beriya her tiştî mirovan çavtirsî dike. Wextê ku me ji wan pirs kir ku wê demê kesekî alîkariya wan kir an na, xizmekî/e wendayan ev tişt gotin:

*"Na na, wî çaxî çî kes nehat, partî wê demê tinebû, tişteke tinebû. Tirs hebû tirs. Na heyran millet ditirsiya ku bigota ez Kurd im. Welleh çî tişt ji destê me nedihat, çî kesî tişteke nekir."*¹⁵⁰

¹⁵⁰ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 01.09.2012

Gellek jinên ku me pê re hevpeyvîn kiribû, di axaftinên xwe de, piştî ku mêrên wan hatibûn wendakirin, behsa zehmetiyên jiyani yên zarokên xwe kirin. Ew malbat gelemperî malbatên xizan in, xîreta jinan, ked û têkoşîna jinan ew malbat ji belavbûnê xelas kirine: Jinên Cizîrî, Silopî, Hezexî û Şernexî, piştî ku mêrên wan hatibû wendakirin, karên curbicur kirin. Ew çûn olam û xizmeta malên memûran û paqijiya malên wan kirin, wekî paleyên rênçberiyê çûn bajarên dorûber û li wir xebitîn, li gund û taxên xwe de cilûbergên cîranên xwe şuştin û bi wî awayî zarokên xwe xwedî kirin. Ji ber van zehmetkêşiyên zarokên wan neçûn dibistanan, ên çûyî xwendina xwe tamam nekirin. Axaftinên Şevkiye Arslan jî, wekî serboriyên gellek xizmên malbatan e:

"Welleh ez bi xwe çûm û min xaniyê polîsan paqij kir, min malên xelkê paqij kir, cilûbergên wan şuşt, da ku debara xwe û zarokên xwe bikim. Welleh heta vê saetê ez dixebitim. Min pîr zehmet kêşa. (...) Min bi tena serê xwe, li zarokên xwe nihêrî, ew xwedî kirin. Min bi xwe ji xwe re got, 'heta ku ez hestiyên mêrê xwe bibînim, ezê li zarokên xwe xwedî derkevim.' Westê ku min hestiyên wî dîtî, ez ê zarokan bibim ser hestiyên bavê wan."¹⁵¹

Piştî wendakirinan, têkoşîna mal û malbatên xizmên wendayan, divêt di çarçoveyê cinsiyeta/ zayenda civakî de bête hilsengandin û bi tena serê xwe bête gengeşe kirin. Lêbelê ev babet, ne di nav sînore vê raporê de ye. Em niyet û arezû dikin ku di vê xebata xwe bi tenê li ser têkoşîna jinan a piştî wendakirinan rawestin û behsa xizantiya malbatên wan bikin û arîşeyên siyasî û zehmetkêşiya jiyani gengeşe bikin. Dîsa divêt em behsê bînin ser, ku têkoşîna şopgerîna wendayan, bêhtir ji aliyê jinan ve hatiyekirin û ew bi awayekî aktîf li pey wendayên xwe ketine û têkoşane.¹⁵²

151 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 03.09.2012

152 International Center for Transitional Justice (Navenda Derbasbûna Dadmendiyê ya Navdewletî) li ser bînpêkirina mafê însanî ya li dor behsa zayenda civakî kar dike û bo çareserkirina wan hewl dide, li gor wê bînpêkirina mafê mirovî xîreta çareserkirineke dadmendiyê dike û palpiştîya hesabpîrsînên bi vî rengî dike û bi bernameya Gender Justice (Dadmendiya Zayenda Civakî) xebatan dike. Bnr. <http://ictj.org/our-work/transitional-justice-issues/gender-justice>

Arîşeya Domdariyê

Bi taybetî xizmên wendayan gellek çare behs kir ku polîtîkayên dewletê yê zild û zordariyê her domdar bû. Divêt em di vê behsa polîtîkayê de vê yekê ji bîr nekin û balê bikêşin ser. Me di gellek qismên raporê de jî behs kir, xizmên wendayan bi tenê rastî tengasiyên wendakirinê nehatin, her weha ew mecbûrî qebûlkirina cerdevantiyê dimînin, bi darê zorê koçrev dibin, piştî wendakirinan tî ragirî kirin û dikevin heps û zindanan. Xizmên wendayan ên din, her tim tûşî polîtîkayên stratejiya zext û fişarê dimînin û ev praktîkên struktural û sistematîk her wan şerpeze dikin. Di hevpeyvînan de agahî û zanîneke balkêş hate destnîşankirin. Zarok û xwarzî an nasên mirovên ku di salên 90'an de hatibûn wendakirin, niha jî bi operasyonên KCK'yê (Koma Civakên Kurdistan) tî girtin û dikevin girtîgehan. Di sala 1991'ê de, rêvebirê Partiya Kedê ya Gel Mehmet Tan ji aliyê ekîba Cem Ersever ve tî kuştin, piştî hestiyên wî tî dîtî û dawiya dawî jî gora wî ji aliyê Tîmên Taybet ve bi çek û sîlehan tî xerabkirin. Kurê Mehmet Tan, Ahmet Tan, di derbarê domdarkirina vê polîtîkayê de ev tişt gotin:

"Di salên 80'yan de bapîrên me digirtin, îşkence lê dikirin. Di salên 90'an de bavên me kuştin. Di salên 2000'an de em girtin. Gelo dê di salên 2020'an de çi li zarokên me bikin?"¹⁵³

Her weha xizmên wendayan ên Şernexî û bi taybetî jî ew stratejiya ku îro li ser Kurdan tî meşandin, her û her bi rûdawên dîrokî û tiştên rabirdû re eleqeder in. Domdariya kuştin û zild û zordariya vê stratejiyê, zanîn û têgehiştina di derbarê dewletê de jî her tim zindî dihêle.

6) Wendayên Bêgor

*Tu libasê îdaniya min bûyî
Û paldanka dilgeşiya min
Felekeke xayîn ji nişka ve
Te ji min dûr xist."¹⁵⁴*

153 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 02.12.2012

154 Qêrîna Gilgamêş a piştî mirina Enkidû; Ökten Kaan H. *Ölüm Kitabı*, 2010;37

"Em hemû li wir bûn. Erebekeke spî hat (...) gotin 'em dê birayê te bibin asayîşê' (...)... midûrê asayîşê! Navê wê H. bû. Em çûn û me jê re got, 'ekîbeke weha hat, hat Cizîrê! Pirsê birayê min kirine, gotine em dê wî bibin asayîşê!' Got, 'li vir tişteki wesa tine.' Min got 'çawa tişteki negot.' Çi kesî alîkariya me nekir. Ji min re gotin, 'nehatiye vir, birayê te nehatiye vir.' Em çûn cendirmeyê, wan jî ji me re eynî tişt gotin. (...) Me ji derûdor pirsî, ji belediyeya Silopiyayê pirsî, ji serokê wê pirsî. Ji me re gotin, 'me kesek defn kir.' (...) Me ji wan re got, 'zikê wî hindeki werimî bû, Welleh ew weki birayê me bû.' Me got 'kê ew defn kiriye?' gotin 'li ser riya Çataxê.' Riya Çataxê di navbera Silopiya û Cizîrê de ye. Gotin 'ew kuştine û avêtine wê derê, kezav rijandine ser laşê wî, qûrşûn di serê wî de hebû, û sûretê wî hemû şewitandine.' Navika wî jî, wextê ew pitik bû, wesa birrîne, qûrşûn di wir de jî hebûn. (...) Ev riya Xebûrê ye (...) Em çûn û me ji wê derê jî pirs kir, xebatkareki belediyeyê jî li gel me bû. Qaşo wî ew defn kiribû û em bi hev re çûn û me mezêlê wî vekir, lê nihêrî ew birayê min bû. Ew birayê min bû. Me ew şev ew anî Cizîrê, me ew bir camiyê/mizgeftê, midûrê asayîşê jî hat, ew jî hat, paşê telefonê bi dizîka ji me re hat. Di telefonê de gotin 'li ser vê meseleyê nesekekin, eleqeder nebin, an emê we jî bikujin.' (...) Me cesedê birayê xwe dît, em nabêjin me nedîtiye. Rojek piştî çûyîna wî, em li pey wî ketin û me ew dît. Hinde mirovan qet xizmên xwe nedîtin. Hinde mirov hene, çavên wan her li rê û deriyane. Dayika wan wextê ku radibe nimêja sibehê, çavên wan her li deriyane. Dibêjin qey dê ji nişka ve were. Zar û zêçên wan jî her li ber deriyane, çavdêriya wan dikin. Ew qas mirov hatin qetilkirin. Yaw mirov şer dikin, bi dewletan re şer dikin. Temam mirov di şer û cengê de tê kuştin, tîn dîl girtin, lê êdî bes e. Mirov çawa ji aliyê dewleta xwe ve tê wendakirin."¹⁵⁵

Ev gotin ji hevpeyvîneke li Cizîrê, ji yekî hate wergirtin. Xizmê wenda, cenazeyê nasê xwe, li goristana 'bêkesan' a li Silopiyayê dibîne û wî dibe li Cizîrê defn dike. Lê berpîrsên wî hîn nehatine dîtin û hîn nehatine darizandin.

"Me doz vekir, me çend caran dewa vekir, lê çi encam jê derneket. (...) Na Welleh. Bi tenê ji me

155 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

re gotin 'herin temam, birayê te hatiye kuştin, em nikarin tişteki bikin, herin dua bikin ku tişteki nehatiye serê we.' Heyran em çî bikin, dewlet û JÎTEM jî weha bû. Mirov dikuştin, serê wan jêdikirin û diavêtin bîran, mirov dihatin wendakirin. Me paşê bi xwe mirovên xwe didîtin. Yaw çend heb hebûn li Cizîrê, çend heb, êdî mirov nikaribû tişteki bike, (...) Me paşê xizmê xwe girt."¹⁵⁶

Her çend bingeha edaletê nehatibe danîn jî, xizmên wendayan, wextê ku cesedê mirovên xwe didîtin, ev dibû egera şabûneke dilşikestî. Di demeke nêz de, di nûçeyê rojnameyê de jî destnîşan bû ku, xizmên wendayan bi hêviya ku hestî û eşyayên mirovên xwe bibînin, şad û bextewar dibûn: Li Kerborana Mêrdînê, di sala 1995'ê de, 9 kes hatin ragirî kirin û jê 2 kes hatin berdan. Ji wan 7 kesê din piştî wê çî agahî û zêber nehate wergirtin. Malbat û xizmên wendayan, bi alîkarî û xîreta Komeleya Mafê Mirovan û saziyên dîtir, li pey şopa wan kesan ketin û li wê deverê nêzî salek berê erd hatin vekolan. Wan hestî dîtin û bo tetkîkan ew şandin tipa edlî. Li gor raporta tipa edlî, ew hestiyên ku hatibûn dîtin, aîdî yên kesekî di nav wan 7 kesan de bû. İbrahim Aslan 18 salan li pey şopa kurrê xwe ketibû û piştî ku hestiyên wî hatin dîtin, ev tişt gotin:

"Di Mijdara 1995'ê de leşker hatin. Ji me re gotin 'em dê îfadeya Mehmet Emin werbigrin.' Ji wê rojê şûnda me çî agahî ji Mehmet Emin wernegirt. Ez piştî wê çend caran çûm Fermandariya Cendirmeyê û min ji wan re got, 'kurrê min hîn nehatiya mala xwe, ew ji aliyê leşkeran ve hatibûn ragirî kirin û divê niha li vir bûya.' Lê her car ji min re gotin, 'me zarokê te serbest berda.' Wextê ku Mehmet Emin hatibû ragirî kirin, ew hîn 19 salî bû, dê biçûya leşkeriyê. Min 18 salan jan da bo wî. Ez di bîr û çalan de li pey şopa wî ketim. Kurrê min bêşûc û bêgûneh bû. Em dê hestiyên kurrê min li Hezexê defn bikin. Her çend 18 sal bihurîbin jî, ji ber ku min hestiyên wî dîtine û niha goreke wî heye, ez diçim û duayan dikim, lewma ez pîrî şa me."¹⁵⁷

156 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 04.12.2012

157 'Oğlumu her kuyuda aradım' *Radikal*. 25ê Sibata 2013'ê.

Di her du nimûneyên li jor de, sedema hîlbijartina me ya wan malbatên ku hestiyên wendayên xwe dîtine ew e ku, dema ku me bi wan re hevpeyvîn kir, daxwaz û arezûya wan a herî mezin ew bû ku, beriya danîn û duristikirina edaletê, ew malbat dixwazin ku qe nebe hestiyên wendayên xwe bibînin. Lêbelê çi heyf û mixabin e ku, hejmara wan kesên ku cesed û hestiyên wendayên xwe dîtine û dilê wan şikestî ye, pirr kêr in. Di nav malbatên ku me pê re hevpeyvîn kirî de bi tenê jê 11 malbatan cesed û hestiyên wendayên xwe dîtine. Ji wan kesên ku cesedê wan hatiye dîtin, hinek piştî wendakirinê hatine dîtin û hinek jî, di van salên dawî de bi testên DNA'yê hatine tespîtkirin. Wendakirin, bêgor hiştin û mehrûmhiştina malbatan ji hestiyên wendayên wan...Di nav bajarên Kurd de, ev rûdaw herî zêde li Şernexê hatiye pê. Ew mirovên ku hatibûn wendakirin, bi taybetî jî, di gundekî navbera Cizîr û Hezexê û nêzî yekîneyeke Leşkeriyê hatine veşartin. Li Silopiyayê jî, bêhtir li dorûbera bîra BOTAŞ'ê ew hatine veşartin. Gelek cesed jî li nêzî deriyê sînor, Xebûrê jî hatine veşartin. Hezex û gundên dorûbera wir jî, ji ber ku nêzî Hîzbûlahiyan e, gellek wenda li wir hatine veşartin.

Serboriyeke Qedîm

"Ew nayên definkirin û şîna wan nayê girtin." Sophokles di tragedyaya *Antigone* de van qisetan bi Kreon dide gotin. Bêgorhiştina mirovekî/e mirî, çendîn trajîk be, ewqas jî bizaveke polîtîk e. Her çend di civak û netewan de merasima şîngirtinê curbicur be jî, di hemû civakan de definkirina miriyan norm û tradîsyoneke mecbûrî ye. Wextê ku du bira hevdu dikujin û yek ji aliyê mamê wan ê Kreon ve wekî xayîn tê dîtin û ew nayê definkirin, Antigone li dijî vê derdikeve. Li gor wî, definkirina mirovan emrê Xweda ye û ji mêj ve ew her hatine veşartin. Antigone, heger bê kuştin jî, ew dê birayê xwe yê bêgor maye defin bike û ji bo wê jî îteetîya qanûnên qral nake. Li gor wî, yasa û qanûnên Xweda, ji yên qral û dîktatoran bêhtir meşrû û qewî ne.¹⁵⁸ Mirin rastiyeke mirovan e û ji aliyê wan ve hatiye pejirandin. Lê wendakirina mirovan, tradîsyona definkirinê bêhikm dihêle.

158 Sophokles. *Antigone*. 2011

Definkirina Miriyan û Wendayên Bêgor

Di gellek çand û edetên civatan de kesê ku miriye; li gor dîn û baweriya wî, ji aliyê malbata wî ve tê definkirin. Dema ku mirov cesed an laşê kesekî/e mirî teslîmî malbata wî/ê neke, ew tê wê maneyê ku şîna wî jî nayê girtin. Her weha merasima mirina kesekî/ê û definkirina wî/ê nayê kirin. Her çend çi hêviyên malbat û xizmên wendayan tinebin jî, ew her dixwazin ku wan bibînin û qe nebe şîna wan bigirin. Di gellek hevpeyvînên me yê li Şernex, Cizîr, Hezex û Silopiyayê, xizmên wendayan di derbarê vê meseleyê de ev tişt gotin: "Em dizanin ku ew hatine kuştin, lêbelê em cesed û cenazeyê wan peyda nakin, ew nahêlin em şîna wan jî bigrin û mirovên ku ew kuştine jî nayên darizandin, û bi ser de tîna parastin."

"Yaw binihêre yek tê wendakirin. Jixwe em hemû mirov, em dê bimirin. Kê dimire, sê rojan serxweşî tê kirin, mehekê jî şîna wî/ê tê girtin û piştî herkes li karê xwe mêze dike. Lê ev ne tiştêkî wesa ye. Çend sal dibihurîn jî, tu dinihêrî hîn jî çavên dayika û jin û zarokên wî/ê her li rêka wî/ê ne. Dibêjin gelo dê rojekê vegere an na. Tu diçî malê, herkes kelogirî ye. Tu nan naxwî û avê venaxwî, dilê mirov her şikestiyê û mirov her bêhteng in. Yanî halekî pirr xerab e. Tu dinihêrî û dizanî ku kê ev tişt anîne serê te, cihê wan diyar e û li derûdora te bêminet digerin. Tu dinihêrî û ji te re dibêjin qaşo siyaset dê biguhure, lê hikumeteke nû hatiye (...) Tu dizanî ku ew qatilan diparêzin. Çi caran wan danarizînin, çi tiştî nakin."¹⁵⁹

Merasima piştî mirinê, di gellek kultur û edetan de nêzikî hevdu ne û xwedî maneyeke hevpar in: Mirî êdî derveyî civakê dimîne û ji civakê wêdatir dibe. Her ji ber wê, di hemû edetan de mirî xwedî hirmeteke mezin in. Her çend ev merasim û rîtuâl jî hev cihê bin jî, di gellek edet û kulturên de, mirî tîna defin kirin. Sedema daxwaza definkirina mirovan, xwe dispêre motîvasiyona ji dûrketina laşê miriyan. Di dînen semawî de jî ev feraseta dualîst hatiye pejirandin. Laşê miriyan ji ber ku ji rihê wî cihê dibe, bedena mirî jî kefareta xêr û gunehên wan in. Her ji ber van tiştan, divêt mirî bê

159 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 14.10.2012

defin kirin. Dînên semawî, merasima definkirinê dispêrin rîtûala Habîl û Qabîl. Piştî ku Qabîl, Habîl dikuje, qijakek erdê dikole û wî vedişêre û ev yek jî wekî destpêka vê merasimê di dînên semawî de tete qebûl kirin. Ev yek wekî qanûneke tradîsyonel ji dirêjahiya dîrokê ta niha her dom kiriye.

Antropolog Hişyar Özsoy, ev babet bi bergeh û perspektîfeke etîmolojîk analîz dike. Di zimanê Latîni de bêjeya *humanitas* (mirov-însan) ji peyva *humando* (veşartin-definkirin-çalkirin) tê; anku mirov; bi definkirinê, mirov e. Di şêwezarê Kurdî Kurmancî de, *mirin* û *mirov*, di Kirmanckî/Dimilkî de *merde* (mirin) û *merdim/mordem* jî ji heman pêwendiya etîmolojîk û semantîk tên. Mirov bi definkirina miriyan ji cureyên bûnwerên din cihê dibê. ¹⁶⁰ Li gor Îslamê, divêt miriyek/misilmanek bête şuştin, nimêja wî bête kirin û zêde neyê sekinandin û bête definkirin. Ev yek wezîfeyeke li ser bawermendan hatiye ferz kirin. Di gorkirina miriyekî/ê de rê û rêzanên definkirinê û şêweya qebr û qebiraniyê di ilmê fiqhê de jî cih girtiye. Qebir, cîgeha rihiyeta mirovan a ji mirinê heta mehşerê, anku 'alema berzaxê (nav du 'aleman) terîf dike. ¹⁶¹

Wekî din, mezel (gor) di zimanê Erebî de, ji hevrehî ziyaretê (serdan) tê û di maneya cîgeha seredanê de ye. Ziyaretkirina mirovan, pêwendiya mirin û jiyînê ya sembolîk destnîşan dike. Bi taybetî jî ji bo milletên Rojhilata Naverastê, kultur û edetê qedîm e. Heger mirî, ji bo civakê hêja û gewre be, ziyaretkirina miriyekî/ê nîşaneyê hîrmetdariya wî/ê ye. ¹⁶² Ev yek nîşan dike ku, mirî hem derveyî civakê ye, hem ji civakê wêdatir e û hem jî xwedî wateyêke metaforîk e di hişê civakê de. Lêbelê bêgorhiştina miriyekî/ê vê merasima hezar salan binpê dike. Di Kurmancî de şîn maneya deynê qedirgirtina/rêzgirtina miriyan e. Hevalekî wendayekî, çêkirina gora wendayekî û dîtina hestiyên wî bi vî awayî terîf dike:

“Yaw niha ev tiştêkî muhim e, mesela hûn li ser

160 Özsoy, H. 'Arafta Kalmak: Tarih mezarda başlar' *Politikart*, 7'ê Gulana 2012'ê <http://politikart1.blogspot.com/2012/05/araf-ta-kalmak-tarih-mezarda-baslar.html>

161 Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, 2001:33-37.

162 Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi. 2004:519-521

van meseleyan lêkolînan dikan, em li vir bi Dayikên Şemiyê re diaxifin, nas û dostên me hene, ew hemû dixwazin ku bila goreke xizmên wan ên wendakirî hebe. Dê biçê ser gora wî tasek av birijîne ser kêlikê wî/ê, gul û kulîlkekê lê biçikîne, dê ji kêlikê wî/ê hez bike. Ya rast herkes bi tenê wê dixwaze.”¹⁶³

Her çend Kurd bi dîn û mezhebên curbicur bawer bikin jî¹⁶⁴, dîsa ew miriyên xwe defin dikin û şîna wan heta demeke dûvedirêj dom dike. Mirî ji aliyê mirîşo/gassalan ve tên şuştin, can û cesedê mirî, bi nebatên bêhnxeş ve tê mistdan û paşê tê kefen kirin. Di xurfa cenazeyê de, divêt sê rojan mirov çira û qandîlan vêxe. Mirî nakeve tabûtê, ew ji aliyê hevalên xwe ve, bi darbestan ber bi goristanê ve tê birin. Hinde jin hene ku li gor edetên pagan ên qedîm, bi teqê req û hengameyekê beşdarî cenazeyê dibin. Divêt rûyê mirî bidin aliyê Mekkeyê û ew di aliyê rastê de bête defin kirin. ¹⁶⁵ Kûrahiye gora mirî ihtîmalen bi qasî bejna mirovekî ye. Piştê mella telqînan dixwîne. Piştê dayik/jin bi lawik an zêmareyan digirîn û car û bar jî bo şeref û hîrmeta mirî giregirek qiseyan dike. Goristan, bi taybetî li derveyî bajar û gundan û li ser gir û tepeyan e. Hinde kes dar û berên wekî erxewan li goristanan diçikîne. Her weha, li gor baweriyan, mirî bi dilşahî di gora xwe de dimînin. Taybetmendiyên goran, li gor der û deveran cihê ye. Nemaze, li serê gorên miriyan *sêl an kêlik* hene û ji bilî wê gor nayên xemilandin. Dîsa bi taybetî kîtabe/nivîsk nînin li ser goran. Lê Êzidiyên Sêfkanê, car caran nivîskên bi Erebî li ser goran dinivîsin. Şîna miriyan teqrîben heta salekê didome. Nas û xizmên miriyan heta sê mehan ji bo sersaxiyê

163 Hevpeyvîn: Stenbol / 29.08.2012

164 Gellek Kurd Ortodoks Sunî ne û hindek jî Şafî ne (...) lêbelê hemû Kurd Sunî û Şafî nînin. Li aliyê Kurdistanê yê başûr û başûrê rojava, li eyaletên wekî Xenaqîn û Kirmaşanê, gellek eşîrên Kurd, baweriya xwe bi dînê Îranê yê fermî, 12 Îmamê diînin. (...) Ji bilî Îslama Ortodoks û Şîitiyê, li gellek der û deverên Kurdistanê bawermendên ku rehê wan digehê dînên Îranê yên qedîm, ên Semîtik, Şîitiya (gulaf) û Sûfîzma heterodoks û baweriyên xwe bi heterodoksiyêke sînkretîk diînin. Di nav wan de yê herî zêde Elewiyên ku li aliyê bakurê rojava dijîn in. (...) Li aliyê Kurdistanê yê başûr û başûrê rojhilat, mezhebeke bi navê Ehlê Heq (Yarsanî) jî hene. Mezhebê sêyemîn ê heterodoks, Êzidî ne ku ew wekî ku baweriya xwe bi şeytan diînin. (Bruneissen, M. V. 2003:43-44)

165 Êzidî, serê miriyan didin aliyê rojhelat an aliyê rojê.

li mala mirî dimînin. Heta ku şîna mirî ji mala mirî ranebe, nas û xizmên miriyan naçin çî şahî û seyranan. Di 3,7 û 40'ê mirî de xwarinek bo kefareta rihê mirî tê dayîn.¹⁶⁶

Mirî, Mirin û Jiyan

Di edet û tradîsyonên millet û civakan de destnîşan dibe ku, miriyên civakekê, bi sembolîk be jî, piştî mirinê rêvebiriya wê civakê dikin. Tiştê ku vê yekê destnîşan dike gor û goristan in. Goristan, bi çî awayî ji jîyan û civakan cihê nabe û her û her cîgehên tirs û rêzgirtinan e. Feraseta goristanan ev e ku, mirov an civak; ji rabirdû û gerdîşên navxwe bilezûbez dûr nakevin û her daxwaz dikin wan rîtualan di nav xwe zindî û jînewer bikin. Goristan di bîrgeha mirovan de wezîfeya pîreyekê li gel alemeke dîtir dibînin. Goristan wekî din, yadkirin e, bi bîr anîn e. Bi goristanan, maneya jiyana mirî, neqlî zarok û nas û nîfşên nûtir dibe. Di Rojhilata Naverast û gerdîşên Kurd de gor û goristan, cîgehên hêja û qedirgirtinê ne. Mirin, pereçeyeke jiyînê tê qebûlîkirin. Ev her du tîgeh, li berevajî hevdu nehatine formûlekirin, her weha pêwendiya wan her bi hevdu re hene. Îbnû'l Erebî, di derbarê mirinê de van tiştan dibêje: "mirin, koçkirina ji qonaxa dinyayê ber bi axiretê ye; dawiya jiyînê û saxbûnê nîne.¹⁶⁷ Li vê cografyayê, feraseta mirinê ew e ku, jiyaneke çêtir bi mirinê pêk tê. Ev yek nîşaneyê pêwendiya mirin û jiyînê ye. Ji bilî vê yekê, wekî Baudrillard dibêje, gerdîş û kultura Rojava, "her hewl û xîret kiriye ku, mirin û jiyînê ji hev cihê bike."¹⁶⁸ Wekî wî jî destnîşan kiriye, terîfa vê kultura Rojava ya mirin û jiyînê, feraseta civakên ne Rojava jî bi awayekî tebîî aşkira dike. Di nav sînorê wê terîfê de, Rojhilata Naverast û her weha Kurd jî hene. Ji ber ku Kurd, misilman in, bi xwe di nav vê terîfê de cih digirin. Lewma jî, mirin her di nav jîyanê de û rastiyeke mirovahiyê ye. Her miriyek xwedî gorekî ye û ev yek jî bîrgeha/hefizeya civakê destnîşan dike. Her weha divêt her goreke mirî hebe. Di nav vê

¹⁶⁶ Bayrak, M. 2004:183-185

¹⁶⁷ Ökten, K. H. 2010:152.

¹⁶⁸ Baudrillard, J. 2009:261.

feraseta gerdişî de, heger laşê mirov tinebe, dîsa divêt goreke wî/ê hebe. Em siyaseta bêgorhiştinê ya ji aliyê dewletê ve durist bûye, di şexsê Şêx Seîd, Seyîd Riza û Seîdê Kurdî de jî dibînin.¹⁶⁹ Sedema bêgorhiştina her sê pêşengên Kurd ew e ku, hem bi awayekî dînî û hem jî bi awayekî siyasî pêwendiya wan û hezkiriyên wan bibirre. Ev nîşaneyê tundiya dewletê ya rûtîn e. Çimkî gor, hem nîşaneyê zincîra malbatî û hem jî nîşaneyê aîdiyeta netewî ye û faktereke motîvasyona tîkoşîna netewî ya li dor behsa pêşengan di nav xwe de dihevine. Bêgorhiştin; tîkbirin û qutkirina vê pêwendiyê bi xwe ye. Dînen semawî, mirovan her tim û her wext amadeyî mirinê dikin. Li gor Levinas "...daxwaza herî zêde, daxwaza hebûnê ye û mirin ji nişkê ve û bi lez tê."¹⁷⁰

Her çend mirov zû bimire jî, dîsa mirin rastiya civak û mirovan e ku her bi wan re ye. Her wesa; dewlet bi tundî mirovan dikuje û bê gor dihêle, lêbelê dîsa jî cihûwarê mirî yê hiqûqî nîne. Ew nikare cihê miriyan terîf bike û bi saziyên xwe yên dînî ve jî nikare meşrû bike. Dewlet di derbarê wendakirinê de çî tiştî nabêje, çî terîfê nake û li dor behsa çandî jî arîşeyên wê yên ontolojîk rû didin. Dewlet bi vî awayî, dîn û baweriyên civakekê biçûk û tehkîr dike. Her wesa jî, ev rastî diçe û tê û dîsa wekî heqîqetê di saziyên dewletê yên dînî û hiqûqî de li pêşberî dewletê disekine. Lêbelê, li aliyekî din, ji ber ku dewlet dixwaze bi wendakirinan mirovan bitirsîne, mesajeke siyasî bide civakê û ji bo wê jî di vê stratejiyê de her îsrar dike.

Têkçûna Derûnî: Hêvî

Êrîş û talankirina kultur, edet û baweriyên civakekê, nîşaneyê îmhakirinekê ye. Li vir du xalên girîng hene: Ya yekem ew e ku, desteserkirina cesedê kesekî/ê, jiyana xizm û nasên wan kesan jî her û her aloz û leng dike. Wekî li jor jî hate destnîşan kirin, ev êş û jana geleke ku li

¹⁶⁹ Ji bo babeta bêgorhiştina pêşengên her sê Kurd û siyaseta dewleta Tirk, mirov dikare li beşeke xebata doktoraya Hişyar Özsoy a bi navê 'Du Seîd, Seyîdek'ê binihêre: <https://repositories.lib.utexas.edu/bitstream/handle/2152/ETD-UT-2010-05-854/OZSOY-DISSERTATION.pdf?sequence=2>

¹⁷⁰ Lévinas, E. 2006:113.

pey hestiyên xwe ketî ye. Bi van praktîkan ve, stratejiya wendakirinê pêk tê. Krîtera duyem jî, payeya wendayan a siyasî û kulturî ya di nav gel de ye. Ew kesên ku hatine wendakirin, giregir û pêşeng in û desthilatiye gellek kesan dikin. Di hevpeyvînan de jî hate aşkîra kirin ku, mirovên hatine wendakirin, nemaze giregir û pêşeng in. Di vir tiştê girîng ne kuştina wan bi xwe ye, her weha bêgorhiştina wan, ji wê girîngtir e. Bêgorhiştina wendayan, dibe egera hêvîşkestinekê û di nav xizmên wendayan de belav dibe. Di van salên dawî de, li gellek der û deveran hestiyên wan mirovên wendabûyî têne dîtin û xizm û nasên wendayan ji aliyê rayedaran ve, bi kolandinê têne xeberdar kirin. Ev yek dibe egera hêvîdariyeye xizmên wendayan a dîtina hestiyên wan. Her wesa, dîtina hestiyên wendayan, haleta rihê xizmên wan xweş dike, û ew piçek be jî ji rewşa xwe ya berê bi dûr dikevin. Xizmên wendayan bi van geşepêdanan, hêvî dikin ku hestiyên wan wendayan bêne dîtin, gor û goristanek bo wan bête çêkirin. Ew dixwazin ku qe nebe bila biçin serdana gora wendayên xwe û duayan bo wan bixwînin. Lêbelê, wendakirina bav, bira, xwîşk, mêr û zarokan, bi tenê nabe egera çênekirina vecîbeyên dînî, her wesa ew ji şî û teziyeyê jî mehrûm û bêpar dimînin. Tinebûna laş û wendakirina cesedê, dibe sedema şînegirtinê jî. Her weha jiyana xizmên wendayan, her di nav bêhêviyan de tarûmar dibe. Birayê wendayekî di derbarê tarûmarbûna jiyane de ev tişt gotin:

"Tişteki pîr zehmet e, nizanîm, tu diçî, li hestiyana digerî, hestiyana û dibînî ji xwe re dibêjî gelo ev hestî aîdî nasê te ye? Dema mirov dimire, cenazeyê wî/ê çêdibe, mirov têne sersaxiyê û piştî deh û panzdeh rojan herkes ji mirinê bi dûr dikeve û kuta dibe diçe. Qe nebe, tu dibêjî me ew definkiriye û goreke wî heye û hêdî hêdî li karê xwe dinihêrî. Lêbelê ev ne tişteki wesa ye, hemû malbat ji ber vê yekê şerpeze dibin. Mesela ti kekekî min daweta xwe nekirin."¹⁷¹

Car caran haleta rihê xizmên wendayan, bi nûçeyekê xweş dibe û dibe egera 'hêviyan'. Lêbelê zordariya dewletê, hem kesekî/ê dikuje û hem jî bi sazî û dezgehên dîrûbera xwe wan

hestiyana vedîşêre. Em bi nimûneyeke konkrêt li babetê hûr bibin. Li Cizîrê agahiyê didin xizmekî/ê wendayê û jê re dibêjin em dê erdê vekolin. Ew diçe testên DNA'yê dike û hêvî dike dê hestiyê bavê xwe bibîne. Çimkî hestî 6 metre ji binê erdê derdikevin û hetmen aîdî mirovekî ye. Lêbelê axir dewlet testên dîtir bi sazî û dezgehên xwe dide kirin û dibêje ew hestî aîdî heywanan e. Ev malbat, bi qasî malbata ku bibû babeta nûçeya rojnameyê bi sans nîne. Xizmê wenda di derbarê wê de ev tişt gotin:

"Hestî ji tabûra eskeriyê derketibûn. Ji wir gellek hestî derketin. Paşê me dewa vekir û navên me hat wergirtin. Lê ji me re gotin, me hestî şandine tipa edlî ya Stenbolê. Gotine hestî yê heywanan e. Kepçeyê 6-7 metre erd kolaye û çawa hestî yê heywanan e? Ez bawer nakim, ew derew dikin. Wextê ku heywanek bimire, hestiyê wî li ser erdê dimîne."¹⁷²

Ev trawmayên xizmên wendayan ên piştî erdkolanê, her car dubare dibe. Xizmên wendayan bi erdkolanê tên xeberdar kirin, ew daxwaznameyekê dinivîsin, ji bo testên DNA'yê xwîn ji wan tînin wergirtin û piştî ew tînin hêvîdar kirin. Paşê xeberek ji wan re tê ku (car caran jî, xeber nayê dayîn) ew pê hêvîşkestî dibin. Ji wan re dibêjin "Ev hestî ne aîdî we ne" û dîsa hêviyên wan dişikên. Ew piştî her li benda dîtina hestiyên xizmên xwe dimînin. Xizmên wendayan ên ku her tim pêşiyê hêvîdar û piştî hêvîşkestî dibin; dibe egera tarûmarbûna haletê rihê wan. Mirov dikare vê yekê bişibîne çîroka kendala ku ji aliyê Sîsîsfos ve ji lutkeyên çiyayan her dihat gindir kirin.

Judith Butler, di xebata xwe ya bi navê *Antigone's Claim* * de trajedyaya Sophokles, bi perspektîfeke xizmatî, dewlet û îtaetê, van tiştan neql dike: Kreon behsa astengkirina gorkirinê ya ku mirin û jiyînê ji hev cihê dike, di Antigone de dike. "Redkirina definkirinê ya Kreon, êrîşeke bo hemû sîstema gerdîş û edetan e (...) her weha mirov dikare bibêje ku erîşeke bo dem û dewranê bi xwe ye."¹⁷³ Erîşkirina sîstema edet û gerdîşan,

¹⁷² Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 05.09.2012

¹⁷³ Butler, J. *Antigone'nin İddiası*, 2007:19

¹⁷¹ Hevpeyvîn: Stenbol / 21.07.2012

an jî astengkirina gorkirina mirovan a ji aliyê rayedaran ve tête kirin, jiyana mirovan tarûmar dike. Desthilatiya zordestan, ji valahiyekê peyda dibe. Li vir, wekî Butler jî destnîşan kiriye, ji bilî êrîşkirina dem û dewranê, her wesa kontrolkirina cihûwar an mekanê jî heye. Çimkî, *cih* nîşaneyê hebûna mirovan a li ser rûzemîn e û bêgorhiştin, êrîşeke li hebûna mirovan e. Bi awayekî ontolojîk, bêgorhiştin; mirovekî li dinyayê her nemewcûd dihêle. Her wesa ev tiştên ku zordest dibin sebeb, mirov di nav hêvdariyêke bêserûbin de tarûmar dike. Ji salên 1990'an ta 2000'an, bajarên Kurd ên ku mirov lê dihatin wendakirin, her tim di nav rihiyeteke travmatîk de bûn û piştê ew bajar her bêdeng man. Mirov hê jî behsa wan deman nakin, nikarin behsê bikin. Mirov wan heyaman naxwazin yad bikin, an nikarin yad bikin û ew di dirêjahiya dîrokê de, wekî rûdawên demên 90'an di bîrgeha mirovan de mane. Mirov bi tenê behsa wê kêliya rûdawê û prosesên hiqûqî yên pênc û şeş sal in didome, dikin. Ew zemanê mayî jî, wekî Jan Asman gotî, valahiya dilê mirov a ku mirov naxwaze yad bike ye.¹⁷⁴ Hinde malbatan, wendakirina bav, zarok, bira û xwarziyên xwe ji tirsê canê xwe ji çî kesî re negotine:

"Ez heşt mehan ji tirsê canê xwe nenivîm. Min diwest binivim, belê min nikaribû bi xew kevîm. Her û her bi telefonê gef li min dikirin. Yanî, min ji tirsê newêribû ku serî li dadgehê bidim. Min her digot, gelo dê îro an sibehê an saetekê an du saet şûnda min bibin. Ji tirsê gef li me dikirin. Jixwe ji ber tirsê canê me, me nikaribû ku bibêjin 'xizmê me hatiye wendakirin.'"¹⁷⁵

Salên 1990'an, bi praktîkên xwe, di hefizeya mirovan de berze bûne û mirov naxwazin çî tiştî bi bîr bin. Mirov her ditirsyan û piştî hestiyên ku di bîran de hatin dîtin jî bendemayîneke bêhêvî li ser wan hikm dikir. Wan pirr baş dizanibûn ku kê û kîjan dezgehên mirovên wan

¹⁷⁴ Assmann, J. *Kültürel Bellek Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik*, 2000:52.

* Ev kitêb bi navê *Antigone'nin İddiası* tercüme yî zimanê Tirkî bûye û bi Tirkî daxilî nav beşa vê xebatê bûye.

¹⁷⁵ Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

wenda kirine; lêbelê dîsa jî nikarin dengê xwe bikin û reaksiyonên xwe nîşanî berpîrsên van rûdawan bikin. Dema ku mirov li ser Şernexê û nemaze jî Cizîr, Silopiya û Hezexê û salên 90'an hûr dibe, mirov dibîne ku serboriyêke trawmatîk a veşartî û behsnekirî di jiyana niştecihên wir de heye. Her weha, ji ber ku ew di doz û têkoşîna xwe de mafdar in, motîvasyona wan a jiyînê jî her heye. Her çend di van salên dawî de mirov neyên wendakirin jî, ew dîsa rehet nînin. Çimkî ne lêborînek ji wan hatiye xwestin û ne jî çî dozêk derbarê wendakirinê de hatiye vekirin. Dozên ku hatine vekirin, daxilî dozên esasî yên din bûne û her hatine piştguhkirin. Lê dîsa jî hê hestiyên wan nehatine dîtin, gorên wan nehatine çêkirin. Ji ber vê helwesta dewletê, xizmên wendayan jî her tim bi îhtiyad in û naxwazin behsa her tiştî bikin. Li cihên ku me lêkolîn lê kir, (nemaze Cizîr, Silopiya û Hezex) hê jî siha dewletê ya salên 90'an heye. Hê jî rêça sîstema cerdevantiyê û halê wê demê ye *awarte* berdewam dike. Di nav van kavdanan de mirov naxwazin çîsetên xwe bikin. Jina mirovekî wendakirî, xetere û ziyana her tiştî dabû ber çavên xwe û di derbarê dewletê de li dor behsa hiqûqî ev tişt gotin:

"Dewlet dikare me jî bikuje, ew karê wê ye û dibe ku bikuje jî. Lê bila cenazeyê me bibîne û hestiyên me nîşanî me bike."¹⁷⁶

Xizmên wendayan, wextê ku daxwaza hestiyên mirovên xwe dikin, hem dixwazin aqûbeta wendayan hîn bibin û hem jî dixwazin ji vî halî rizgar bin. Her weha xizmekî wendayan ê ku kekê wî û ji binemala wî heft kes hatine wendakirin, ji bo daxwazên xwe ev tişt gotin:

"Lê ev mesele wesa bi erdkolanê û nîşandana çend hestiyên safî nabe. Çimkî heta ji malbata me kesek li ser rûyê dinyayê bimîne, çî zarok, çî zarokên zarokan û hemî malbat, xwarzî û birayên me, dê her li pey vê meseleyê bikevin. Divê ev mesele bê safîkirin û bersûcên wê kê bin, divê ew bêne cezakirin."¹⁷⁷

¹⁷⁶ Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 02.09.2012

¹⁷⁷ Hevpeyvîn: Stenbol / 21.07.2012

VII.

EPÎLOG:

“EW NE WEKÎ

HERKESÎ BÛ,

MIROVEKÎ

BÊQISÛR BÛ”

Hannah Arendt, di kitêba xwe ya bi navê *Banality of Evil* (Kötülüğün Sıradanlığı) de behsê tîne ser axaftina Adolf Eichmann a bi klîşeyan. Adolf Eichmannê ku di qirkirinê de wezîfe girtibû, hem bi bersivên xwe yên li dadgeha Yarûselamê, hem jî di hemû pevnivîsiyên xwe yên şer de, bi klîşeyên xwe yên bêrih û sar diaxiff. Arendt, Eichmann sedema vê şêweya hizrkirinê, dispêre kêma aqiliya wî û hizrkirina wî ya kêma û bi qisûr hilsengîne; her weha klîşe, car û bar li beramberî rastiyan wekî zirxekê wezîfe dibîne.¹⁷⁸ Xizmên wendayan jî, di dirêjahiyê vê têkoşîna xwe de, çî wext rastî nûnerên dewletê yên wekî fermanदार, dozger, dadwer û parêzeran hatin, her û her bi klîşeyên dewletê bersiv girtin û muemele dîtin. Ev klîşe wekî klîşeyên komkujiya li Elmanyayê, li Tikiyeyê jî heman wezîfe dît: Li beramberî rastiyan, ew klîşe her tim bûn zirx û berpala.

Ev rêkxistina sîstematîk, bi hevkarîyeke li gel nûner û saziyên dewletê yên curbicur; Şîrnex xir û xopane kirin û ev klîşe her tim ji xwe re xistin paldank û balgehek. Aktîvîstên ku bi salan li Şîrnexê têkoşiyabûn, behsa bêfikariya tîmên kujer û bêminetîya dozger û rêvebirên sivîl û dadweran ên li hemberî xizmên wendayan dikin.¹⁷⁹

Xizmên wendayan ji ber van xemnexuriyan, her tim qilqilîn ku derd û keserên xwe ji rayedaran re bibêjin. Her mirovekî/e wendabûyî, xwedî serborîyeke yek û yekta ye û mirov nikare bi tenê wan bi hejmaran û analîzên siyasî û zanistî terîf û îzeh bike. Ev dê bibe egera berzekirina yadîgariya wan mirovên yek û yektayan. Her mirovek, bi tena serê xwe, dinyayekê şamil dike û berzekirina wan, dinyayekê xopan dike. Li vir rastiyeke ku mirov nikare bi statîstîkan, analîzên zanistî û şîroveyan siyasî şûnda bîne, çimkî êdî tiştekî berzebûyî heye. Ev tişt jî dibe egera melankoliyekê û têgehiştina mirov a di derbarê vê babetê de jî kifşe dike. Her mirovekî ku li ser van wendakirinan kar kiribe, guman nîne ku nebe hembîrê van gotinên Yıldırım Türker:

178 Arendt, H. 2012:59.

179 Günel Tekin, G. *Teşkilat-ı Mahsusa'dan Ergenekon'a, Kayıplar, Yargısız İnfazlar ve Faili Meçhuller*, 2012:471.

“Ez dixwazim ku, wendayan yek bi yek binasim. Ez naxwazim ku ew di bîrgeha civakê de, bi tenê wekî daneyên statîstîk û birîneke civakî bêne hilsengandin û bi fêlbaziyekê bêne yad kirin.”¹⁸⁰

Bêguman ku bargiraniya vê jana wendakirinê û canê çûyî her li ser milê xizmên wendayan e. Her ji ber wê jî ew wendayên xwe yên yek û yekta xweş û şêrîn, xûy û xeysiyetbaş, çavneçil û hezkiriyê/a hemû Şîrnexiyan dibînin û naxwazin çî kes xeyba wan bike. Xizmên wendayan jixwe berzekirina wan jî dispêre qencî û dilsafiya wan. Hemû xizmên wendayan, dibêjin ku heger di berîka wan wendayan de 10 qurîş jî hebûya, wan 5 ji wê bi hevalên xwe re parve dikirin. Kesên wendakirî di nezera xizmên xwe de bêqisûr û zîrek û ne şîbî herkesî ne.

Dema ku mirov kesekî/ê wenda dike, bi tenê wî şexsî wenda nake, her weha ew hemû yadîgariya xwe ya ku jê re dibêje 'kesayeti' jî berze dike.¹⁸¹ Mirov dizane ku canê çûyî, perçeyekê ji mirovan jî bi xwe re dibe. Wekî din, hetmen, kiryar bêne darizandin jî, hemû wenda bêne qeyd û mar kirin û hestiyên wan bêne dîtin jî, ew dê wan mirovan şûnda neyne. Her û her yadîgariyeke der analîzan, statîstîk û şîroveyan ji bo wan baqî dimîne.

Xizmên wendayan, wextê ku behsa bêqisûriya wendayên xwe dikin, di rastiye de balê dikêşin ser şîngirtina hemû mirovên yek û yekta û hêja. Ew naxwazin serborîya wendayên wan, di nav wendayên Şîrnexê de wekî daneyeke statîstîkî bêne fetisandin û ji bo hêjayên xwe van tiştan dibêjin. “Ji hemû Şîrnexiyan bipirsîn, gava ku yekî/ê got ew mirovekî ne baş bû, û misqalekê jî behsa zirara wî/ê kir, ez çî tiştî naxwazim.”¹⁸² Hemû Şîrnexî şahidên qencî û mirovatiya wan in.

Xizmên wendayan, bi tenê van hestên xwe yên xizmatî û şexsî dikarin bi dilekî rehet derbirrînin. Ew her tim bêriya wendayên xwe dikin û behsa

180 Türker, Y. *Gözaltında Kayıp Onu Unutma!*, 1995:11

181 Butler, J. *Prekarious Life: The powers of mourning and violence*, 2004:22

182 Hevpeyvîn: Şîrnex-Silopiya / 30.11.2012

jana wendakirinê ya ku mirov nikare pê re serederiyê bike dikin. Û bêguman, di xewnên wan de hesretiyên wan hene. Wenda, wekî mirovekî/ê yekta, xwe di xewnên wan de bi bîr tîne.

"Ez wî di xewna xwe de dibînim. Ez dibînim ew rûniştiye. Di nav şînahiyê de, di binê siha kezwanan de rûniştiye. Ez di xewê de dibînim. Ji min re dibê 'Eyşe' û dibînim kurrê minê mirî jî li gel wî ye. Ji min re dibêje 'Eyşe çavên te hê dibînin?', ez jî jê re dibêjim 'belê, dibînin'. Ji min re dibêje 'tu vî kevirê spî jî dibîni?', ez jî dibêjim 'belê ez dibînim.' Ew dibêje 'here cilûbergên min li wir in.' Ew gireke e, gireke bilind û dirêj e. Ez qet ji bîr nakim. Ez çî caran ji bîr nakim, mirov qet mêrê xwe ji bîr dike. Heger mirov bêesil be, wî çaxî mirov ji bîr dike. Çimkî heger ew di hişê te de be, nayê ji bîr kirin."¹⁸³

"Ez ji bo Xweda soz didim, ez vê yekê ji bîr nakim. Ez aqûbeta wî nizanîm û ew ji bîra min naçe. Ez hîn niha jî wî aha li wir dibînim, li ber çavên min e. Kum û cilûbergên wî hîn jî li cem min in. Ew hîn li ber çavên min e, qet naçe. Jixwe wextê ez bi tena serê xwe dimînim, mesela êvaran cîran tînin, em rûdinin, qise dikin û piştî ku ew diçin, ez dîsa bi tena serê xwe dimînim. Yanî heta saet deh û yanzdehê şevê. Tu dinihêrî ew tê li nik min rûdine. Ez xwe bi xwe dibêjim 'ez dibînim' û 'ew li vir e'. Yanî ez aqûbeta wî nizanîm û wî ji bîr nakim. Em wî ji bîr nakin û nadin ji bîr kirin."¹⁸⁴

183 Hevpeyvîn: Şernex-Cizîr / 02.09.2012

184 Hevpeyvîn: Şernex-Silopiya / 30.11.2012

VIII.

ENCAM Û ÇEND

PÊŞNIYAZ

Li dor behsa zanîn û daneyên tevahiya vê raporê, em gehîştin wê encamê ku, li Şernexê ev stratejiya wendakirinê, perçeyek ji polîtîkaya dewletê ya devera Kurdistan e. Em xwe dispêrin lîteratûra navnetewî û terma ku vê polîtîkayê terîf dike jî, bi raya me "terora dewletê" ye. Bi ser navê 'tekoşina bi terore re' dewlet û sazîyên wê yên curbicur, bi awayekî der qanûnî, bi dil û daxwaza xwe her û her, bê minetî mirov kuştine û wenda kirine. Ev stratejî û polîtîka, wekî li El Salvador, Arjantîn û Perûyê hat tecrûbekirin, tesireke mezin geh li wendayan, geh jî li xizmên wêndayan kir, û her weha xelk hate tirsandin û bê bertek bê dengkirin.¹⁸⁵

Terora dewletê, li gellek der û deverên dinyayê, ji aliyê hêzên dewletê yên formel û hêmanên paramîlîter ve, piştî derbeyên leşkerî, di şerên navxwe û pevçûnên etnîk de wekî sistemeke bînpêkirina mafên mirovan hatiye tecrûbekirin. Bi vê rê û azîneyê, dewletê ji xwe re berpaleke awarte durist kiriye û praktîkên xwe yên der qanûnî, bi ekîbên xwe yên kujer ve tatbîq kiriye ku piştî ji hesab û darizandinê rizgar bibe. Ev stratejî û polîtîkaya li Şernexê û di salên 90'an de, nîşaneyê terora dewleta Tirk e.

Li gellek der û deverên dinyayê, di van sih salên dawî de gellek caran mafên mirovan hatiye bînpêkirin. Terora dewletê, di rejîmên ku piştî derbeyê ava bûyî û rejîmên otorîter de, azîneyeke mekanîzmaya qonaxa derbasbûna dadmendiye (Transitional Justice) û prosesa aşîtiyê tê tetbîq kirin. Ev mekanîzma, bi hev re eleqedar in û xwedî taybetmendiye berfireh in. Mirov dikare wê di çar xalan de weha şîrove bike: Darizandin, avakirina komîsyona heqîqetê, tezmînat/cirm û reformên esasî/struktural.

Li her derê dinyayê, mexdûr û stembar her dixwazin ku berpîrsên van sûc û neheqîyan bêne cezakirin. Di van sih salên dawî de, piştî derbeyan, şerên navxwe û pevçûnên etnîk, ji bo darizandina sûcdaran, dadgehên geh herêmi/netewî geh jî navdewletî hatin avakirin. Li dor

behsa derbasbûna dadmendiye, ev darizandin bi tenê ne ji darizandina failan û şehsî pêk tê, her weha divêt ev sûcên sistematîk bêne zelalkirin û sistemeke xwe dispêre qanûnan û mafê mirovan jinûve bê avakirin. Li Arjantînê, piştî ku rejîma cûntayê têk çû, di sala 1983'ê de, ji aliyê Jaime Malamud-Goti yê ku serkêşê darizandinê Alfonsin bû û bi xîreta wî Komîsyona Wendakirinan CONADEP hatibû avakirin û gellek general hatibûn darizandin. Ew di derbarê daxwaza mexdûran a edaletê û rola xwe de van tiştan dibêje: "Darizandina van leşker û hêzên asayîşê ji bilî her tiştî, baweriyê bi demokrasîyê tîne û ji bo avakirina sistemeke demokratîktir sûdwar e."¹⁸⁶

Li dor behsa derbasbûna dadmendiye, azîneyeke dîtir jî, 'komîsyonên heqîqetê' ye ku di van salên dawî de li Tirkiyeyê jî behs her li ser e. Bi kurte, komîsyonên heqîqetê dibin platforma hevbîriya mexdûran. Bi tenê zanîn û qebûlkirina van sûcan têrê nake, divêt ew sûc bi awayekî fermî bêne qebûl kirin û ev komîsyon dibin egera van qebûlkirinan.

Yek ji nîşaneyê qebûlkirinê fermî jî dayîna tezmînetê ye. Tezmînat di derbasbûna dadmendiye de ji pardedayîne wêdatir û zêdetir e. Naskirin/qebûlkirin, pêbawerî, guhertina navên cih û waran, avakirina park û mûzexaneyan, veguheztina zindanan a cihê yadkirinan, nîşaneyên tezmînatê yên girîng in.

Di şertên bînpêkirina mafê mirovan de, bi taybetî, ji bilî berpîrsiya şexsî, hevkarîya dem û dezgehan jî pîrr muhim e. Hêzên asayîşê, sistema dadnasyîyê, pergala perwerdehiyê, medya û akademî, ev hemû dem û dezgeh, an van sûcan bi hev re dikin, an jî palpiştîya wan sûcan dikin û çî reaksiyonê li hemberî van tiştan nîşan nadin. Her ji ber wê, reformên sazûmanî ji bo vê dema derbasbûna dadmendiye pîrr muhim e.

Ev her çar xal, ji hev cuda ne lê, armanca wan heman tişt e: Divêt, ew mirovên ku hatibûn

¹⁸⁵ Menjivar C., Rodriguez, N. "State Terror in the U.S.-Latin American Interstate Regime", *r.20*.

¹⁸⁶ Arthur, P. "How "Transitions" Reshaped Human Rights: A Conceptual History of Transitional Justice". 2009: 323.

şerpezekirin, bi fermî bêne qebûlkin, bersûcên wan rûdawan bêne tespîtkin û ceza lê bèn birrîn. Divêt ziyân û zirara wan bê telafîkin, tezmînata wan bê dayîn û êdî çî caran rê li ber tiştên weha neyê vekirin. Bi taybetî ev tişt, encax bi pêkanîna tiştên din ve gengaz dibe. Gellek caran, komîsyonên heqîqetê, ji ber ku sûcdaran ji darizandinê rizgar dike, pîr tê rexne kirin. Lêbelê, li gellek der û deverên ku şer û derbe lê çêbûye, piştî van komîsyonan, dadgeh jî tê avakirin. Ew delîl û belgeyên ku komîsyona heqîqetê peyda dike, di dadgehan de wekî belgeyên esasî tene bikaranîn. Komîsyonên heqîqetê, wezîfeya belavkirina dengê mexdûran dibîne û perçeyê girîng e bo darizandinê. Ji bilî wê, tezmînata madî û sembolîk, bi taybetî bi pêşniyaza komîsyonê ve tê destnîşankirin. Her wesa avakirina cîgehên yadkirinê, mûzexane û abide, wezîfeya aşkirabûna tezmînatê ya sembolîk dibîne û dengê mexdûran bi rêka vê komîsyonê belavî gellek der û deveran dibe.

Her wesa, terîfa edaletê ya 'derbasbûna dadmendiye', gellek berfireh e. Ya rast ew daxwaza edaletê ya mexdûran jî terîf dike. Wextê ku mexdûr, behsa dadmendiye dikin, ew dixwazin ku, hem sûcdar bêne cezakirin, hem wenda bêne naskirin û tespîtkin, bi taybetî jî hestiyên wan û cesedê wan bête dîtin û îade kirin. Dîsa ew dixwazin ku bila dewlet lêborîn û efûya xwe ji ber ev qas zilm û zordariyê bixwaze û ji bo mexdûran cîgehên bîranînê ava bike.

Ev deh sal in, mekanîzmayên derbasbûna dadmendiye, her pûte didine perspektîfa zayenda civakî. Her çend ev perspektîf hê kêmbê jî, di van salên dawî de, li komîsyonên heqîqetê yên li Haîtî, Sîerra, Leone û Tîmora Rojhilat, şideta cinsî, ji aliyê komîsyonê ve hate terîf kirin. Li dor wê behsê, koçrevkin, wendakirin, birçîtî û binpêkirina mafê mirovan a bi wî rengî û tesira wan a li ser jinan a civakî/siyasî/aborî tê tespîtkin û li gor cinsiyeta civakî jî bo van rûdawan pêşniyaz û perspektîf tê avakirin.

Em bi ser navê Navenda Bîrgehê, beriya ku behsa pêşniyazên xwe nekin, em dil dikin ku behsa daxwazên xizmên wendayan

bikin. Ji ber ku daxwaz û pêşniyazên wan jî, wekî li jor hate diyarkirin, wekî pêşniyazên derbasbûna dadmendiye ne. Wekî li jor jî hate destnîşankirin, naskirin, qebûlkin, tezmînat, cezakirin û telafîkirina şerpezekirinan daxwazên xizmên wendayan in jî. Xizmên wendayan jî dadmendiye wekî 'derbasbûna dadmendiye' daxwaz dikin û dixwazin çarçoveya wê dadmendiye berfirehtir be. Ew dixwazin sûcdar bêne cezakirin û ji bilî wê jî ew berî her tiştî dixwazin ku rastî bêne aşkirakirin, ev kirin û praktîk bi awayekî fermî û bi sazûmanî bêne pejirandin, lêborîn ji xizmên wendayan û mexdûran bê xwestin. Em dikarin wan pêşniyazan weha rêz bikin:

■ Divêt berpîrs û failên wendakirinan bêne darizandin û cezayê çî kesî li gor xisûsiyeta sûcan, neyê sivikkirin û ew hemû cezayên xwe bixwin.

■ Divêt dewlet vê sûcê xwe yê bûye sebeb û bi qestî ji rayedaran daye kirin qebûl bike û sûcê xwe îtiraf bike/biaşêre.

■ Piştî ku dewletê ev sûcên xwe qebûl kir û rola xwe ya di wendakirinan de pejirand, divêt ew ji xizmên wendayan û hemû civakê lêborîna xwe bixwaze.

■ Piştî darizandinan û qebûlkirina sûcê xwe, divêt tezmînat madî û arîştî bête dayîn. Xizmên wendayan jî destnîşan kir ku, heta ev sûc neyên qebûl kirin û lêborîn neyên xwestin, çî maneya tezmînatê nîne. Li gor xizmên wendayan, heger ev tişt neyên kirin, tezmînat dê wekî pere û cirma xwînê bête qebûl kirin û ev yek jî, dê wan bêhtir aciz bike.

Wekî li jor jî hate destnîşan kirin, xizmên wendayan, ji çar mekanîzmayên derbasbûna dadmendiye, bi taybetî du hebên wê –darizandin û tezmînatên madî û arîştî- bi dil û can dixwazin. Ji bo ku rastî bêne zanîn û qebûlkin û dengê wan were bihîstin, ew dixwazin ku komîsyonên heqîqetê bene avakirin. Xizmên wendayan, rastûrast behsa reformên sazûmanî nakin, lê daxwaza wan a hemwelatiyeke wekhev

heye. Wekî me di beşa 'hemwelatîyê' de jî behs kir, li gor xizmên wendayan, divêt dewlet hemwelatîyên xwe wenda neke, û bo duristkirina dadmendiye jî, ew kesên ku mirov wendakirine, di nav dewletê de nexebitin û wezîfe negirin.

Em jî bi palpiştiya têgeha 'derbasbûna dadmendiye' û li dor behsa mekanîzmayên wê yên esasî, van çend pêşniyazan, li daxwazên xizmên wendayan zêde dikin.

Li Dor Behsa Mekanîzmayên Dewletê

■ Piştî qebûlkirina wendakirinan û xwestina lêborînê, divêt hemû rayedarên dewletê yên leşkerî û sîvîl ku di salên 90'an de berpîrsê wendakirinan bûn, ji wezîfeya dewletê bêne avêtin û reformeke sazûmanî bê çêkirin;

■ Divêt sîstema cerdevantiyê bête fesxkirin û ji hikm bikeve; ew dozger û hakimên ku di dema wendakirinan de kar kiribûn û çî pûte nedabûn van wendakirinan û dosyeyan, ji wezîfedariya dewletê bêne avêtin;

■ Divêt ew kesên ku berpîrsên van wendakirinan bûn, bilez bêne darizandin, bi awayekî edîl bêne cezakirin, ew sûcên wan jî wekî sûcekî li dijî mirovahiyê bêne xwuyakirin, ev dosye di nav demboriyê de neyê piştguh kirin û di prosesa vê darizandinê de divêt xwe bispêrin tecrûbeyên navdewletî;

Li Dor Behsa Mekanîzmayên Xizmên Wendayan

■ Divêt bi palpiştiya parlementoyê û beşdarbûna rêkxistinên civaka sîvîl, Komîsyonên Heqîqetê bêne avakirin, naverok û mûeyîdeyên vê prosesê xwe bispêrin mexdûriyetan. Her weha, divêt zelalkirina vê babetê li ser esasên hefizeya kolektîf bête duristkirin û rê li ber alternatîfên din jî bêne vekirin;

■ Divêt fikr û ramanên xizmên wendayan bêne wergirtin, bernameyê tezmînatê ya berfireh bê hazirkirin û hemû pêdiviyên xizmên wendayan bêne dayîn;

■ Divêt bi rêkxistinên xizmên wendayan re, li ser bernameya tezmînatê û çareserkirina vê meseleyê bête rawestîn.

Li Dor Behsa Mekanîzmayên Civakî

■ Divêt ji bo ku ev tişt neyên ji bîr kirin û careke din neyên dubarekirin, abîdeyên yadkirinê û mûzexane bêne avakirin û ev rûdaw di bîrgeha civakê de her bimîne.

■ Divêt bi rêka film, şano, musîqe, enstalasyon, klîb û şeweyên hunerî, gel bi rastiya wendakirinan bê hesandin;

■ Divêt di pirtûkên dîrokê de, ev wendakirinên sih salên dawî, bi cih bin û binpêkirina mafê mirovan a sîstematîk, ji ciwanan re bê neql kirin û sosyalîzasyon bi wî awayî pêk bê;

■ Bi mifredata dersên zanîngehan, bi lêkolînan û bi projeyan, wendakirin û binpêkirina mafên mirovan ên salên 90'an bi rê û azîneyên nû bêne gengeşe kirin.

ÇAVKANİ

PIRTÛK Û GOTAR

Ađitjondro, G. J. (2000). Ninjas, Nanggalas, Monuments, and Mossad Manuals: An Anthropology of Indonesian State Terror in East Timor. Jeffrey A. Sluka (berhevkar), *Death Squad: di nav The Anthropology of State Terror* de. (158-188). Philadelphia: University of Pennsylvania Press.

Agamben, G.. (2008). *State of Exception*. Chicago: University of Chicago Press.

Akçam, T.; Kurt, Ü. (2012). *Kanunların Ruhı*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Alpkaya, G. (2009). Kayıplarımız. *Diyalog*, İlon-Cotmeh, 100-104. http://e-kutuphane.ihop.org.tr/pdf/kutuphane/22_81_0000-00-00.pdf

Alpkaya, G. (1995). Kayıplar Sorunu ve Türkiye. *Ankara Üniversitesi Siyasal Bilgiler Fakültesi Dergisi*, Cild: 50 No: 3-4, 31-65. (http://www.politics.ankara.edu.tr/dergi/pdf/50/3/8_gokcen_alpkaya.pdf)

Arendt, H. (2012). *Kötülüğün Sıradanlığı-Eichmann Kudüs'te*. Özge Çelik (wergêr). İstanbul: Metis Yayınları.

Arthur, P. (2009). How "Transitions" Reshaped Human Rights: A Conceptual History of Transitional Justice. *Human Rights Quarterly*, hejmar: 31, 321-367.

Assmann, J. (2000). *Kültürel Bellek Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve politik Kimlik*. Ayşe Tekin (wergêr.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Balta Paker, E. (2010). Dış Tehditten İç Tehdide: Türkiye'de Doksanlarda Ulusal Güvenliğin Yeniden İnşası. Evren Balta Paker û İsmet Akça (berhevkar), di nav *Türkiye'de Ordu, Devlet ve Güvenlik Siyaseti* de. (407-431). İstanbul: Bilgi Üniversitesi Yayınları.

Balta Paker, E.; Akça, İ. (2013). Askerler, Köylüler ve Paramiliter Güçler: Türkiye'de Köy Koruculuğu Sistemi. *Toplum ve Bilim*, Hejmar 126, 7-35.

Başlangıç, C. (2001). *Korku İmparatorluğu*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Baudrillard, J. (2009). *Simgesel Değiş Tokuş ve Ölüm*. Oğuz Adanır (wergêr.). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.

Bayrak, M. (2004). *Kürdoloji Belgeleri II*. Ankara: Özge Yayınları.

Belge, M. (1997). *Türkiye Dünyanın Neresinde?*. İstanbul: Birikim Yayınları.

Bora, T. (2008). *Türkiye'nin Linç Rejimi*. İstanbul: Birikim Yayınları.

Bruneissen, M. V. (2003). *Ağa Şeyh Devlet*. Banu Yalkut (wergêr.). İstanbul: İletişim Yayınları.

Butler, J. (2004). *Precarious Life: The Powers of Mourning and Violence*. London: Verso.

Butler, J. (2007). *Antigone'nin İddiası*. Ahmet Ergenç (wergêr). İstanbul: Kabcacı Yayınevi.

Calveiro, P. (2008). Torture in the heart of 'democracies. *On Torture* (a Symposium sponsored by the Heinrich Böll Foundation and the George Washington University). http://www.boell.org/downloads/Calveiro_torture_democracy.pdf

Cemal, H. (2003). *Kürtler*. İstanbul: Doğan Kitap.

Diñçer, H. (2011). Kayıpları Görünür Kılmak: Birleşmiş Milletler Zorla Kaybedilmeye Karşı Herkesin Korunmasına Dair Sözleşme. *Suç ve Ceza – Crimen e Poena- Ceza Hukuku Dergisi*, Hejmar: 3 Tirmeh, Gelawêj, İlon 2011. bi Online: http://www.hakikatadalethafiza.org/Cust/UserFiles/Documents/Editor/H%C3%BCLyaDin%C3%A7er_Kay%C4%B1plar%C4%B1G%C3%B6r%C3%BCn%C3%BCrK%C4%B1lmak.pdf

Doğan, A. (2011). *JİTEM'i Ben Kurdum*. İstanbul: Timaş Yayınları.

Dündar, F. (2010). *Modern Türkiye'nin Şifresi*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Elçi, T. (2009). Türkiye'de Gözaltında Kayıplar. *Diyalog*, İlon-Cotmeh, 91-97. http://e-kutuphane.ihop.org.tr/pdf/kutuphane/22_81_0000-00-00.pdf

Fraser, N. (1992). Rethinking the public sphere: A contribution to the critique of actually existing democracy. C. Calhoun (berhevkar). *Habermas and the Public Sphere* içinde. (110-142). Cambridge: MIT Press.

Gemalmaz, M. S. (1994). *Olağanüstü Rejim Standartları*. İstanbul: Beta Basım Yayım.

Gözler, K. (2000). *Kanun Hükmünde Kararnamelerin Hukuki Rejimi*. Bursa: Ekin Kitabevi Yayınları.

Hansen, T. B., Stepputat, F. (der.) (2001). *States of Imagination: Ethnographic Explorations of the Postcolonial State*. USA: Duke University Press.

Hansen, T. B., Stepputat, F. (2005). Introduction. Thomas Blom Hansen û Finn Stepputat (berhevkar). *Sovereign Bodies: Citizens, di nav Migrants and States in the Postcolonial World* de. (1-36). Princeton ve Oxford: Princeton University Press.

Human Rights Watch -İnsan Hakları İzleme Örgütü- (2000). What is Turkey's Hizbullah? A Human Rights Watch backgrounder. <http://www.hrw.org/legacy/english/docs/2000/02/16/turkey3057.htm>

Human Rights Watch -İnsan Hakları İzleme Örgütü- (2012). *Adalet Vakti*. İstanbul. <http://www.hrw.org/sites/default/files/reports/turkey0912tuwebwcover.pdf>

International Center for Transitional Justice – Uluslararası Geçiş Dönemi Adaleti Merkezi. <http://ictj.org/our-work/transitionaljustice-issues/gender-justice>

İslâm Ansiklopedisi. (2001). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı. C-24

İslâm Ansiklopedisi. (2004). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı. C-29.

İpekyüz, N. (2009). Arjantin'de Politik Şiddet ve Travma. *Diyalog*, İlön-Cotmeh, 105-107. http://e-kutuphane.ihop.org.tr/pdf/kutuphane/22_81_0000-00-00.pdf

Kadioğlu, A. (2008). Vatandaşlığın Ulustan Arındırılması: Türkiye Örneği. Ayşe Kadioğlu (berhevkar), *Vatandaşlığın Dönüşümü: Üyelikten Haklara*, içinde. (44-52) İstanbul: Metis Yayınları.

Kevorkian R. H.; Papoudjian, P.B. (2012). *1915 Öncesinde Osmanlı İmparatorluğu'nda Ermeniler*. Mayda Saris (wergêr.). İstanbul: Aras Yayınları.

Kılıç, E. (2011). *JİTEM - Türkiye'nin Faili Meçhul Tarihi*. İstanbul: Timaş Yayınları.

Kurban, D. (2009). Bir 'Güvenlik' Politikası Olarak Koruculuk Sistemi. Ali Bayramoğlu, Ahmet İnsel (berhevkar.) *Almanak Türkiye 2006-2008: Güvenlik Sektörü ve Demokratik Gözetim* içinde. (253-259). İstanbul: Tesev Yayınları.

Lévinas, E. (2006). *Ölüm ve Zaman*. Nami Başer (wergêr.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Menjívar, C.; Rodriguez, N. (2005). State Terror in the U.S.-Latin American Interstate Regime, Cecilia Menjívar ve Nestor Rodriguez (der.) di nav *When States Kill: Latin America, the U.S., and Technologies of Terror* de. (3-27). Austin: University of Texas Press.

Ökten, K. H. (2010). *Ölüm Kitabı*. İstanbul: Agora Kitaplığı.

Öndül, H. "Zorla Kaybedilme", 18 Mayıs 2011 tarihinde Ortadoğu Teknik Üniversitesi Avrupa Öğrenci Forumu İnsan Hakları Çalışma Grubu'nda yapılan sunum. (15.03.2013) <http://ihd.kardaizler.org/index.php/makaleler-mainmenu-125/2376-zorla-kaybedilme.html>

Özsoy, H. (2010). Between Gift and Taboo: Death and the Negotiation of National Identity and Sovereignty in the Kurdish Conflict in Turkey. *Teza doktorayê ya çapnebûyî*. The University of Texas, Austin. <https://repositories.lib.utexas.edu/bitstream/handle/2152/ETD-UT-2010-05-854/OZSOY-DISSERTATION.pdf?sequence=2>

Povinelli, E. (2001). Radical Worlds: the Anthropology of Incommensurability and Inconceivability. *Annu. Rev. Anthropology*, Hejmar: 30, 319-334.

Salzani, C. (2008). Violence as Pure Praxis: Benjamin and Sorel on Strike, Myth and Ethics, *Colloquy: Text Theory Critique*, Hejmar:16, 18-48.

Sharma, A., Gupta A. (der.). (2006). *The Anthropology of the State - A Reader*. Padstow, Cornwall, Great Britain: Blackwell Publishing.

Sophokles. (2011). *Eski Yunan Tragedyaları 12 - Antigone*. Ayşe Selen (wergêr.). İstanbul: Mitos Boyut Yayınları.

Tanrıkulu, S.; Yavuz, S. (2005). İnsan Hakları Açısından Olağanüstü Hal'in Bilançosu. *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, Hejmar 6: 493-521.

Günel Tekin, G (2012). *Teşkilat-ı Mahsusa'dan Ergenekon'a*,

Kayıplar, Yargısız İnfazlar ve Faili Meçhuller. İstanbul: Belge Yayınları.

Türker, Y. (1995). *Gözaltında Kayıp Onu Unutma!* İstanbul: Metis Yayınları.

Üstel, F. (2004). *Zorunlu İç Göç Sonrası Köye Dönüş*. İstanbul: TESEV Yayınları.

Vermeulen, M. L. (2012). *Enforced Disappearance, Determining State Responsibility under the International Convention for the Protection of all Persons from Enforced Disappearance*. Cambridge-Antwerp-Portland: Intersentia.

Yalçın, S. (2003). *Binbaşı Cem Ersever'in İtirafları*. İstanbul: Doğan Kitap. (Çapa yekem: 1994, İstanbul: Kaynak Yayınları.)

Yuval-Davis, N. (1991). The citizenship debate: Women, ethnic processes and the state, *Feminist Review*, Hejmar: 39, 58-68.

NIVÎSÊN ROJNAME Û MALPERÊN ÎNTERNETÊ

Cömert, H. (der.). Rakamlarla 12 Eylül Darbesi. *Ntvmsnbc*, 04 Avrêl 2012. (23.02.2013) <http://www.ntvmsnbc.com/id/24999286/>

Kalkan, E. (2006). Babamın katiliyle buluşmaya nasıl karar verdim? *Hürriyet*, 22 Rêbendan 2006. (20.02.2013) <http://www.hurriyet.com.tr/pazar/3825189.asp>

Şahin, Ö. (2011). O MGK'da 1200 kişilik liste vardı. *Radikal*, 13 Berfenbar 2011. (18.02.2013) <http://www.radikal.com.tr/radikal.aspx?aType=RadikalDetayV3&ArticleID=1072339&CategoryID=78>

Şırnak tarihi. (2007). *Zaman*, 1 Tirmeh 2007. (15.02.2013) http://www.zaman.com.tr/sehir_sirnaktarihi_565263.html

21 Mart 1992: Cizre'de Newroz kutlamalarında kontrgerilla katliamı yaptı. (2011). *Marksist.org*, 20 Adar 2011. (27.02.2012) <http://www.marksist.org/tarihte-bugun/3270-21-Adar-1992-cizrede-newroz-kutlamalarinda-kontrgerillakatliam-yapti>

Başlangıç, C. (2011). Burası 'Şırnak cumhuriyeti'. *Radikal*, 05 Gulan 2011. (22. 02.2013) <http://www.radikal.com.tr/haber.php?haberno=1603>

Ve devlet JİTEM'i resmen kabul etti. (2011). *Radikal*, 09 Tirmeh 2011. (21.02.2013) <http://www.radikal.com.tr/radikal.aspx?aType=RadikalDetayV3&ArticleID=1055684&CategoryID=77>

Devletin derebeyi: Korucu Kamil Atak. (2009). *Birgün*, 19 Adar 2009. (15.02.2013) http://www.birgun.net/actuel_index.php?news_code=1237456473&day=19&month=03&year=2009

Eroğlu, D. "Her kayıp yakını sevdiğinin son sözünü bilmek ister". Hevpeyvîn li gel Maside Ocak. (01.03.2013) <http://www.siddethikayeleri.com/portfolio/her-kayip-yakinisevdiğinin-son-sozunu-bilmek-ister/>.

Harvey, B. (2011). Turkey Officer Says He Created Local Hezbollah Group, Star Says. 18 Rêbendan 2011. (11.02.2013) <http://www.bloomberg.com/news/2011-01-18/turkey-officer-says-he-created-local-hezbollah-group-starsays.html>.

Kaya, Ö. (2012). Cizre Cumartesi Anneleri 100. Haftasında. Veysel Vesek ile söyleşi-haber. 24 Berfenbar 2012. (05.01.2013) <http://hakikatadalethafiza.org/duyuru.aspx?NewsId=118&LngId=1>.

Îdianameya Serdozgeriya Cumhuriyetê ya Diyarbekirê ya bi nimreya 2009/972

Korkut, T. (2009). Silopi BOTAŞ Kazısında Kemikler ve Bezler Bulundu. *Bianet*, 10 Adar 2009. (20.02.2013) <http://bianet.org/bianet/bianet/113040-silopi-botas-kazisindakemikler-ve-bezler-bulundu>

Aktar'dan Kamil Atak tahliyesine tepki. (2012). *Yüksekova Haber*, 24 Berfenbar 2012. (01.2013) <http://www.yuksekovahaber.com/haber/aktardan-kamil-atak-tahliyesinetepki-90857.htm>

